


# Naverok

- Sernivîzar: Kanîzar xezîneyên zimanê kurdî sererd dike
- Husein Muhammed: Peyvsazî di zimanê kurdî de
- Lezgînê Çalî: Rêzimana Dîwana Melayê Cizîrî
- Rizgar Behadur: Bîkarkersazî le kurdî kirmaşanî
- Ergin Öpengin: Repertuara zimanî û afirandina edebî
- Yule George: Ziman û çande, wergerandin: Dilyar Amûdî
- Kî û kê?
- Hasan Aslan: Ravek di kirmanckî de
- Newzad Hirorî: Nihêniyên befrê/berfê – lêkolînek li ser dengnasiya kurmancî
- Qanûn, yasa yan zagon?
- Muhemmed Teqevî: Cînav û rengdêrên nîşander di kurmanciya Xorasanê de
- Fêrgîn Melîk Aykoç: Çend gotin li ser xebat û metodên misyoneran
- Zinarê Melleyî: Erkê herfa E di kurdî de
- Ferhengoka devoka goyanî
- Kurterêbera rastnivîsînê

**Sernivîsar**

# *Kanîzar* xezîneyên zimanê kurdî sererd dike

*Kanîzar* kaniya zar û zaravayên zimanê kurdî ye. Kanîzar kovareke zimanî û zimannasî ye. Ew dê hem lêkolînên zanistî yên li ser zimanê kurdî û zimannasiya giştî bi kurdî belav bike û hem jî dîtin û nêrînên kurttir li ser awayê rastnivîsîna kurdî biweşîne.

Armanca kovara me ne tenê zimannasên gihiştî û pîşedar in lê hemû bikaranînerên zimanê kurdî ne: nivîskar, rojnamevan, xwandekarên zimanê kurdî, xwandevanên berhemên kurdî û hwd. Mijara *Kanîzar*ê ziman û zimannasî ye lê sîngê me vekirî û berê me li dûr e: em ê lêkolînên zimannasî belav bikin lê em ê herwiha xwandevanên xwe bigihîn devok û zaravayên cuda, em ê wan ji berhemên hêjayî yên bi kurdî yan li ser kurdî nivîsandî agadar bikin.

Di vê hejmarê de em bi vekolîneke dirêj ya Husein Muhammed li ser peyvsaziyê anku çêbûn û çêkirina peyvan di zimanê kurdî de dest pê bikin. Vekolîn piralî û dirêj e û dê di hejmara bê de jî berdewam be. Newzad Hirorî bi vekolîna xwe ya dengnasî û dengrêzî, hin raz û nehîniyên bihagiran ji bin befr û berfên kurmancî dertîne.

Rizgar Behadur di nivîsara xwe ya bi kurdiya kirmaşanî de tebatîsaziyê anku pasîvizasyonê bi metod û azîneyên zimannasî dide nasîn. Hasan Aslan bi nivîsareke xwe ya balkêş xwandevanên kurmancîaxiv ji awayên avakirina raveka zazakî serwext dike. Mixabin di vê hejmarê de tenê ev herdu nivîs li ser lehceyên derveyî kurmancî ne lê bo hejmarên bê em ê bi şanazî pêşwazî li nivîsên bi zaravayên din yan jî li ser zaravayên din jî bikin.

Du vekolînên me yên vê carê li ser zimanî di edebiyatê de ne. Lezgînê Çalî rêzimana yek ji kevntirîn berhema berdest ya kurmancî, rêzimana *Dîwan*a Melayê Cizîrî vekoliye. Ergin Öpengin berê me dide bikaranîna zimanê kurdî di edebiyata nûjen de, xaseten bi rêya romaneke kurmancî ya vê dawiyê.

Dilyar Amûdî beşek ji kitêba zimannasê navdar George Yule ji inglîzî kiriye kurdî û pê têkiliyên navbera zimanî û kultûrê bi me dide nasîn. Muhemmed Teqevî ji Xorasanê cînav û rengdêrên nîşander yên devoka xwe ya kêmnaskirî ya kurmancî raberî me dike. Fêrgîn Melîk Aykoç bi nivîsareke rexneyî li xebat û metodên misyonerên fileh li ser zimanê kurdî radiweste. Zinarê Melleyî bi berfirehî behsa erk û rolên herfa “e” di zimanê kurdî de dike.

Parlemana Başûrê Kurdistanê *yasa*yan derdixe û kantonên Rojavayê Kurdistanê jî *zagon*an. Herdu jî ji *qanûn*a "erebî" direvin lê gelo rastiya van peyvan çi ye? Gelo te hay ji devoka goyanî heye? Kengî mirov dibêje *kî* û kengî jî *kê*? *Kanîzar* bersiva van û gelek tiştên din jî dide.

Kanîzar bo hemû lehceyên kurdî û herdu alfabeyên standard vekirî ye lê em tenê berhemên zimannasî û têkilî zimanê kurdî belav dikin. Em herwiha rê didin lêkolînên bi zimanên din jî eger ew li ser zimanê kurdî bin. Herwiha em pêşwaziyê li lêkolînên li ser zimanên din yên bi kurdî jî dikin.

Em ê her du mehan carekê bibin mêvanên we. Lê *Kanîzar* hewceyî we û berhemên we ye. Tenê bi nivîs, pêşniyaz û rexneyên we zimannas, nivîskar û xwandevanên hêja, ev kovar dikare jiyana xwe bidomîne û bi jiyekî dirêj di xizmeta we de be.

*Di hejmara duyem de em ê giraniyê bidin ser mijara pêşpirtik (prefix) û paşpirtikan (sufiks). Lê hûn dikarin li ser babetên din jî yên ziman(nas)î ji me re binivîsin. Hejmara 2 dê li destpêka meha 10/2015 derkeve. Ji camêriya xwe, nivîsên xwe heta 15.9.2015 bigihînin me:*

kovarakanizar@gmail.com

www.arsivakurd.org

# Peyvsazî di zimanê kurdî de

***Husein Muhammed***



## 1. EV VEKOLÎN Û YÊN BERÎ WÊ

Di zimannasiyê de *peyvsazî* (bi inglîzî *word formation*) tê maneya çêkirina peyvan.[1] Ev ne yekem car e ku lêkolîn li ser peyvsaziya kurdî tê kirin. Di gelek kitêb û ferhengên kurdî de pêşpirtik (prefiks) û paşpirtik (sufiks) tên rêzkirin û – eger bi kurtî jî be – behsa erk û wezîfeyên wan hatiye kirin û hin nimûne ji wan hatine dan. Mirov dikare *Rêzimana kurdî*[2] ya Celadet Bedirxan û Roger Lescot (1971) ya bi fransî wek yekem rêzimannameyê bide ku bi rêjeyî bi berfirehî (bi qasî 10 rûpelan) behsa peyvsaziya kurmancî tê de hatiye kirin. Berfirehtirîn xebata çapkirî heta niha li ser peyvsaziya kurmancî hatî kirin, kitêboka Amed Tîgrîs *Pêşkît* û *parkît*[3] e. Giringtirîn berhema li ser vê mijarê bi soranî, kitêba Kamiran Rehîmî *Binemakanî wişesazî û wişeronan le zimanî*

---

[1] Di nivîsên kurdî de carinan *peyvsazî* bi xeletî bi maneya *morfolojî* hatiye bikaranîn. Bo nimûne, Samî Tan di kitêba xwe ya *Rêzimana kurmancî* de wiha dike û peyva *bêjesazî* bi wateya *word formation* dixebitîne. Bi dîtina min, *peyvsazî* û *bêjesazî* hevwate ne ji ber ku *peyv* û *bêje* hevmane ne. *Peyvsazî* bi maneya *morfolojî* şaş e ji ber ku *morfolojî* ne (tenê) çêkirina peyvan e lê hemû awayên çemandin û girêdanên peyvan û eyarkirina wan ya li gor dem û rewşên rêzimanî ye jî. Wek din jî *–lojî* ne *–sazî* (çêkirin) ye lê *–nasî* (nasîn, zanîn, zanist, ilm) ye. Herwiha *morf* jî ne tenê peyv in lê her *pirtik*a rêzimanî ye ku peyv jî tenê yek ji wan in. Min heta niha di nivîsên xwe de *pirtiknasî* bi wê maneyê bi kar aniye. Di soranî de jî *wişesazî* anku *peyvsazî/bêjesazî* (ji wişe = peyv, bêje) bi wateya *word formation* li kar e, ne bi maneya *morfolojî.* Bi heman awayî di farisî de *wajesazî* (waje = peyv, bêje, wişe) maneya *word formation* dide.

[2] Orijînala fransî û wergera wê ya tirkî û ya erebî li vir tên xwandin: https://zimannas.wordpress.com/2015/07/27/c-bedirxan-u-r-lescot-rezimana-kurdi-bi-fransi/

[3] Mirov dikare naveroka vê kitêbê li vê derê bixwîne: https://ku.wikibooks.org/wiki/P%C3%AA%C5%9Fk%C3%AEt_%C3%BB_Park%C3%AEt:_%C3%87end_gotin



www.arsivakurd.org

*kurdî da*[4]. Peyvsaziya kurdiya başûrî (feylî, kelhurî, kirmaşanî) bi nisbî bi berfirehî ji aliyê Ismaîl Kemendar Fettah ve di kitêba wî ya rêzimana kurdiya başûrî bi fransî de hatiye vekolîn.[5] Ne haydar im ku ti xebateke berfireh li ser peyvsaziya zazakî hatibe kirin lê di gelek kitêbên rêzimanî yên zazakî de bi kurtî behsa peyvsaziyê tê kirin û xaseten paşpirtik û pêşpirtik tên rêzkirin û nimûne jê tên dan.[6] Dirêjtirîn lîsteya paşpirtik (nêzîkî 200 lib) û pêşpirtikên (zêdeyî 70 pêşpirtik) kurdî di Wîkîferhengê de hatine rêzkirin û ji aliyê nivîserê vê vekolînê ve hatine berhevkirin.[7]

Ev xebatên hêja ne û di vê vekolînê de jî me sûd û feydeyekî mezin ji wan wergirtiye. Lê çendîn kêşe û pirsgirêkên cidî di van berhemên behskirî de hene:

1) Gelek ji wan (bo nimûne ya Amed Tîgrîs) bi qasî ku jê tê hewl didin hejmareke mezin ya paş- û pêşpirtikan didin lê erk û wateya wan yan qet nayê dan yan jî bi awayekî zêde giştî tê diyarkirin. Bo nimûne, Tîgrîs li ber hejmareke pir mezin ya ”parkît”ên (paşpirtikên) xwe dibêje ”rewş û taybetiyê dide diyarkirin”. Lê ji xwe her tişt rewş yan taybetiyekê dide diyarkirin!
2) Bi piranî pirtikên dariştinê (yên ku peyvên serbixwe çêdikin, *derivational*) û yên çemandin û girêdanê (*inflectional*) ji hev nayên cudakirin.
3) Di piraniya xebatên heyî de sinorê paşpirtik û pêşpirtikan nayên diyarkirin anku nayê gotin ka ev paşpirtik li gel çi birrên peyvan tên bikaranîn û bi kîjan re bikaranîna wan ne mimkin e, ka tesîra dengnasî (fonolojî) yan dengrêzî (fonotaksî) li ser guherîna wan çi ye, bi wan paşpirtikan peyv ji kîjan birrên peyvan diçin kîjan yên din û hwd.
4) Gelek ji vekolerên peyvsaziya kurdî hewl daye ku heta jê bê hejmara pêş- û paşpirtikan zêde bikin û wisa “kurdî dewlemendtir” bikin. Hin ji wan kesan ev yek

[4] Ev kitêb li ser vê girêdanê berdest e: http://www.ku.shafaaq.com/pdf/books/binemaka-gotar_1388.pdf

[5] Ismail Fattah Kamandar: *Les Dialectes kurdes méridionaux* (devokên kurdî yên başûrî) 2001: http://www.amazon.ca/Les-Dialectes-Kurdes-Meridionaux-Dialectologique/dp/9042909188

[6] Nimûneyek ji rêzkirina paşpirtikên zazakî: http://www.kirmancki.com/index.php/dersen-kirmancki/item/148-k-rmancca-da-yap-m-ekleri-qertafen-virastene

[7] Paşpirtik: https://ku.wiktionary.org/wiki/Kategor%C3%AE:Pa%C5%9Fbendik_(Kurd%C3%AE) û https://ku.wiktionary.org/wiki/Kategor%C3%AE:P%C3%AA%C5%9Fbendik_(Kurd%C3%AE).



www.arsivakurdi.org

rasterast gotiye, hinan jî ev yek ji dizîkî ve kiriye. Lê zêdekirina pirtikan yan giştîkirina hin ji wan ne illeh tenê dikare zimanê kurdî zengîn bike lê dikare wî tevlihev jî bike, bo nimûne bi afirandina çendîn formên cuda bi heman maneyê, wek *nivîskar, nivîser, nivîsevan, nivîsende, nûser, nûskar, nûsevan…*

5) Di piraniya berheman de, rehên lêkeran jî wek “paşpirtik” hatine hesibandin. Bo nimûne, ji 138 “parkît”ên (paşpirtikên) xwe hejmareke pir mezin di rastiyê de lêker in, wek “-bêj, -gir, -zan”. Di zimannasiyê de peyvên wiha adeten ne wek paşpirtik lê wek lêker (yan rehê lêkeran) tên hejmartin û peyvên ji wan çêkirî (bo nimûne *stranbêj, masîgir, kurdîzan*) ne wek peyvên dariştî (bi paşpirtikan yan pêşpirtikan çêkirî) lê wek peyvên pêkhatî (hevedudanî, *compound* anku peyvên ji du peyvan *navdêr+lêker* çêkirî) tên hesibandin.

6) Berhemên heyî bi piranî tenê behsa pirtikên ”kurdiya resen” dikin. Bo nimûne, Tîgrîs di kitêba xwe de rexneyeke dijwar li hin kesên din dike ku paşpirtika ”-çî” ya esil-tirkî di berhemên xwe de daye. Tîgrîs çend pirtikên ji zimanên ewropî wergirtî di kitêba xwe de rêz dike lê behsa yek pirtikên esil-erebî yên di kurdî de berbelav jî nake. Bo nimûne, pêşpirtikên *-ayetî, -et, -iyet* yan pêşpirtikên *me-, mi-, mu-, xêr- / xeyr-*. Li aliyekî din, piraniya van berheman gelek ji pirtikên bi zelalî farisî (û di kurdî de ne di nav xelkê de ne peyda) bê dudilî wek ”kurdiya resen” bi şanazî rêz dikin.

7) Gelek ji nivîsînên li ser peyvsaziyê ne li ser hindê radiwestin ka di zimanî de çi heye lê dixwazin wê bidin pêş ka li gor wan nivîseran divê mirov peyvan çawa çêke yan jî çawa çêneke. Anku ew ne li ser peyvsaziya heyî lê li ser awayên “meqbûl” yan “nemeqbûl” yên peyvsaziyê ne. Mixabin Rehîmî, ku berhema wî ya li jor behskirî berfirehtirîn û piralîtirîn vekolîna li ser peyvsaziya kurdî ye, ji vekolîna zimanê heyî zêdetir serê xwe bi rexnekirina neolojîzman anku peyvên nûçêkirî ve diêşîne û wan bi dijwarî rexne dike – gelek caran bi temamî bê heq.

8) Ji berhemên behskirî tenê kitêba Ismaîl Kemendar Fettahî ya rêzimana kurdiya başûrî bi fransî hewl dide ku bi awayekî objektîv nêzîkî meseleyê bibe û peyvsaziya kurdî wek heyî pêşkêş bike, ne wek “divê wiha bibe”. Kêşeyeke serekî ya vê berhemê ew e ku ew bi zimanekî hatiye nivîsîn ku piraniya kurdan nikarin jê sûdê wergirin: eger ew bi kurdî, erebî, farisî yan inglîzî bûya, rewşa dê baştir bûya. Pirsgirêka wê ya din jî sinordariya wê ye: ew behsa herdu zaravayên kurdî yên



www.arsivakurd.org

serekî û yên xwedî zimanên nivîskî yên standard (kurmancî û soranî) nake lê mijara wê tenê kurdiya başûrî ye ku heta niha ne xwedî zimanekî nivîskî yê gihiştî ye.

Tevî kêmasiyên behskirî jî, vekolînên berî niha kereste û materyalên bihagiran in bo vekolîna me ya di destê we de. Lê em ê bi vê vekolînê hewl bidin sentezekê di navbera wan de û lêkolînên peyvsazî yên navneteweyî de pêk bînin. Çavkaniyên me yên navneteweyî yên serekî *Word-Formation in the World's Languages*[8] (Peyvsazî di zimanên dinyayê de) ya P. Štauker, S. Valera û L. Körtvélyessy û herwiha *Word-formation* (Peyvsazî) ya P. Müller, I. Ohnheiser, S. Olsen û R. Rainer e.[9] Di Peyvsazî di zimanên dinyayê de behsa kurdî û zimanên nêzîk (ji aliyê binemalî ve anku farisî û zimanên din yên îranî yan jî ji aliyê cografî ve anku erebî û tirkî) nayê kirin[10] lê nimûneyên ji zimanên cuda-cuda rê û rêbazên giştî yên peyvsaziya kurdî û zimanên cîran (lê ne peyv û pirtikên wan) jî diyar dikin.

Ji aliyê peyvsazî ve kurdî û farisî di gelek nuqteyan de wek hev in tevî ku hin nuqte hene ku di yekê ji wan de hene û di yê din de peyda nabin û di hin xalan de jî ji hev vediqetin. Berevajî kurdî, vekolînên berfireh li ser peyvsaziya farisî hatine kirin. Ev hem bi farisî[11] û hem jî bi çend zimanên ewropî hatine nivîsîn.[12] Ji ber ku gelek ji rê û rêbazên peyvsaziyê di kurdî û farisî de hevpar in, me sûd ji wan berheman jî wergirtiye lê tenê bi şertê ku ew rê û rêbaz bi rastî di zimanê kurdî de (bi devkî yan nivîskî) hebin.

Ev lêkolîn dê hewl bide ku dîmenekî berfireh û piralî yê peyvsaziya kurdî bixe ber çavên xwandevanan. Armanc ew e ku em ji gelek hêlan ve li peyvên aloz anku kompleks (pêkhatî, dariştî, veguhastî û hwd.) binêrin. Armanca vê vekolînê ne ew e ku diyar bike ka ”divê kurdî çawa be” lê aşkere bike ka ”kurdî çawa ye”. Ev ne dîtinên vî vekolerî ne bo ku bibêje filan peyv yan awayê peyvê

---

[8] http://www.degruyter.com/view/j/lity.2013.17.issue-00003/lity-2013-0022/lity-2013-0022.xml

[9] http://www.amazon.com/Word-formation-International-Handbook-Languages-Europe/dp/3110375664

[10] Tenê du nimûne ji erebî û yek jî ji tirkî û yek ji farisî hatine dan. Ji aliyê cografî ve nêzîktirîn zimanên bi berfirehî nimûne jê dayî îbrî / îbranî û gurcî ne.

[11] Çavkaniya me ya serekî ya farisîziman *Iştiqaqê pesvendî der zibanê farisiyê êmrûz* (Dariştina paşbendî / paşpirtikî di zimanê farisiya îro de, Tehran 1992) ya Xosrow Kişanî ye.

[12] Berfirehtirîn vekolîn li ser dîroka peyvsaziya zimanê farisî bi zimanên ewropî bawernameya doktorayê ya Sedîqe Elîzade Lemcîrî (Sedigheh Alizadeh Lemjiri) ya bi almanî *Historische und vergleichende Untersuchung der Wortbildung im Persischen* (Lêkolîna dîrokî û berhevder ya peyvsaziya farisî) ye. Herwiha kitêba Gilbert Lazard *Grammaire persane contemporain*, ku wek *A Grammar of Contemporary Persian* jî hatiye inglîzîkirin, bi berfirehî behsa peyvsaziya farisî dike. Ji bilî van herdu vekolînên serekî, me herwiha çav li çend rêzimannameyên bi inglîzî û farisî gerandiye.



www.arsivakurd.org

rast e û bêvan jî xelet e lê bi piranî diyar bike ka peyvên kurdî bi çi rê û rêbazan çêbûne û çawa çêdibin.

Ev vekolîn û vekolerê wê herwiha xwe ji idia û armancên ”petîperistî” û ”paqijkirina zimanî” didin alî û ne alîgirên wan in. Em ê behsa hemû rêbazên peyvsaziyê yên di kurdî de heyî û pirtikên wê bikin bêyî ku hin pirtikan tercîh bikin ji ber ”reseniya” wan û hinan jî paşguh bikin ji ber eslê wan (bo nimûne *–çî* ya ji tirkî yan *me-* ya ji erebî). Di heman demê, wek yekem carê, ev vekolîn dê hewl bide ku etîmolojiya pirtikên peyvsaz (pêşpirtik û paşpirtik) pêşkêşî xwandevanan bike û hevrehên (*cognate*) wan anku ”xizmên wan” di zimanên lêzim û peywendîdar de jî bide.

## 2. PEYVÊN SADE Û YÊN ALOZ

Peyv (bêje, kelîme, wişe, bi inglîzî *word*) di zimannasiyê de ew şiklên gotinê ne ku ji yek yan zêdetir dengan (herfan) pêk tên û dikarin bi tenê bên gotin yan bên nivîsîn. Peyv dikarin watedar û binaverok bin, wek *agir, hinar, muzîk*. Lê ew dikarin bênaverok lê wezîfedar bin: hin erk û wezîfeyên rêzimanî pêk bînin, wek *bi, ji, na*.

Di kurdî û zimanên din de jî peyv adeten ji çend dengan (herfan) pêk tên lê çend peyvên kurdî yên yekdengî jî hene:[13]

- a: wek di gotina ”a min” anku ”ya min” de
- e: wek di gotina ”e” anku ”erê” de yan di hevoka “ew kurd e” de
- ê: wek di gotina “ê te” anku “yê te” de
- î: wek di gotina ”tu kurd î” de
- û: wek di gotina “ez û tu” de

Peyv dikarin sade yan jî aloz bin. *Peyvên sade* (yan xwerû, bi inglîzî *simple*) peyvên wisan in ku ti beşên wê nikarin jê bên avêtin bêyî ku ew bibe peyveke bêmane.

- mezin, gul, ji, zû…

Adeten peyvên sade di kurdî de ji 2 – 5 dengan yan herfan pêk tên. Lê, wek ku li jor hat gotin, hin yên yekdengî jî hene. Herwiha yên 6-dengî jî peyda dibin, bo nimûne:

[13] Bo lîsteyeke peyên kurt di kurdî de, binêrin: https://ku.wiktionary.org/wiki/P%C3%AAvek:Peyv%C3%AAn_kurd%C3%AE_y%C3%AAn_kurt

- derman, mercan, ceyran…

*Peyvên aloz* (pêkhatî, darişţî, çêkirî, hevedudanî, bi inglîzî *complex*) dikare ji du yan zêdetir peyvên sade pêk hatibe. Ew herwiha dikare ji peyveke sade û yek yan çend paşpirtik yan pêşpirtikan ava bûbe. Çend nimûne ji peyvên aloz:

- nîvro (ji du peyvên sade: nîv + ro[j])
- mezinahî (ji peyveke sade û paşpirtikekê: mezin+ahî)
- bêhêvî (ji pêşpirtikekê û peyveke sade: bê+hêvî)
- bêhêvîtî (pêşpirtik + peyveke sade + paşpirtik)
- birîndarî (peyveke sade + 2 paşpirtik: birîn+dar+î)
- bernedan (du pêşpirtik + peyveke sade: ber+ne+dan)

Mijara vê vekolîna me li ser peyvsaziyê ye anku çêkirina peyvên aloz ji peyvên sade ye. Wek prensîp, peyvên aloz *parvebar* in anku beşên wan dikarin ji hev bên cudakirin yan jî yek yan çend beş jê bên avêtin û dîsa beşa mayî watedar be.

- mezinahî → mezin
- birîndarî → birîndar → birîn
- bêhêvîtî → bêhêvî → hêvî

Wek ku tê dîtin, piştî parvekirinê jî peyvên mayî bimane û beraqil in. Loma mirov dibêje ku peyvên aloz parvebar in anku dikarin bên parvekirin.

Peyvên sade parvenebar in anku mirov nikare tiştekî ji wan bixe yan biavêje bêyî ku ew peyv xirab bibin û bêwate bibin. Bo nimûne, mirov nikare peyva *mezin* bike *mezi/mez/ezin/zin* ji ber ku ev peyv di kurdî de bêwate ne.

Carinan peyvên sade jî wek prensîp dikarin bên parvekirin û dîsa jî wek peyvên xwerû û serbixwe kar bikin. Bo nimûne:

- hêvî → hê (hê jî, hêşta, heta niha)
- hêvî → vî (evî, ev)
- derman → der (cih) + man (mayîn, sekinîn, rawestîn)
- dar → da



www.arsivakurd.org

Lê peyvên wiha dîsa jî parvenebar in ji ber ku ev imkana parvekirinê tenê tesadifî ye: peyva "hêvî" ji aliyê etîmolojî û dîrokî ve ti têkilî bi peyvên "hê" û "vî" ve nîne, peyva "derman" jî tarîxiyen ne ji peyvên "der" û "man" peyda bûye.[14]

Carinan du peyvên pir şibî hev jî yek jê aloz û parvebar e û ya din jî wek prensîp parvebar e lê dîrokiyen peyveke xwerû û sade ye û nikare were parvekirin:

- gulav (ji gul+av anku ava gulan)
- kulav (ne ji kul+av anku "ava kulan")[15]

Berevajî nimûneyên li jor, hin peyv hebûn ku tarîxiyen aloz û parvebar bûn lê niha êdî bûne peyvên peyvên sade û parvenebar. Bo nimûne, baş tê zanîn ku paşpirtikeke bi şiklê *-van* di kurdî de heye ku *navdêrên biker* (agent nouns) çêdike anku navdêrên bi maneya "kesa/ê ku tiştekî dike" dide. Ew paşpirtik xwedî gelek maneyan e lê ji hemûyan zêdetir wateya "nobedar, parêzvan, çavdêr" dide, wek di van peyvan de:

- gavan, pasevan, şivan…

Niha em bi hêsanî dikarin bibêjin ku *gavan* peyveke aloz û parvebar e: ga+van anku parêzvanên gayan (û heywanên din yên garanê: manga, golik). Ji vê, em bi hêsanî dikarin bibînin ku *-van* ya di peyva *şivan* de jî heman paşpirtik e. Madem wisa ye, *şivan* di rastiyê de peyveke aloz e. Lê gelo ew dikare were parvekirin?

Tarîxiyen *şivan* peyveke parvebar bû. Bo nimûne, di avestayî de ew bi şiklê *pşupane* bû ku ji peyvên *pşu-* (pez) û *pane-* (-parêz) anku *pezparêz* pêk dihat û bi zelalî peyveke aloz û parvebar bû.[16] Lê di kurdî de ti peyveke serbixwe bi şiklê *şi* nîne û ti maneyê nade. Paşpirtika "-van" jî nikare bi tenê wek peyveke serbixwe be[17] loma peyva *şivan* di kurdî de êdî peyveke sade û parvenebar e.

Şiklê aloz ji hin peyvên din jî diyar e lê mirov parvekirina wan dijwar e. Bo nimûne:

- **hêlîn**: Bi hêsanî mirov dikare bibêje ku têkilî peyva *hêk* e. Eger ne wisa hêsan be jî, dîsa bi lêhûrbûneke zêdetir mirov dikare pê bihese ku *lîn* ya wê hevreha peyva *lan, lane* ya bi

[14] Bo etîmolojiya van peyvan, binêrin: https://ku.wiktionary.org/wiki/h%C3%AAv%C3%AE û https://ku.wiktionary.org/wiki/derman.
[15] Bo etîmolojiya *kulav*, binêrin: https://ku.wiktionary.org/wiki/kulav.
[16] Berevajî ku bi gelemperî tê bawerkirin, ne têkilî peyva "şiv" e anku "şivan" ne sivikkirina "şiv+van" e. Bi heman awayî forma farisî "çûban" jî bi ser ve wisa dixuye wek ku ji "çû" (şiv, çîv, şivtan, ço, çov, dardest) be lê tarîxiyen ne wisa ye.
[17] Helbet peyveke bi şiklê "van" (pirhemariya çemandî ji cînavê "ev") di kurdî de heye lê ji aliyê etîmolojî ve ti têkiliya wê li gel "-van" ya di peyva şivan de nîne.



www.arsivakurd.org

maneya *kunc, qunc, cih, war* e.[18] Lê parvekirina wê wek hê+lîn ne mimkin e: *hê* bi tenê wek peyveke serbixwe ti maneyên têkilî peyva *hêk* nade.[19] Em peyva *lîn* jî ne wek peyveke serbixwe û û ji bilî di peyva *hêlîn* de wek paşpirtik jî nas nakin.

- **golik, goşt, guhan**: Ji aliyê dîrokî ve ev hemû têkilî peyva *ga* ne, bi farisî *gav*, berê *gaw*, bi îraniya kevn *gew-*.[20] Berevajî kurdiya niha, di îraniya kevn de û heta niha jî di gelek zimanên îranî de, *ga* ne tenê maneya çêlekên nêr lê ya hemû wî cinsê heywanan (nêr û mê) dide, wek ku ji peyvên kurdî *gar(r)an* û *manga/mange* (gayên mê) jî diyar e. Paşpirtika *–han* di peyva *guhan* de bi eslê xwe *–dan(k)* e wek di peyvên *guldank, şekirdank* de. Lê di peyvên kevnar de *d* ji nava vokalan de ji kurdî ketiye (bo nimûne kurdî *ba, bû, za* û farisî *bad, bûd, zad*) yan jî bûye *h* (meselen kurdî *bahîv/behîv/be'îv* û farisî *badam*)[21]. Lê dîsa jî *golik, goşt, guhan* di kurdiya niha de bûne peyvên sade û parvenebar.[22]

Mirov dikare lîsteyeke dirêj ya peyvên niha sade û parvenebar lê tarîxiyen aloz û parvebar bide.[23] Bo nimûne:

- **mirov, mêr**: ji rehê mir- anku "mirin", bi gotineke din = kesên mirbar, dimirin, ne nemir, ne xweda
- **stûn**: ji rehê st- bi maneya "sekinîn, li ser piyan/lingan bûn, neketî" ku di peyva *ra-we-**st**în, ra-we-**st**andin* yên kurdî de jî maye
- **bext**: avestayî bexte- ji beg+te ji beg- = parve kirin, dabeş kirin, lêk vekirin
- **ferman**: fre- = pêş, ma- = pîvan, wek di peyva "peyman" de, paşî di kurmancî de "ey" bûye "ê", wek soranî "pêwan" û taliyê bûye "î" û "m" jî bûye "v" û wisa "pîvan" ji "peyman" peyda bûye
- **embar**: ji hem+bar anku "[cihê] birin ber hev"

---

[18] Bo guherîna "a" bi "î", bide ber *kadîn* ji ka+dan (cihê danîna kayê), hevreha *agirdan(k), şekirdan(k), guldan(k)…*
[19] Tarîxiyen peyva *hêk* ji **hê* (hêk) û paşpirtika diminutîv (biçûkkirinê) –k peyda bûye lê êdî *hê* wek peyveke biçûknekirî bi maneya *hêk* nemaye. Li jêrtir li nimûneyên *kûçik, kitik, pisîk/pişîk* binêrin.
[20] Bo guherîna "-ew-" bi "-o-", bidin ber *xox, dor* ji erebî *xewx, dewr.*
[21] Bo guherîna "a" bi "î", bide ber nimûneyên me yên li jortin: *hêlîn* ji hêk+lan û *kadîn* ji ka+dan(k). Herwiha bidin ber guherîna "a" bi "î" di rehên lêkeran de: ç**a**nd → di-ç**î**n-im, m**a**n → di-m**î**n-im.
[22] Helbet di kurdî de wek prensîp mimkin e ku mirov *golik* û *goşt* parve bike û *go* (gog, gilovir, gurovir) jê bihêle lê ti têkiliya wan bi vê peyvê ve nîne. Herwiha *guhan* jî dikare wek prensîp bi hêsanî bibe guh+an lê ti peywendiya peyva *guhan* bi peyva *guh* re nîne û ew ne peyveke pirhejmara çemandî (paşpirtika -an) e jî.
[23] Xwandevanên hêja dikarin zêdetir agahiyan li ser etîmolojiya van peyvan di Wîkîferhengê de bibînin: https://ku.wiktionary.org



www.arsivakurdi.org

Hin peyv ji zimanên din ketine kurdî ku di wan zimanan de aloz û parvebar in lê di kurdî de peyvên sade û parvenebar in:

- **rewş**: ji farisî *reviş* ji *rev-* ku rehê peyva *reften = çûn, meşîn, bi rê ve çûn* e û –ş jî di farisî de paşpirtikek e.[24]
- **birnût**: ji tirkî *burunotu* yan *burun otu* anku *giyayê pozê/difinê/kepiyê* ku ji *burun* = poz û *ot* = giya)
- **mekteb**: ji erebî me+k-t-b. Pêşpirtika *me-* cihan diyar dike, wek ”-geh” ya îranî û bo heman pêşpirtik di peyvên wek *mekan, mesken, mehel, medrese* de jî heye. “-kteb” ji rehê k-t-b yê maneya *nivîsîn* e ku di peyvên wek *kitab, katib* de jî heye.
- **demokrasî**: ji yûnanî *demos* (gel, xelk, milet) û *kratos* (hêz, qiwet) anku demokrasî = hêza gel, hukimraniya xelkê.

Hin peyvên xwemalî jî hene ku wek peyvên aloz û parvebar dixuyin lê di rastiyê de nikarin bên parvekirin anku divê wek peyvên sade bên hejmartin. Di van nimûneyên me de xetika - ya nav peyvê diyar dike ku wek prensîp parvekirin dikare wiha be lê di pratîkê de ne mimkin e:

- kûçik (*kûç-ik), kitik (*kit-ik), pisîk / pisîk (*pisî-k), pişîk (pişî-k)

Carinan peyv dikare li gor hin devokan were parvekirin ji ber ku forma sade di wan devokan de heye lê li gor hin devokên din ew ne mimkin e. Bo nimûne, di kurmanciya navendî de jî û di ya rojhilatî de jî peyva *çêtir* heye. Ew li gor kurmanciya navendî peyveke aloz û parvebar e ji ber ku mirov dikare wê bike çê+tir. Di kurmanciya rojhilatî de jî paşpirtika –tir heye lê ti peyveke serbixwe ya bi şiklê *çê* di kurmanciya rojhilatî de nîne yan nemaye. Loma peyva *çêtir* di van devokan de bûye peyveke parvenebar.[25] Bi heman awayî di hemû kurmancî de peyvên bi maneya *zêdetir, zehftir* yên bi şiklê *bêhtir, bêtir, bihtir, pêhtir, pêtir, pitir* êdî parvenebar in ji ber ku ti peyvên têkilî wan yên serbixwe (*bê, *bêh, *pê, *pêh, *pi) nînin tevî ku mirov bi hêsanî dikare bibêje ku –tir ya dawiya wan paşpirtik e.

Peyva *mezintir* aloz û parvebar e (mezin+tir) lê hevwateya wê ya devokî *mestir* êdî nikare were parvekirin. Tarîxiyen mestir parvebar bû ji ber ku *mes-/mez-* bi xwe peyveke sade bû derengtir –in lê hatiye zêdekirin.[26] Anku di dîrokê de peyva *mezin* jî aloz û parvebar bû (mez+in). Lê ji ber ku forma

[24] Heman rehê farisî –rev- bi rêya soranî wek –rew- di peyvên *tundrew, peyrew* de jî ketiye kurmancî.

[25] Di kurmanciya rojhilatî de jî peyva “çê” di peyvên “çêbûn, çêkirin” de heye lê tenê wek pêşlêkerekê (preverb), ne wek peyveke serbixwe.

[26] Bo etîmolojia peyva *mezin*, binêrin: https://ku.wiktionary.org/wiki/mezin



www.arsivakurd.org

*mez-/mes-* wek peyveke serbixwe nemaye, hem *mezin* û hem jî *mestir* êdî peyvên sade û parvenebar in.

## 3. NASANDINA MIJARÊ Û PEYVNASIYA WÊ

Di zimannasiyê de *peyvsazî* (bi inglîzî *word formation*) tê maneya çêkirina peyvan. Çendîn rê û rêbazên çêkirina peyvan anku peyvsaziyê di kurdî û zimanên din de jî hene. Li vê derê em ê tê bikoşin wan bi awayekî tedarikî û sîstematîk peyvsaziya kurdî bidin nasîn. Piraniya van rê û rêbazan di peyvsaziyê de gerdûnî ne anku di gelek zimanên din de jî – lê ne hemû di her zimanî de – hene.

Em ê pêşî van awayên cuda bi kurtî bidin nasîn û paşî bi kûrahî herin nav her yekê ji wan û bi hûrî behsa bikaranîna wan rê û rêbazan di peyvsaziya kurdî de bikin. Rêbazên peyvsaziyê li gor giringiya wan di kurdî de hatine rêzkirin: yên destpêkê di peyvsaziya kurdî de (û gelek zimanên din de jî) pir giring in, yên dawiyê roleke kêm heye yan hema-hema tine ye. Lê bila hejmarkirina van rêbazan ne wek tiştekî mutleq û absolut were hesibandin. Dibe ku, bo nimûne, di kurdî de niha *wergirtin* ji *guhastin*ê giringtir be.

1. **Pêkanîn** (bi inglîzî *compounding*) di peyvsaziyê de tê maneya çêkirina peyvan ji peyvên heyî bi girêdana du yan zêdetir peyvên serbixwe bi hev ve, bo nimûne *serok+wezîr* → *serokwezîr*, *dest+pê+kirin* → *destpêkirin*. Ji peyvên wiha re di kurdî de *pêkhatî* tê gotin (carinan *hevedudanî/hevdanî/lêkdayî*).

2. **Dariştin** (*derivation*) çêkirina peyvan e ji peyveke serbixwe bi pêvekirina yek yan çend pirtikên (morfemên) girêdayî (neserbixwe) bi peyveke serbixwe ve, bo nimûne: *kurd+î* → *kurdî* yan *bê+hêvî+tî* → *bêhêvîtî*.

   Pêkanîn û dariştin di kurdî û piraniya zimanan de gelek giring in. Di rastiyê de, gava ku behsa peyvsaziyê tê kirin, piranî caran zimannas û xaseten jî rêzimannas, tenê li ser pêkanîn û dariştinê radiwestin û behsa awayên din yên peyvsaziyê nakin. Lê çendîn awayên din jî yên peyvsaziyê hene ku rola wan jî di çêkirina peyvan de di kurdî û zimanên din de ne biçûk e.

3. **Guhastin** (bi inglîzî *conversion*) neqilkirina peyvan ji birrekî peyvan (*word class, part of speech*) bo bikaranînê wek endamên birreke din ya peyvan e. Peyv wek xwe dimîne lê bergeha bikaranîna wê tê berfirehkirin yan jî guherandin.

   Bo nimûne, peyva *mezin* di kurmancî de rengdêr e (sifet e, bi inglîzî *adjective*), wek *Kurik mezin bûye*. Lê bi guhastinê peyva *mezin* dikare bibe navdêr jî (bi inglîzî *noun*): *Ew mezinê malê ye.* Peyva *gotin* di eslê xwe de lêker e (fiil, bi inglîzî *verb*), wek *Te çi got?* Lê bi guhastinê mirov dikare peyva *gotin* bike navdêr jî. Bo nimûne, *Ez gotinekê jî bi çînî nizanim.* Di vê hevokê de *gotin* maneya *peyv, kelîme* dide anku dibe navdêr.

4. **Dubarekirin** (*reduplication*) di peyvsaziyê de tê maneya çêkirina hin peyvan bi dubarekirina peyvekê bi temamî yan bi peyveke nêzîkî wê bi awayekî ku encama wê dubarekirinê peyveke yan gotineke bi maneyeke xweser bide. Bo nimûne, *car-car* bi maneya “hin caran, carinan”, *zû-zû* bi wateya “pir zû”, *heta-heta* yan *herûher* (bi edebî, bê dawî), *tiştûmişt* bi armanca “tişt û yên wek wan” ji hin awayên dubarekirinê ne. Dubarekirinê di kurdî de roleke giring heye.

5. **Zarvekirin** (*onomatopoeia*) di peyvsaziyê de tê maneya çêkirina hin peyvan li ber dengan. Bo nimûne: *teqe-req, dinge-ding, nale-nal, xuşîn, gurmîn, qîrrîn, qîjîn* hin ji nimûneyên peyvsaziya bi zarvekirinê ne.

6. **Wergirtin** (*borrowing*) yan *deynkirin* di peyvnasiyê de tê maneya neqilkirina peyvekê ji zimanekî din bo nav zimanê xwe. Bo nimûne, kurdî vê dawiyê peyvên wek *televizyon, Internet, radyo* ji hin zimanên ewropî wergirtine (yekser yan jî bi rêya tirkî, erebî yan farisî). Peyvên wergirtî dibe ku li gor rastnivîsîn, rêziman û dengnasiya kurdî bên eyarkirin (bo nimûne *televizyon* ji fransî *télévision* yan inglîzî television) yan jî wek orijînala wan bên hiştin, bo nimûne *out.*[27]

7. **Wergerandin yekser** (*calque, loan translation*) çêkirina peyvan li gor hevwateyên wan yên bi zimanekî din e. Anku peyva nû ji peyvên heyî yên xwemalî tê çêkirin lê li gor hevwateya wê peyvê ya bi zimanekî din tê avakirin. Bo nimûne, peyva *çande, çand* ya bi maneya *kultûr* ji

[27] https://ku.wiktionary.org/wiki/out

peyva heyî ya xwemalî ya *çandin* hatiye çêkirin lê ew wergerandina peyva *culture* ya zimanên ewropî ye ku ji peyva *cultūra* ya latînî ya bi maneya *çandin* e.[28] Peyva *pêvajo* (prose, proses) ya vê dawiyê di medyaya kurmancî de berbelav, wergerandina peyva *süreç* ya tirkî ye ku ji peyva *sür-mek* (ajotin) ya tirkî hatiye çêkirin. Peyva *zanîngeh* (unîversîte) wergerandina peyva farisî *danişgah* e, hevwateya wê ya soranî *zanko* wergerandina *cami'e* ya erebî ye...

***8.*** **Wergirtina wateyê** (*semantic loan*) tê maneya berfirehkirina (yan guherandina) maneya peyvên xwemalî li ber modela zimanên din. Bo nimûne, di kurmancî de *lê gerîn* tê maneya *hatin û çûn û nêrîn bi armanca peydakirina tiştekî*, bi inglîzî *to search, to look for*, bi tirkî *aramak*. Lê di tirkî de *aramak* herwiha maneya *bi telefonê axivîn* jî dide. Di inglîzî de ev herdu peyv maneya axivîna bi telefonê nadin. Di nav kurdên ne ji Bakurê Kurdistanê de, mirov bi mexseda axivîna bi telefonê, bi gotina *lê gerîn* bi kar naîne. Adeten mirov dibêje *telefon kirin*, bi soranî jî *telefon kirdin,* bi farisî *têlêfûn kerden.* Lê kurdên Bakurê Kurdistanê adeten li gor modela tirkî bi vê maneyê dibêjin *lê gerîn.* Ev nimûneyeke ji *wergirtina wateyê* ye.

***9. Lihevanîna dengî-wateyî*** (*phono-semantic matching*) tê maneya wergirtina hin peyvên biyanî û eyarkirina wan li ber peyvên xwemalî heçku ew peyvên xwemalî bin. Bo nimûne, peyva *bombebaran* û hevwateya wê *bombedûman*[29] di kurdî de tên xebitandin heçku ew ji peyvên "bombe+baran" yan "bombe+dûman" bin. Lê di rastiyê de ev peyv ji fransî *bombardement* (bixwîne: bombardman) hatiye wergirtin lê li gor peyvên xwemalî hatiye eyarkirin. Ji vê diyarde û fenomenê re *lihevanîna dengî-wateyî* tê gotin.

***10.*** **Qusandin** (*clipping) yan kurtkirin* tê nameya avêtina yek yan çend dengan/herfan ji peyvekê. Qusandin dikare li destpêkê, navê yan dawiyê peyda bibe yan jî aloz be. Bo nimûne *Miho* ji *Mihemed* (kurtkirin li dawiyê), *Aqûb* ji *Yaqûb* (kurtkirin li destpêkê), *bên* ji *bêhn* (kurtkirin li navê) û *Mem* ji *Mihemed* (kurtkirina aloz).[30]

---

[28] Ya kurdî ihtimalen ne yekser ji zimanên ewropî ye lê bi rêya tirkî *ekin* (kultûr, çande) ji *ekmek* (çandin) e ku ew bi xwe jî wergerandina peyva ewropî ye.

[29] Bo bikaranîn peyvê bi forma *bombedûman*, binêrin bo nimûne: http://ku.hawarnews.com/36778/

[30] Bo guherîna hejmara dengan di peyvan de, binêrin nivîsareke me ya xas: https://zimannas.wordpress.com/2015/07/09/guherina-hejmara-dengan-di-peyve-de/

***11.*** **Paşvesazî** (*backformation*) çêkirina peyveke nû bi kurtkirina peyveke heyî. Bo nimûne, *nivîs* ji peyva *nivîsîn* yan *ajo*[31] ji *ajotin*. Peyvên *ajotin* û *nivîsîn* ji mêj ve di nav gel de hebûne lê peyvên *nivîs* û *ajo* vê dawiyê ji wan hatine çêkirin.

***12.*** **Têkilkirin** (*blending*) tê maneya çêkirina peyvên nû ji hin beşên lê ne hemû beşên du yan çend peyvan. Di peyvsaziya kurdî û zimanên din de jî ev metod kêm li kar e yan qet peyda nabe. Lê vê dawiyê çend nimûneyên balkêş yên têkil di kurdî de hatine çêkirin. Ji wan yên herî navdar *tirkmancî* (têkilkirina *tirkî û kurmancî*) û *sormancî* (têkilkirina *soranî û kurmancî*) ne. Mirov dikare herwiha peyva inglîzî *brunch* (taşta dereng yan firavîna zû) wek nimûne bide ku ji têkilkirina ***br**eakfast* (taşt) û *l**unch*** (firavîn) hatiye çêkirin. Belkî di kurdî de mirov bikare peyva *paşîv* wek têkilkirineke peyva *paş* û *şîv* hesab bike lê dikare wê wek sivikkirina du dengên Ş bi Ş-yekê jî rave bike. Herwiha peyva devokî *nîro* dikare wek têkilkirina *nîv+ro(j)* were hejmartin. Lê têkilkirin adeten wek peyvsaziyeke bi zanîn tê hesibandin loma hejmartina van peyvên kurdî wek nimûne ji têkilkirinê hinekî biguman e.

***13.*** **Sernavî** *(acronym)* di peyvsaziyê de peyvên wisan in ku ji serherfên navê dezgehekê yan tiştekî pêk tê lê ne herf bi herf lê wek peyvekê tên gotin. Bo nimûne, *radar* ku kurtkirina peyvên inglîzî *radio detection and ranging* yan *Hadep* ku kurtkirina peyvên tirkî *Halkın Demokrasi Partisi* ye. Di kurdî de hin sernaviyên di zimanên din de çêkirî tên bikaranîn lê sernaviyên xwemalî hema-hema peyda nabin.

***14.*** **Saznavî** (*eponym*) di peyvsaziyê de ew peyv in ku ji navê kesekî yan dezgehekî hatine çêkirin. Adeten hin keşf û îcadên nû bi navê wan kesan yan şirketan tên nasîn ku wan ew tişt afirandiye yan vedîtiye. Bo nimûne, *aspîrîn* peyveke saznavî ye ji ber ku şirketeke almanî ya bi navê Aspirin aspîrîn yekem car saz kiriye. Ev awayê peyvsaziyê jî di kurdî de kêm li kar e yan qet peyda nabe.

[31] https://ku.wiktionary.org/wiki/ajo



www.arsivakurd.org

## 4. CUDAHIYÊN PEYVSAZIYÊ Û ÇEMANDINÊ

Di zimannasiyê de du beşên serekî yên nêzîkî hev peyvsazî (*word-formation*) û çemandin/tewandin (*inflection*) in. Di herduyan de peyv û şiklê wê diguhere (ji bilî peyvsaziya bi awayê guhastinê). Lê encamên peyvsaziyê û çemandinê ne wek hev in:

Di peyvsaziyê de peyvên nû yên bi maneyên nû ji peyva serekî cuda tên afirandin. Bi çemandinê mirov peyvên nû yên bi maneya ji peyva bingehîn cuda çênake lê bo nimûne cinsê peyvê (mê yan nêr), hejmara wê (yek yan gelek), dema wê (niha yan berê), erênî yan neyînî (dike/nake, kir/nekir, bûye/nebûye…) diyar dike.

Bi çemandinê birrê peyva bingehîn naguhere. Bo nimûne, "hat, nehat, hatiye, hatibû" bi çemandinê demên cuda diyar dikin lê dîsa jî ew hemû wek rehê bingehîn "hat" lêker in. Lê bi peyvsaziyê gelek caran (lê ne herdem) birrê peyva bingehîn jî diguhere. Bo nimûne, "azad" rengdêr e lê "azadî" navdêr e anku bi zêdekirina "î" li peyva bingehîn, peyveke ser bi birreke din yan peyvan peyda dibe. Ji heman peyvê mirov dikare "azadî-xwaz" jî çêke ku mebest jê ew kes in ku azadiyê dixwazin. Anku maneya peyvê diguhere, "azadî" tiştek e lê "azadîxwaz" mirov in. Anku maneya peyvê guheriye lê vê carê birrê peyvê her eynî dimîne.

## 5. GUHASTIN

*Guhastin* (*conversion*) yek ji awayên serekî yên peyvsaziya kurdî û hin zimanên din e. Mebest ji guhastinê bikaranîna peyvên bi eslê xwe endamên birreke peyvan wek endamên yek yan hin birrên din yên peyvan e.

Di guhastinê de di rastiyê de ti peyvên nû ji peyva heyî nayên çêkirin. Tenê maneya peyvê û bergeha bikaranîna wê tê berfirehkirin yan jî guherandin.

Di kurdî de, bi guhastinê her lêkera bi forma ferhengî (rader, infinitîv) dikare bibe navdêr.  Gelek navdêr dikarin bibin rengdêr. Rengdêr bi berfirehî dibin hoker lê gelek rengdêr dibin navdêr jî.

### 5.1. Navdêr ji lêkeran

Hemû lêkerên (*fiil, verb*) kurdî bi forma xwe ya ferhengî/rader (*infinitîv, mesder*) dikarin yekser bêyî ti guherînan wek navdêr (*ism, noun, substantîv*) bên bikaranîn. Gava ku ew wek navdêr tên bikaranîn, ew dikarin hemû taybetmendiyên navdêrên kurdî bigirin ser xwe (yekhejmar/pirhejmar, cins[32], diyarîtî/nediyarîtî, çemandina wek navdêrên din, girêdan/qertaf/izafe).

Bo nimûne, *gotin* (wek *min got*) bi eslê xwe lêker e lê di van nimûneyan de ew wek navdêr û bi taybetiyên çemandina navdêran li kar e:

- Gotin xweş in lê kirin xweştir e.
- Bi gotin**ê** û bi kirin**ê**.
- Gotin**a** wî xweş bûn lê kirin**ên** wan qirêj bûn.
- Çend gotin**ên** xweş
- Gotin**eke** bêwate.

Eger lêker pêkhatî (hevedudanî, compound) be, hingê wek lêker beşên wê ji hev cuda tên nivîsîn lê wek navdêr bi hev re.

Bo nimûne:

- **lêker**: kar kirin, dest pê kirin, ji bîr bûn, wêne girtin
- **navdêr**: karkirin, destpêkirin, jibîrbûn, wênegirtin.

Ev diyarde di zimannasiyê de bi navê *navdêrkirin* (*substantivization, nominalization*) tê nasîn.

Ji bilî lêkerên bi forma ferhengî, herwiha carinan rehê dema niha yan rehê dema borî jî yê lêkeran dikare wek navdêr bê bikaranîn:

- rehê dema niha: *ger(r)* ji *gerrîn, veger* ji *vegerîn*, rev ji revîn, *nivîs* ji *nivîsîn*: *Di nivîs-a wî de.*
- rehê dema borî: *destkeft, hilkeft, kir (*ji *bi dest keftin, hilkeftin, kirin): kir û kiryar* (kirin, tiştê ku hatiye kirin yan tê kirin, bi inglîzî *deed, act, action*)

[32] Hemû navdêrên bi guhastinê ji lêkeran çêkirî di kurmancî de mê ne.



www.arsivakurd.org

### 5.2. Navdêr ji rengdêran

Gelek rengdêrên (*sifet, hevalnav, adjective*) kurdî jî dikarin bi guhastinê anku bêyî ti pirtikên rêzimanî, ji rengdêriyê veguhezin navdêriyê. Gava ku ew wek navdêr tên bikaranîn, ew dikarin hemû taybetmendiyên navdêrên kurdî bigirin ser xwe (yekhejmar/pirhejmar, cins[33], diyarîtî/nediyarîtî, çemandina wek navdêrên din, girêdan/qertaf/izafe).

Bo nimûne, *biçûk* û *mezin* (wek *fîl ji mişkan mezintir in*) bi eslê xwe rengdêr in lê di van nimûneyan de ew wek navdêr û bi taybetiyên çemandina navdêran li kar e:

- Biçûk şîrîn in. (= Zarok şîrîn in.)
- mezin**a** wan dehsalî ye.
- mezin**ê** malê
- bilêtên biçûk**an** bi 10 ewro ne, bilêtên mezin**an** bi 20 ewroyan
- Tenê mezinek û du biçûk li malê bûn.

Ev diyarde jî di zimannasiyê de bi navê *navdêrkirin* (*substantivization, nominalization*) tê nasîn.

### 5.3. Rengdêr ji navdêran

Gelek navdêr jî dikarin wek rengdêran bên bikaranîn. Hingê ew jî dikarin xusûsiyetên rengdêran bigirin ser xwe. *Ker* heywanek e lê gelek caran bi maneya *bêaqil, bêhiş* wek rengdêr tê bikaranîn.

- Filan kes ker e. (bêaqil e)
- Bêvan kes ji filan kesî kertir e. (hê jî bêaqiltir e.)
- Ew kertirîn mirov e. (ji hemû mirovan bêaqiltir e.)

Navê gelek heywanên din jî wek rengdêr di kurdî û hin zimanên din de li kar e:

- şêr: wêrek
- rovî/rûvî: 1) tirsok, tirsonek, newêrek 2) hîlebaz, xapîner

Gelek peyvên hewayî yên navdêr jî bêyî ti guherînan bi guhastinê wek rengdêr di hevokan de cih digirin. Bo zelalkirina cudahiya erkê wan, em ê maneyên wan yên bi inglîzî jî li gel wan bidin:

[33] Hemû navdêrên bi guhastinê ji lêkeran çêkirî di kurmancî de mê ne.



www.arsivakurd.org

- ewr (navdêr - *cloud*) → bikaranîna wek rengdêr: Îro ewr e. (*It's a cloudy day.)*

Ev diyarde di zimannasiyê de bi navê *rengdêrkirin* (*adjectivization*) tê nasîn.

### 5.4. Rengdêr ji lêkeran

Lêkerên partîsîpî (rehê demên borî + -î/-yî) dikarin wek rengdêr û navdêran jî bên bikaranîn

- ew girtî ye (girtî = rengdêr)
- yê girtî hat berdan (girtî = navdêr)

Adeten formên din yên lêkeran bi guhastinê nabin rengdêr. Lê bo nimûne peyva *saz* ya rengdêr (çêkirî, eyarkirî, tamîrkirî, dirist, likar, ava, tişta/ê ku baş kar dike, ne xirab, ne xirabe) bi eslê xwe lêker e, ew di farisî de rehê dema niha yê lêkera *saxten* (çêkirin, saz kirin) e lê wek peyveke serbixwe bi veguhastinê bûye rengdêr.

### 5.5. Hoker ji rengdêran

Gelek ji rengdêrên kurdî bêyî ti guherandinê, bi guhastinê dibin *hoker* (*zerf, adverb*):

- Dengê wê xweş e. (xweş = rengdêr)
- Ew xweş stranan dibêje. (xweş = hoker)
- Karê te baş bû. (baş = rengdêr)
- Te baş kar kir. (baş = hoker)

Ev diyarde di zimannasiyê de bi navê *hokerkirin* (*adverbialization*) tê nasîn.

### 5.6. Daçek ji navdêran

Gelek ji daçekên (*adposition, preposition*) kurdî yekser ji nav navdêran hatine guhastin.

- Serê wî reş e. (ser = navdêr)
- Kitêb danî ser maseyê. (ser = daçek)
- Binê xanî riziye. (bin = navdêr)
- Av ketiye bin. (bin = daçek)



www.arsivakurdi.org

Navdêrên daçekkirî dikarin li gor qeyd û bendên navdêran bi çemandin yan jî – bi piranî – neçemin:

- nava malê / gundî (nav = navdêr)
- li nav / nava gundî (nav / nava = daçek)

Ev diyarde di zimannasiyê de dikare bi navê *daçekkirin* (*prepositionalization, adpositionalization*) were nasandin.

## 6. PÊKANÎN

Pêkanîn tê maneya hevgihandina du yan zêdetir peyvên serbixwe û çêkirina peyveke pêkhatî ji wan. Maneya peyva pêkhatî dikare pêşbînîkirî be yan jî tiştekî bi temamî jê cuda be yan jî tiştekî di navbera wan de be.

Bo nimûne:

- pêşbînîkirî: por-zer (mirov yekser jê fehm dike ku mebest jê "por" e û rengê wî porî zer e.)
- nepayî: destpêkirin (tenê bi hînbûnê mirov dizane ku maneya wê çi ye – ji peyvên pêkhatî ne yekser diyar e – ji peyvên wiha re îdyom/biwêj tê gotin)

### 6.1. Navdêr û navdêr

Peyvên pêkhatî dikarin ji du navdêran pêk bên. Me li jor peyva *serokwezîr* daye ku ji du peyvên navdêrî (serok û wezîr) pêk hatiye. Ji heman mijarê mirov dikare peyvên wek *serokdewlet, serokkomar, serokeşîr* bide.

Di kurmancî de bi giştî peyvên pêkhatî yên du-navdêrî bi qalibê *raveber + raveker* pêk tên. Anku peyva yekem peyva bingehîn e ku peyva duyem peyva yekem şirove dike. Bo nimûne: *jinbab/jinbav* jinek e anku peyva yekem peyva bingehîn e û *bab/bav* jî tenê wê şirove dike anku diyar dike ku ew jin ya babê/bavê kesekî ye.

Ev qeydeke giştî ya formûlaya *raveber + raveker* ya peyvrêziya zimanê kurdî ye: *jina bab(ê filan kesî*). Anku di peyvên pêkhatî de tenê girêdek (jin-**a**) û tewang (bab-**ê**) hatine avêtin û tenê *jinbab* maye.



www.arsivakurd.org

Mirov dikare hin peyvên din jî yên malbatî yên bi vî qalibî bide:

- jinmam/jinap, pismam/kurap, dotmam/keçap…

Lê ev qeydeya giştî ne bêawarte ye. Di hin peyvên pêkhatî de peyvrêzî berevajî ye:

- *kitêb-xane* ne kitêba xaniyan e lê xaniyê kitêban e anku raveker berî raveberê ye
- *kar-geh* ne karê cihekî ye lê cihê karekî ye anku raveker berî raveberê ye
- *Kurd-istan* ne kurdên welatekî (”stanekê”) ne lê welatê (”stana”) kurdan e anku raveker berî raveberê ye
- *xwarza/xwarzî* ne xweha/xuşka zarokekî ye lê zarokê xuşkê ye anku raveker berî raveberê ye

Çend sebebên dîrokî yên vê berojavîtiyê hene:

- Beşên duyem yên van peyvan (-xane, -geh, -istan, -za) **rêzimanî bûne** (*grammaticalized*) anku êdî ne wek peyvên serbixwe lê wek paşpirtikan tên hejmartin loma em wek qeyda giştî nabêjin **xanekitêb, *Stankurd*. Hêjayî gotinê ye ku bi kêmî *(i)stan û *xane di kurmancî de wek peyvên serbixwe di zimanê rojane de ne li kar in.
- Ev dikare ji tesîra zimanên din, xaseten tesîra farisî be. Di gelek zimanên din de peyvrêziya komika navdêrî berevajî kurdî ye. Bo nimûne:
    - kurmancî: karta telefonan
    - tirkî: telefon kartı
    - inglîzî: telephone card

Wek ku tê dîtin, di van zimanan de peyvrêzî berevajî kurdî ye. Di farisî de peyvrêzî carinan wek kurdî lê hin caran jî wek van zimanên din e. Tesîra vê carinan li ser kurmancî heye lê hê jî zêdetir li ser soranî heye. Bo nimûne, peyva kurmancî *jinbira* (jina birayî) li gor qeyda giştî ya kurdî ya raveber + raveker e. Lê hevwateya wê ya soranî tam berevajî wê ye:

- kurmancî: jinbira (jina birayî)
- soranî: birajin (jinbira, jina birayî)

Li gor mentiqa giştî ya peyvrêziya kurdî, “birajin”a soranî dê maneya “birayê jinê” bidaya lê di rastiyê de wateya “jina birayî” dide.

Vê dawiyê gelek peyvên li gor vî qalibî hatine çêkirin wek wergerên yekser yên ji zimanên din:

- *malper* (li ber inglîzî homepage ji *home* = mal, *page*= pel, perr, rûpel)



www.arsivakurd.org

- *serleşker, serfermandar* (ji tirkî *başkomutan* ji *baş* = ser, *komutan* = fermandar)
- *makezagon*[34] (bi maneya *qanûna bingehîn* li ber tirkî *anayasa* ji *ana* = mak, dayik, *yasa* = qanûn)

Wek ku tê dîtin, carinan du navdêr dikarin bi alîkariya navpirtika ***e*** jî bigihin hev. Mirov dikare wê herwiha bo nimûne di *dest-e-bira* de jî bibîne. Navpirtikên din yên ku dikarin du navdêran bigihînin hev ev in (li gor giringiya xwe di peyvsaziya kurmancî de):

1) **û**: karûbar, serûçav, devûlêv (rû, bi inglîzî *face*), dêûbab/dêûbav (*parents*), avûhewa (*climate*)…
2) **bi**: karbidest, darbidest, destbikar, destbişol, xwelîser…
3) **an/a**: sera(n)ser, bera(m)ber[35], şahinşah/şahînşah[36]…
4) **o**: serobin, taromar…
5) **aw**: rengawreng (rengîn, pirrengî), corawcor (ji pir coran/cûnan/çeşîtan)…

Ya yekem nimûneyek ji formûlaya *navdêr + girêder + navdêr* e. Ya duyem mîsalek ji forma *navdêr + daçek + navdêr* e. Ya sêyem mînakek ji qalibê *navdêr + pirhejmar + navdêr* e. Ya çarem varyanteke ji ya yekem e (û → o) û ya pêncem jî varyanteke ya duyem e (ji farisî *ba* → *va* → soranî *wa/aw* → kurmancî -*aw*- (tenê di herdu nimûneyên dayî de).

Adeten di kurdî de di peyvên pêkhatî de tenê du navdêr li pey hev hene. Lê zêdetir navdêr li pey hev jî mimkin in. Bo nimûne

- gulberoj (gul+ber+roj anku “gula berê wê li rojê”, bi inglîzî *sunflower*)

### 6.2. Navdêr û rengdêr

Di kurdî de di çêkirina peyvên pêkhatî de herwiha qalibê navdêr + rengdêr jî bi berfirehî li kar e. Adeten ji wan rengdêrên nû tên çêkirin:

- ser-bilind, mêr-xas, ser-reş, kezî-zer, rû-geş...

[34] Zagon ya li gor texmîna hinan “kurdî” di rastiyê de ji rûsî “zakon” yan zimanekî din yê slavî “zagon/zakon” e.

[35] “an” di peyva “beramber” de ji ber tesîra B bûye “-am-“

[36] Bi eslê xwe “şahan-şah” bû.



www.arsivakurd.org

Wek ku tê dîtin, ev peyv bi maneya we ya bingehîn rengdêr in. Lê ew herwiha dikarin bi hukmê guhastinê wek navdêr jî bên bikaranîn:

- mêrxas-ên kurd, kezîzer-eke swêdî…

Peyvrêziya komika "navdêr + rengdêr" jî wek peyvrêziya giştî ya kurdî adeten raveber berî raveker tê anku peyva serekî (bo nimûner "ser") pêşî tê û peyva diyarkirina çawaniya peyva serekî (bo nimûne "reş") li dûv peyva serekî ye. Dîsa ev jî ji ber wê ye ku peyva sereke di kurdî de di komikên girêdanê de jî yekem e û çawaniya wê li pey wê tê:

- serê reş (ne "reş ser")

Bi hin zimanên din dîsa berevajî kurdî ye. Bo nimûne:

- kurdî: por-reş / ser_reş
- tirkî: siyah saçlı (peyv bi peyv "reş por-î")
- inglîzî: dark-hair-ed ("tarî-por-î")

Di kurdî de jî di çend peyvan de peyvrêzî wek inglîzî û tirkî ye anku rengdêr berî navdêrê tê. Ev rengdêr dikevin berî navdêran:

- xweş: xweşmirov, xweşheval, xweşmêr, xweşxeber…
- têr: têrxwê, têrmû, têrşekir…
- kêm: kêmxwê, kêmşekir…
- pirr/pir: pir-rengî, piralî, pir_kultûrî…[37]

Mirov peyva *bihagiran* gelek caran bi forma *giranbiha/giranbuha* ya bi qalibê rengdêr + navdêr jî dibîne. Herwiha vê dawiyê peyva *bedbext* jî ya dîsa rengdêr + navêr di kurmancî de dibîne. Ji ber ku *bed* (xirab, nebaş) ji xwe di kurdî de di zimanê de ne li kar e û wergirtineke ji farisî ye, divê formên *giranbiha* û *bedbext* jî wek neqilkirinên ji farisî bên hejmartin. Ji xwe berevajî *bedbext*ê, hevwateya wê *bextreş* li gor qeyda giştî ya navdêr + rengdêr e.

Herwiha hejmareke biçûk ya rengdêran heye ku bi alîkariya navpirtika "-e-" dikeve berî navdêran. Wiha ne rengdêr lê navdêr tên çêkirin:

- pîrejin, pîremêr, *pîrebûk → pîrebok → pîrevok → pîrhevok

[37] Herwiha hevwateyên wê *fire-, heme-, gele-. Heme-* cînav e.



www.arsivakurd.org

- kurteçîrok (kurt-e-çîrok)
- kevnepêşmerge (kevn-e-pêşmerge: pêşmergeyên berê yan kesên ji mêj ve pêşmerge)

Lê çend rengdêr jî wiha hatine sazkirin:

- dûredest (dûr-e-dest: ne berdest)

### 6.3. Navdêr û hoker

Me li jor diyar kiriye ku peyvên wek *têr, kêm, pir(r)* dikevin berî rengdêran. Di rastiyê de ew dikarin ne rengdêr lê hoker jî bin. Ji xwe *pir, kêm* adeten zêdetir wek hoker li kar in, tevî ku wek rengdêr jî mimkin in.

Herçi hoker in, ew peyvsaziya pêkhatinê de dikevin berî navdêran, ne pey wan.

### 6.4. Navdêr û cînav

Peyvên pêkhatî yên bi qalibê *navdêr + cînav* di kurdî de peyda nabin. Lê yên bi qalibê *cînav + navdêr* hene. Xaseten cînavên *hev-* (û varyantên wê *hem-, him-*) û *xwe-*[38] di pêkanîna peyvan de tên xebitandin:

- hevkar, hember, hevpeyman, heval (yên li aliyê hev)
- xwehez

Lê bi parawêzî û marjinalî herwiha hin cînavên din jî di pêkanîna

- ezperistî (xweperistî, li ber *egoîzm*ê ku ji latînî *ego* = *ez* hatiye darıtin)
- bêtuyî, bêtuyîtî (bê hebûna te, dûrîtiya/xerîbiya ji te)

### 6.5. Navdêr û nîşanker

Di nav nîşankeran (*determiners*) de xaseten *her, ev, ew* dikarin li gel navdêran peyvên pêkhatî çêkin:

---

[38] Li gel varyantên devokî *xo, xu, xwa, xa.*



www.arsivakurd.org

- herdem, hergav, hero (her roj), herkes (her kes), hertişt (her tişt)
- evqas (hinde), evro (îro)
- ewqas (hind), ewende (bi soranî, ji “ew hende” bi maneya “ewqas, hind”)

### 6.6. Navdêr û lêker

Giringtirîn qalibê çêkirina peyvên pêkhatî di kurdî û zimanên din yên îranî de bi formûlaya *navdêr + lêker* e. Di van qaliban de navdêr neçemandî anku xwerû ye lê lêker dikare bi forma xwe ya *ferhengî* (rader, mesder, *infinitive*), bi rehê xwe yê dema niha yan jî – kêm caran – bi rehê xwe yê dema borî be.

#### *6.6.1. Navdêr û lêkera bi forma ferhengî*

Piraniya lêkerên ku di hin zimanên din de bi peyvekê ne, di kurdî û zimanên din yên îranî de adeten bi navdêrekê û yek ji van lêkeran in (li gor mişetiya peydabûna xwe hatine rêzkirin):

- kirin
- bûn
- dan
- girtin
- ketin
- xistin

Bo nimûne:

| kurmancî | soranî | inglîzî | erebî | tirkî |
|---|---|---|---|---|
| kar kirin | kar kirdin | work | ‘emele | çalışmak |
| nîşan dan | nîşan dan | show | ‘eredhe | göstermek |

Wek ku tê dîtin, di kurdî (kurmancî û soranî) de, ev lêkerên bi zimanên din yekpeyvî ji peyvên pêkhatî ne. Peyvên pêkhatî yên wiha dikarin ji navdêrên xwemalî yan jî biyanî bin:

**6)** stran gotin (*stran* ji kurdî)



www.arsivakurd.org

**7)** fehm kirin (*fehm* ji erebî)

Ji hin lêkeran hem peyveke xwerû û hem jî peyveke pêkhatî heye:

| pêkhatî | xwerû |
|---|---|
| nas kirin | nasîn |
| şuxil kirin | şuxilîn |

Carinan maneya wan hinekî ji hev cuda ye:

- xebat kirin – xebitîn

Hin caran maneya peyva xwerû û ya pêkhatî teqrîben bi temamî ji hev dûr ketiye:[39]

- helîn (bo nimûne berf/befr)
- hel bûn (kêşe, pirsgirêk)

Li gor rastnivîsîna kurmancî, gava ku peyvên pêkhatî yên navdêr + lêker ji hev cuda tên nivîsîn, encama wan lêker in. Bo dîtina cudahiya maneya wan, em ê nimûneyên xwe li inglîzî û tirkî jî wergerînin:

- fehm kirin (*to understand, anlamak*)

Lê gava ku ew bi hev ve bên nivîsîn, hingê ew dibin navdêr:

- fehmkirin (*understanding, anlama/anlayış)*

Herwiha cînavê pêvekirî (-ê) jî dikare li qalibê navdêr + lêker were barkirin anku bibe *navdêr + lêker + cînav*:

- agir berdanê (agir + berdan + -ê)

Qalibê navdêr + lêker herwiha dikare bibe *navdêr + daçek + lêker*:

- temaşe-yî [televizyonê] kirin (temaşe = navdêr, -yî = daçek, kirin = lêker)

Daçek û cînav dikarin di heman demê de jî li navdêr û lêkerê bên zêdekirin anku peyva pêkhatî ji qalibê *navdêr + daçek + cînav + lêker* were sazkirin:

[39] Herdu ji heman eslê erebî ne.



www.arsivakurd.org

- dest pê kirin (dest = navdêr, pê = bi wê = daçek-cînav, kirin = lêker)
- agir vêketin (agir = nd, vê = pê = bi wê = dç cn, ketin = lk)

### *6.6.2. Navdêr û lêkera bi rehê dema niha*

Ji bilî forma ferhengî/raderî, herwiha forma dema niha di kurdî û zimanên din yên îranî de bi berfirehî bo çêkirina peyvên pêkhatî tê bikaranîn:

- gulfiroş (ji gul = navdêr û firoş = rehê dema niha ji lêkera firotin)
- stranbêj (ji stran = navdêr û bêj = rehê dema niha ji lêkera gotin)
- welatparêz (ji welat = navdêr û parêz = rehê dema niha ji lêkera parastin)

Wiha adeten *navdêrên biker* (agent nouns) tên çêkirin anku navên pîşeyan û bikerên wan. Lê carinan navê amûr yan makîneyan yan cihê kirina tiştekî jî ji wan tê çêkirin:

- serşo (dûş, hemam) ji ser = navdêr û şo = rehê dema niha ji lêkera şûştin
- guldan (vazo, amana gul tê de ji gul = navdêr û dan = rehê dema niha ji lêkera danîn

Lê di kurmancî de adeten paşpirtika “-k” jî li peyvên wiha tê zêdekirin gava ku mebest jê ne mirov lê amûr yan aman bin:

- guldank
- serşok

Wiha mirov dikare maneya mirovan ji ya amûran yan amana jî cuda bike:

- cilşo (kesa/ê ku cilan dişo)
- cilşok (makîneya ku cilan dişo, makîneya cilşûştinê)

Wek prensîp, hemû lêkerên gerguhêz (têperr, transitîv) yên kurdî dikarin bi rehê xwe yê dema niha bikevin dûv navdêran û peyvên pêkhatî yên bi merema pîse_ yan biker (kesa/ê ku tiştekî dike) çêkin. Lê çend lêkerên giştî ji bilî rehê dema niha herwiha hewceyî paşpirtika “-er” in jî daku bikarin navdêrên biker pêk bînin:

- karker (ji kar-k-er ji kar = navdêr, -k- = rehê dema niha ji lêkera kirin û –er = paşpirtik)
- peyamber (ji peyam-b-er ji peyam = nd, -b- = rehê dema niha ji birin û –er = paşpirtik)
- nander (ji nan = nd, -d- = rehê dema niha ji birin û –er = paşpirtik)



www.arsivakurd.org

- mirovxwer (ji mirov = nd, -xw- = rehê dema niha ji birin û –er = paşpirtik)

Tarîxiyen ev "-er" ne paşpirtikek e ku dikeve pey van lêkeran lê beşek ji rehê lêkerê ye. Di kurmanciya rojhilatî û di soranî de "-e-" jî di rehê van lêkeran de maye (-ke-[40], -be-, -de-) û di zazakî de di rehê raweya bilanî (subjunktîv) de "-er-" bi temamî hatiye parastin (-ker-, -ber-, -der-, -wer-). Di farisî de jî "-er-" li gel lêkera *x(w)arden* (xwarin) hatiye lê "-we-" bûye "o": -xor- (ji -xwer-).

Carinan ev "-er" bi zêdehî li rehê hin lêkerên din jî yên sazkerên peyvên pêkhatî tê siwarkirin:

- "roman-nivîs-er" ku forma wê ya rasttir "romannivîs" e

Lê rehê dema niha yê gelek lêkerên gerguhêz (yên ku formên wan yên raderî/ferhengî bi –andin / -endin bi dawî tên) hevşiklên forma lêkerî ya heman lêkera gerneguhêz (têneperr, intransitîv) in:

- hejîn: rehê dema niha ji lêkera "hejandin" (bo nimûne: di-hejîn-im, na-hejîn-î, di-hejîn-e, bi-hejîn-in…)
- hejîn: hevwateya lêkera "hejandin" lê gerneguhêz

Ji ber vê sebebê, bo nimûne peyva "darhejîn" dikare bi du awayan were fehmkirin:

- kesa/ê (yan tişta/ê) ku daran/darekê dihejîne
- hejîna daran/darekê

Bi heman awayî "bombeteqîn"

- kesa/ê (yan tişta/ê) ku bombeyan/bombeyekê diteqîne yan teqandine/teqandiye
- teqîna bombeyan/bombeyekê

Bo rêgirtina li ber şaşfehmkirinê, mirov dikare "-er" li van peyvan zêde bike bi merema çêkirina navdêrên biker. Wiha mirov maneyên cuda bi peyvên cuda ifade dike:

- darhejîner: kesa/ê (yan tişta/ê) ku daran/darekê dihejîne
- darhejîn: hejîna daran/darekê
- bombeteqîner: kesa/ê (yan tişta/ê) ku bombeyan/bombeyekê diteqîne
- bombeteqîn: teqîna bombeyan/bombeyekê

[40] Rehê "-ke-" tenê di kurdî de hatiye parastin, ne di farisî de. Di farisî rehê dema niha yê lêkera *kerden* (kirin) –kon- e.



www.arsivakurd.org

Wek din jî bikaranîna ”-er” vê dawiyê di kurdî de çalak bûye û bi berfirehî bo çêkirina navdêrên biker tê bikaranîn. Bo vê, li beşa *darişstin*ê binêrin.

Herwiha cînavên pêvekirî (yan daçek û cînavên pevheliyayî) jî dikarin bikevin navbera bikevin navbera navdêr û lêkera bi rehê dema niha:

- destpêker (ji dest = navdêr, pê = daçek-cînav, k = rehê dema niha, -er = paşpirtik)

### *6.6.3. Navdêr û lêkera rengdêrkirî*

Di kurdî de herwiha bi berfirehî navdêr li gel lêkerên rengdêrkirî jî bo pêkanîna peyvên nû tên bikaranîn. Hem lêkerên gerguhêz û hem jî yên gerneguhêz dikarin vê erkê bigirin:

- hezkirî (ji hez = navdêr, kirî = lêkera gerguhêz ya rengdêrkirî)
- ziyanlêbûyî (ziyan = navdêr, bûyî gerneguhêz ya rengdêrkirî)

Di nimûneya duyem de herwiha daçek-cînava “lê” (li wê/wî/wan) jî heye anku mirov dikare wê wiha rave bike:

- ziyan-lê-bûyî (ziyan = navdêr, lê = daçek-cînav, bûyî = lêkera gerneguhêz ya rengdêrkirî)

### *6.6.4. Navdêr û lêkera bi rehê dema borî*

Ji bilî forma ferhengî ya lêkeran, rehê wan yê dema niha û lêkerên rengdêr kirî (rehê dema borî + -î/-yî, wek ”kir-î, bû-yî”), herwiha bi parawêzî anku marinalî rehê dema borî yê xwerû jî yê çend lêkeran bo çêkirina peyvên pêkhatî yên bi qalibê *navdêr + lêker* tên bikaranîn:

- bira-za (bira = navdêr, -za = rehê dema borî ji lêkera zan/zayîn)[41]
- agirperist / agirperest (agir = navdêr, perist = rehê dema borî ji lêkera peristin)

Wek din, rehê xwerû yê dema borî yê lêkeran di çêkirina peyvên bi qalibê navdêr + lêker ne li kar in. Formên wek *karkir, [bi]rêvebir* tenê varyantên xerabkirî yên peyvên *karker, birêveber* in.

[41] Di hin devokan de ”birazî” ku ”-zî” yaw ê kurtkirina “zayî” ye.



www.arsivakurd.org

### *6.6.5. Lêker berî navdêran*

Adeten di peyvên pêkhatî yên ji navdêr û lêkeran wisan in ku navdêr berî lêkerê ye. Lê bi taybetî vê dawiyê hin peyv hatine çêkirin ku lêker dikeve berî navdêrî (axlebe peyva "kar")

- firoşkar, nivîskar
- nivîsgeh
- xwandingeh / xwandegeh

Statuya "nivîsgehê" hinekî biguman e. Gelo ew ji rehê lêkerê –nivîs- yan jî ji peyva xwerû "nivîs" hatiye çêkirin? Herwiha gelo "geh" li vir navdêreke serbixwe ye yan jî tenê paşpirtik e? Lê nimûneyên me yên din, "firoşkar, nivîskar" bê guman diyar dikin ku çêkirin pêkanîna peyvan bi qalibê *lêker* + navdêr jî mimkin e tevî ku mirov "-kar" ya li vir ne wek navdêrekî serbixwe lê mîna paşpirtikekê jî fehm bike.

Ji nimûneya "xwandingeh / xwandegeh" yan jî varyantên wan "xwendingeh / xwendegeh" aşkera dibe ku lêker dikare ne tenê bi rehê xwe yê dema niha (di nimûneyên me de "-firoş-, -nivîs-) lê herwiha formên xwe yên din jî beşdarî vê peyvsaziyê bibe:

- xwandingeh / xwendingeh ( xwandin/xwendin = lêker bi forma raderî/ferhengî, -geh = navdêr yan paşpirtik)
- xwandegeh / xwendegeh (xwand / xwend = lêker bi forma dema borî, -e- = navpirtik anku infiks, -geh = navdêr yan paşpirtik)

### 6.7. Navdêr û hejmarnav

Navdêr û çend hejmar jî dikarin peyvên nû pêk bînin. Bi taybetî jî hejmara "du" di van peyvan de cih digire. Endam dikare rengdêr yan jî navdêr be. Bo nimûne:

- dudil (ji du = hejmar, dil = navdêr) anku kesa/ê bêbiryar, kesa/ê ku nikare yan newêre biryara xwe li ser tiştekî bide
- ducan / dugiyan: bihemle, girane, bizarr, zarok di zikî de
- çarriyan / duriyan (çar / du + rê + yan): cihê ku du rê di ser hev re derbaz dibin anku mirov dikare bi çar aliyan ve biçe
- dupê (bo nimûne mirov), çarpê (gelek heywan), sêpê (maseya / mêzeya agir li bin hilkirî)

www.arsivakurd.org

## 6.8. Daçek di pêkanîna peyvan de

Daçek jî bi çend awayên ji hev cuda beşdarî pêkanîna peyvan dibin. Ew dikarin li gel cînavan, lêkeran, navdêran, rengdêran û hejmarnavan peyvan pêk tînin.

### *6.8.1. Daçek û cînav*

Daçek û cînav hin daçek-cînavên pêkhatî çêdikin. Ji cînavan *hev* û cînavê pêvekirî *–ê* (wê, wî, wan) û hejmara yek bi forma xwe ya pêvekirî *–êk* (di kurmanciya rojhilatî û di soranî de bi maneya "hev" ya kurmanciya navendî) dikarin beşdar bibin:

1) jê (ji wê/wî/wan)
2) lê (li wê/wî/wan)
3) pê (bi wê/wî/wan)
4) tê de (di wê/wî/wan)

5) jêk (ji yek = ji hev)
6) pêk (bi yek = bi hev)
7) lêk (li yek = li hev)
8) têk (di yek = di hev)
9) vêk (varyanteke devokî ya "pêk"ê)

10) jev (ji hev)
11) lev (li hev)
12) pev (bi hev)
13) tev (di hev)

Mirov carinan hin peyvên pêkhatî yên ji daçek + cînav yên wek *jixwe* (ji xwe) û *bixwe* (bi xwe) jî dibîne. Lê piraniya nivîskaran wan wek *ji xwe* û xaseten *bi xwe* anku wek du peyvên serbixwe dinivîsin.

### *6.8.2. Daçek-cînav + lêker*

Daçek-cînav dikarin li gel lêkeran beşdarî sazkirina peyvan bibin.

14) jê kirin / jêkirin[42]
15) lê dan /
16) pêk anîn / pêkanîn
17) pev çûn / pevçûn

Ji bilî formên raderî, lêker dikarin herwiha bi rehê xwe yê dema niha (+ -er ya mihtemel) û herwiha bi forma xwe ya rengdêrkirî (rehê demên borî + -î/-yî) peyvan pêk bînin:

18) jêker / jêkirî
19) lêder / lêdayî
20) pêkîner / pêkînayî
21) pevçûyî

Nimûneyên aliyê çepê (jêker, lêder, pêkîner) biker û aktîv in anku ew tiştekî dikin lê mînakên aliyê rastiyê berkirî pasîv in anku tiştek li wan hatiye kirin yan tê kirin.

Ji nimûneya dawiyê diyar dibe ku lêkerên gerneguhêz ("çûn") tenê dikarin bibin berkirî anku armanc û endama kirinê, ne biker anku armancgir û encamderên kirinê. Loma forma "pevçûyî" heye lê forma "*pevçer" peyda nabe.

### *6.8.3. Daçek + cînav + lêker*

Ji bilî daçek-cînavan (cînavên pêvekirî wek *jê, lê, pê, tê*) herwiha hin cînavên serbixwe jî dikarin bikevin navbera daçek û lêkeran:

22) li hev kirin / lihevkirin
23) ji hev veqetandin / jihevveqetandin
24) bi hev ketin / bihevketin
25) ji xwe çûn / jixweçûn (ji hal çûn)

[42] Li gor rastnivîsîna kurmancî, formên ji hev cuda nivîsandî (jê kirin, lê dan…) lêker in, formên pêkvenîsandî (jêkirin, lêdan…) lêkerên navdêrkirî ne.



www.arsivakurd.org

Herwiha paşdaçek jî dikare lê were zêdekirin:

26) bi xwe ve mîstin, bi xwe ve rîtin / bixwevemîstin, bixweverîtin

### *6.8.4. Daçek + navdêr + lêker*

Daçek dikarin li gel navdêran û di heman demê de bi lêkeran re jî peyvan pêk bînin:

27) bi cih hiştin / bicihhiştin[43]

28) ji nav birin / jinavbirin

29) ji kar ketin / jikarketin

Adeten navdêr di peyvên wiha pêkhatî de di dema çemandina lêkeran de jî neçemandî dimînin:

30) Makîneya me ji kar ketiye (êdî kar nake, naxebite…)

31) Ew hatin jinavbirin (qirrkirin, nehiştin, birandin, qedandin, hilweşandin…)

Lê di hin biwêjan de navdêr dikare çemandî be:

32) ji holê rakirin / jiholêrakirin

### *6.8.5. Pêşdaçek + navdêr + daçek + lêker*

Ne tenê pêşdaçek (daçekên berî peyva serekî, *preposition*) lê herwiha paşdaçek (daçekên li pey peyva serekî, *posposition*) jî beşdarî avakirina peyvên nû dibin. Paşdaçek adeten hevdem li gel pêşdaçekan li kar in:

33) bi rê ve birin (meşandin - lêker), birêvebirin (karê meşandinê – navdêr), birêveber (meşîner, kesa/ê ku tiştekî bi rê ve dibe, dimeşîne – navdêrê biker, *agent noun*), birêveberî (karê birêveberan), birêvebirî (meşandî, hatî birêvebirin – lêkera rengdêrkirî, *past participle*)

Di axiftinê de û carinan di nivîsînê de jî pêşpirtik dikeve:

34) rê ve birin, rêvebirin, rêveber, rêvebirî

[43] formên ji hev cuda nivîsandî (bi cih hiştin, ji kar ketin…) lêker in, formên pêkvenîsandî (bicihhiştin, jikarketin…) lêkerên navdêrkirî ne.



www.arsivakurd.org

Pêşdaçekên bê paşdaçek jî carinan dikevin:

35) serke(f)tin (< biserke(f)tin)

Di hin gotinan de ne di zimanê devkî de û ne jî yê nivîskî de pêşdaçek nemaye:

36) berxwedan (ji *liberxwedan ji lêkera “li ber xwe dan”, micadele kirin, tê koşîn)

### *6.8.6. Daçek-cînav + navdêr*

Adeten daçek yan daçek-cînav li gel navdêran lê bêyî lêkeran peyvan pêk naînin. Lê bi kêmî peyva nûçêkirî *jêder* (çavkanî, serekanî, bi inglîzî *source, resource*) bi qalibê *daçek-cînav + navdêr* e. Di rastiyê de ew kurtkirinek e, bo nimûne ji *jêderketin, jêderxistin, jêderhatin* –û hwd.

### *6.8.7. Daçek + cînav + rengdêr*

Di kurdî de çend peyv hene ku ji qalibê *daçek + cînav + rengdêr* pêk hatine. Ji aliyê watenasî ve jî ew pir nêzîkî hev in:

37) jixwerazî (ji + xwe + razî)
38) bixwebawer (bi + xwe + bawer)

Herwiha qalibê *navdêr + daçek-cînav-rengdêr* bi kêmî di peyvekê de peyda dibe:

39) xwedêjêrazî

### *6.8.8. Daçek bi pey lêkeran ve*

Daçek -***e*** (li cihê “bo, ji bo, ji re, jê re, ber bi ... ve, heta) dikare dikeve pey lêkeran. Lêker di demên cuda de be:

40) wî got → wî got-e min (ji wî min re got, wî bo min got)
41) ez dibêjim → ez dibêjim-e wî (ji wî re dibêjim, bo wî dibêjim)
42) ew hat → ew hat-e malê

Daçeka pêvekirî “e” di vê rewşê de ne zerûrî ye anku mirov dikare wiha jî bibêje:



www.arsivakurd.org

43) wî got min

44) ez dibêjim wî

45) ew hat malê

Eger ji xwe “e” li dawiya lêkerê hebe, ew êdî nayê dubarekirin:

46) ew diçe → ew diçe malê (ne *diçe-ye malê)

Carinan bikaranîna “e” dikare dema borî ya sade û dema borî ya dûdar bike yek:

47) dema borî ya sade: ez hatim → ez hatime malê

48) dema borî ya dûdar: ez hatime → ez hatime malê

Bo rêgirtina li ber xeletfehmkirinê, mirov dikare daçeka “e” ya nezerûrî di dema borî ya sade de bi kar neîne:

49) ez hatim malê

### *6.8.9. Daçek bi pey navdêran ve*

Daçeka ***–î*** (-yî) dikeve pey hin navdêrên beşa yekem lêkerên pêkhatî yên bi qalibê navdêr + lêker:

50) temaşe-yî televiyonê dikir

51) zar-î / zehr-î xelkê (ve) nekin

52) lêvên wê maç-î dike

Wek ku ji nimûneya yekem diyar e, ev daçek liv û hereketa ber bi tiştekî ve diyar dike. Lê wek ku ji herdu mînakên din tê dîtin, ev wate ne herdem berçav û zelal e.

Di hevoka yekem de “yî” dikare bi daçeka serbixwe “li” were veguhastin. Di heman demê de jinûverêzkirina peyvan di hevokê de pêwîst e:

53) li televizyonê temaşe dikir

Di hevoka duyem de daçeka pêvekirî “î” di heman demê de li gel paşdaçeka ”ve” hatiye bikaranîn. Di hin devokan de ev ne zerûrî ye anku mirov dikare wiha jî bibêje:

54) zarî xelkê nekin

www.arsivakurd.org

Di hevoka sêyem de li gor hin devokan girêdana "maç"ê bi daçeka "î" ve zerûrî ye. Di hin devokên din de ev "î" nayê bikaranîn û mirov dibêje:

55) lêvên wê maç dike

#### *6.8.10. Daçek-cînavê "ê" bi pey lêkeran ve*

Daçek-cînavê pêvekirî -***ê*** (-yê) dikare bikeve pey lêkerên liv û hereketê:

56) got-ê (ji wê/wî/wan/wir re got)
57) biçim-ê (biçim wê/wî/wan/wir)
58) hatibûn-ê (hatin wê/wî/wan/wir)
59) nedin-ê (nedin wê/wî/wan/wir)

Wek ku tê dîtin, "ê" wek cînav cihê "wê/wî/wan" digire. Lê ew herwiha dikare cihê "wir, wê derê" jî bigire:

60) nehatin-ê: bo nimûne 1) nehatin bûkê (= wê) 2) nehatin malê (= wê derê)

Di heman demê de "ê" daçek e jî ji ber ku liv û hereketa ber bi cihekî yan tiştekî yan kesekî ve diyar dike:

61) hat → hat-e malê → hat-ê

Mirov dikare bibêje ku "e" ya daçek bi cînava pêvekirî "ê" ve heliyaye.

Eger ji bilî "e" ya daçek, "e"-yeke din bi lêkerê ve hebe, hingê "e" di zimanê nivîskî de nahele lê "e" + "ê" dibin "-iyê":

62) dibe + ê → dibiyê (dibe wir)
63) daye + ê → dayiyê (daye wî)
64) hatine + ê → hatiniyê

Lê di zimanê devkî de "e" bi "ê" ve dihele û "iyê" nayê bikaranîn:

65) daye + ê → dayê
66) hatine + ê → hatinê

Parastina "iyê" di zimanê nivîskî de giring e çunkî di zimanê devkî de du demên cuda dibin ye:



www.arsivakurdi.org

| têxistin | encam bi nivîskî | encam bi devkî |
|---|---|---|
| da + ê | dayê | da(y)ê |
| daye + ê | dayiyê | da(y)ê |
| hatin + ê | hatinê | hatinê |
| hatine + ê | hatiniyê | hatinê |

### 6.9. Rengdêr û rengdêr

Di kurdî de du rengdêr dikarin peyvên pêkhatî çêkin. Adeten ew du rengdêrên dijwate anku antonîm in. Ew axlebe bi alîkariya navpirtika "-û-" yan jî "-e-" bi hev ve tên girêdan:

67) reşûspî: *televizyoneke reşûspî* (ne rengîn)

68) reşûşîn: şopa lêdanê li ser leşî

69) têrûtesel

70) kevnenû: hinekî kevn, hinekê nû

### 6.10. Rengdêr û navdêr

Li jortir, di beşa *navdêr û rengdêr* de behsa peyvên bi qalibê *rengdêr + navdêr* jî hatiye kirin. Ji qenciya xwe, li wê beşê binêrin.

### 6.11. Rengdêr û lêker

Di peyvsaziya bi pêkanînê de, li gel qalibê navdêr + lêker, şiklê *rengdêr + lêker* giringtirîn awayê çêkirina peyvên pêkhatî ye. Hem lêkera gerguhêz *kirin* û hem jî lêkera gerneguhêz *bûn* di vê peyvsaziyê de çalak in:

71) xweş bûn

72) xweş kirin

www.arsivakurdi.org

Maneya van peyvan di zimanên din de carinan bi lêkereke xwerû û carinan jî bi qalibekî wek kurdî rengdêr + lêker tê ifadekirin. Bo nimûne:

| kurdî | inglîzî bi lêkereke xwerû | inglîzî bi rengdêr + lêker |
|---|---|---|
| mezin bûn | grow | become bigger |
| mezin kirin | grow | make bigger |

Di rastnivîsîna kurmancî, eger peyvên pêkhatî yên rengdêr + lêker ji hev cuda bên nivîsîn, encama wan lêker e. Bo têgihiştina meremê, em ê nimûneyên xwe li inglîzî û tirkî jî wergerînin:

73) tercime kirin (to interpret, tercüme etmek)

Lê eger ew bi hev re bên nivîsîn, encam dibe navdêr (yan lêkerên navdêrî):

74) tercimekirin (interpretation, tercüme etme, tercüme)

Ne tenê forma ferhengî ya lêkeran, lê herwiha rehê dema niha û forma lêkeran ya rengdêrkirinê jî dikarin li gel rengdêran peyvên pêkhatî çêkin:

75) ji rehê dema niha: xweşbêj, mezinker, hînber, pirrxwer[44]
76) ji lêkerên rengdêrkirî (rehê dema borî + -î/-yî): xweşgotî, mezinkirî, hînbûyî

Rehê demên borî yê xwerû li gel rengdêran ne li kar e. Lêkera "-go" di peyvên wek "rastgo, bilindgo" de ne forma devokî ya rehê dema berê ya lêkera "gotin" (bi giştî "got") ye lê forma farisî ya rehê dema niha ji lêkera "goften" (gotin) e.

Carinan mirov peyvên wek *amadebûyên / tevlîbûyên civînê* di nivîsên medyayê de dibîne. Li gor vê mentiqê, divê ev peyv di haletê girênedayî wek *amadebû / tevlîbû* bûna anku ji rengdêr + rehê dema borî yê xwerû pêk hatibin. Lê di rastiyê de peyvên wiha çêkirî nînin, eslê wan *amadebûyî / tevlîbûyî* ne anku di dema girêdayî de divê *amadebûyiyên / tevlîbûyiyên civînê* bûya lê ew hatine "sivikkirin".[45]

[44] Li gel lêkerên "birin, dan, kirin, xwarin", rehê kevnar yê bi forma rehê dema niha ya nû + "-er" li pey rengdêran li kar in.

[45] Yan jî helbet dikarin wek "amadeyên civînê" hê jî siviktir bibe. Xistina kîteya "yi" ji berî kîteya "yê" ya şibî wê, di zimannasiyê de wek diyardeyeke bi navê haplolojî tê nasîn.

### 6.12. Rengdêr û hoker

Rengdêr dikarin li gel çend hokeran jî peyvên nû pêk bînin:

77) pirçandî / pirkultûrî / pirzimanî (pir[r] = hoker, beşên duyem jî rengdêr in)

Li cihê “pir(r)” ya kurmancî, mirov carinan “fire” jî dibîne ku bi rêya soranî ji kurdiya başûrî yan jî ji hewramî hatiye:

78) firekultûrî

### 6.13. Hoker û lêker

Peyvên nû dikarin ji girêdana hoker û lêkeran bi hev ve jî bên pêkanîn. Ew bi qalibê *hoker + lêker* in anku hoker berî lêkerê tê. Lêker dikare bi forma xwe ya ferhengî, ya rehê dema niha yan jî ya rengdêrkirî be:

79) zûmeşîn (meşa bilez)
80) hêdîliv (ya/yê ku hêdîka dilive)
81) zûçûyî (ya/yê ku hê ji zû/mêj ve çûye)

### 6.14. Nîşander û hejmarnav

Nîşander û hejmarnav jî dikarin bi hev re peyvan pêk bînin. Ji nîşanderan axlebe peyva “her” beşdar dibe:

82) heryek, herdu, hersê, herçar…

### 6.15. Cînav û lêker

Cînav nemaze li gel lêkeran peyvan pêk tînin. Ji cînavan axlebe *xwe* yan *hev* beşdar dibin. Bo destnîşankirin guherîna maneyê bi pêkanînê, em ê nimûneyên xwe li inglîzî û tirkî wergerînin:

83) kuştin (kill, ölmek) > xwekuştin (suicide, intihar)
84) dîtin (see, görmek) > hevdîtin (meet, görüşmek)

Ji bilî forma xwe ya ferhengî, lêker dikare herwiha bi rehê dema niha yan jî ya rengdêrkirî be.

85) xwefiroş (xaîn yan bênamûs)

86) hevgirtî (kesên yan hêzên ku bûne yek yan pişta hev girtiye)

### 6.16. Lêker û lêker

Behsa beşdarbûna lêkeran di pêkanîna peyvan de li gel birrên din yên peyvan li jortir hatiye kirin. Du lêker bi hev re jî dikarin peyveke nû çêkin ku maneyeke taybet dide. Ev pêkanîna adeten bi rêya girêdana bi navpirtika "û" tê çêkirin. Ew axlebe lêkerên dijwate ne:

87) danûstandin (dan-û-standin: muamele, mizakere, têkilî…)

88) hatinûçûn (hatin-û-çûn: liv, tevger, trafîk…)

89) rabûnûrûniştin (rabûn-û-rûniştin: reftar, irf û edet…)

Carinan peyva yekem ne bi forma xwe ya ferhengî lê bi rehê xwe yê dema borî tê bikaranîn:

90) hatûçûn

Heta herdu lêker jî dikarin bi rehê dema borî bin:

91) hatûçûya tirimpêlan (= trafîk)

Awayê rastnivîsîna van peyvan – nivîsîna bi hev re yan ji hev cuda – hê cihê xwe negirtiye. Ew bi temamî ji hev cuda, bi alîkariya xetika girêder û hem jî bi temamî bi hev re jî tên dîtin:

92) hatin û çûn

93) hatin-û-çûn

94) hatinûçûn

Peyva *gotûbêj* (suhbet, hevpeyivîn) ji rehê dema borî + rehê dema niha yê heman lêkerê (gotin) hatiye çêkirin. Ew navdêr e tevî ku herdu peyvên ew jê çêbûyî rehên lêkerê ne. Heman peyv bi awayên *guftûgo* û *giftûgo* jî heye. Ev form ji farisî hatine wergirtin: *guft/gift* ji farisî *goft* (rehê demên borî ji lêkera *goften* = gotin) û *-gû-* (rehê demên niha û bên ji heman lêkerê, hevberî *-bêj-* ya kurmancî). Ev diyarde di farisî de di çend peyvên din de jî heye, bo nimûne *xerîdfiroş* ("kirrîfiroş" anku kirrîn û firotin, "danûstandin"[46]) û *poxt-pez* ("pehtpêj" anku karê pehtinê, xwarinçêkirinê). Di

[46] Li aliyekî din, "danûstandin" jî li ber modela tirkî *alışveriş* hatiye pêkanîn.

rastiyê de *gotûbêj* bi xwe jî kurmancîkirina forma *goftûgû* ya farisî ye, yekser yan jî bi rêya *witubêj/wituwêj* yên soranî yên bi heman awayî li ber modela farisî pêkhatî.

***Ev vekolîna li ser peyvsaziya zimanê kurdî dê di hejmara bê de bidome***

www.arsivakurd.org

# Rêzimana Dîwana Melayê Cizîrî

**Lezgînê Çalî**



## Destpêk

Yek ji lêkolînên ku cihê wê di lêkolînên kurdolojiyê da bi giştî û di warê zimanzaniya kurdî da bi taybetî vala ye lêkolînên liser rêzmana dîrokî ya kurdiyê ye. Pirraniya lêkolînan bi piştgermiya jêderên ne kurdî yên mîna nivîs û kevir-niviştên Pehlevî an zimanên dî yên ziman-malbata Hindûewropayî hatine kirin.

Di vê lêkolînê da, bizav hatiye kirin ku bi meyizandina awayê xebitandina hindek lêkeran di Dîwana Melayê Cizîrî da aliyekê dî yê nepen ji dîroka zimanê kurdî bihêt eşkira kirin. Ev lêkolîn dikare bibe sedema destpêbûna zincîreka lêkolînên hevşêwe di warê zimanzaniya dîrokî ya zimanê kurdî da.

Dîwana Cizîrî wekî kan û madenekê gelek gewherên hêşta dernexistî têda hene. Ji gelek aliyan ve mirov dikare lêkolînan liser Dîwanê bike. Aliyên hizrî, felsefî, civakî, dîrokî, edebî, siyasî, zimanî, hwd. Hêşta gelek aliyên nedîtî û nebihîstî yên vê kaniya zelal hene. Gelek kesan bê şehrezayiyeka serdemiyanî û bi şêwaz û metodên dûr ji lêkolînên zanistî kitêb û nivîsar liser Melayê Cizîrî û dîwana wî belav kirine ku pirraniya wan ji rastiyê dûr in. Jibo mînak gelekan gotiye û nivîsiye ku Melayê Cizîrî destgirtiyek bi navê Selmayê hebûye. Gelekan gotiye destgirtiya wî ne Selma, lê Selwa bûye. Gelekan jî ev zanyarên şaş di kitêb û nivîsarên paştir da dubare û çendbare kirine. Heta vê gavê jî dîwaneka bê şaşî û dirist jî çap nebûye. Li goreyê şêwazên tûjandin û vejandina destxetên kevin, hêşta jî Dîwan bi dirstî nehatiye tujandin. Lê ev hemî jî ne babetê me yê evro ye.

## Biyav û Bazina Lêkolînê

Xwîndin û lêkolîna rêzimana dîwana Cizîrî, bêguman dê lîkolîna rêzmana kurdiyê be. Ev jî ne karê nivîsar an gotareka mîna vê ye. Lewma, dema bihêt gotin "rêzimana Dîwana Cizîrî", dibê merem tiştekê dî be. Di vê lêkolînê da, ez dê li destpêkê piçekê behsa hindek ji wan saloxetên bingehîn yên zimanê kurdî kim ku bi dîtina min hindek caran dihên piştguhvehavêtin. Anku di pişka yekê ya lêkolînê da dê behsa wan alî yên rêzimanî bihêt kirin ku giştî yên zimanê kurdî in. Jibo mînak, hindek aliyên wekî ergatîvitiyê gellek bi eşkirayî di Dîwanê da hatine parastin.

Lê, erkê serekî yê vê lêkolînê ku orîjînalitiya wê ye behsa awayê xebitandina hindek lêkeran di Dîwanê da ye.

Hindek rastî liser nijinman anku konstruksyona Dîwanê bi xwe jî hatine eşkira kirin. Bi gotineka dî, hûrbûna li Dîwanê bil ji zêdekirina zanînên me liser zimanê kurdî zanînên me liser Melayê Cizîrî bi xwe jî zêde dikin. Bi hevberdanana Dîwana Cizîrî digel dîwanên helbestvanên dî yên kurdan ku hevdemên Cizîrî bûne an hema demeka kurt piştî wî hatine, mirov dikare bi awayekê zanistî awayê werarkirin û guhartinên zimanê kurdî di van çend sedsalên dawiyê da jî binitlîne (çart bike).

Ev hemî hêvênê lêkolînên dî ne.

## 1. Aliyên Giştî yên Rêzimana Kurdî di Dîwanê da

### 1.1. Ergatîvîtî

Yek ji bingehên serekî ku wekî saloxeteka karakterîstîk a zimanê kurdî ye ergatîvîtî ye. Ez li vêderê nakim ku behsa ergatîvîtiyê bi xwe bikim. Jiber ku babetê me ne we e. Kesên ku dixwazin hema behsekê kurt liser ergatîvitiyê bixwînin dikarin nivîsara min a liser rûperîn torgeh anku websîteya nefel.com-ê bixwînin (http://www.nefel.com/kolumnists/kolumnist_detail.asp?MemberNr=31&RubricNr=24&ArticleNr=4508).

Tiştekê baş e ku bi bîra guhdaran biînim ku min di çi malikek ji malikên Dîwana Cizîrî da nedîtiye ku bêrêzî li ergatîvitiyê hatibe kirin. Berniyas e ku li dema vehûnandina helbestan bi erûz û kêşên erebî helbestvan gellek caran dikeve nav tengasiyan da. Jibo xelasbûna ji wan tengasiyan, carina hindek qayîde û binemayên denganî (phonetic) û dengzanistî (phonolojîk), rêzimanî û kelwaşzanistî (morfolojîk) bin pê dibin. Yek ji tiştên ku çi caran di Dîwanê da nehatiye dîtin ew e ku ergatîvîtî qurbanî kêş û erûzê bibe. Anku bi ber çavên min nekeftiye ku tenê di malikekê da jî Melayî ergativitiya kurmanciyê neparastibe. Di warê ergativitiyê da, yekdestî anku konstîstensiyeka weha di Dîwanê da heye ku eger mirov di destnivîsekê da binpêkirineka wê jî bibîne, dikare bê dudilî û guman bibêje ku şaşiyek di dema libernivîsînê da qewmiye û ew neparastina ergativitiyê ne karê Melayî bi xwe bûye. Çend mînakekên ergativitiyê:

***Yarê ku dî em geda, dest bi destê me da***

***Em bi semayê birîn, reqs û sema jî we ma.***

Hûn dibînin ku “yar” kithejmar e, lê ji ber ku “em” pirhejmar e, lêkera hevokê bûye “birîn”, ne bir. Bi kurdiyeka pexşankî hevok weha ye: Yarê em bi semayê birîn.

***Bi zehrê xwe y’ şerîf xwendim, go “xidmetkarê dêrîn î,***

***Te purr cewr û cefa dîne d’ silûk û se’y û cehdê da”.***

Hûn dibînin ku “te” a kithejmar cewr û cefa “dîtine”, ne “dît”. Mînakên wekî vê gelek in, herwekî min got, ez naxwzaim liser ergatîvitiya zimanê dîwanê biaxivim, ji ber ku bi rastî çi mînaneka bervajî wê di Dîwanê da nîne. Hûn dê bibînin ku jiber pêdivîtiya kêş anku mûsîqaya helbestan, Melayî carcar aliyên dî yên gramerê binpê kirine, lê min qet binpêkirina ergatîvitiye nedîtiye.

***Zulfên but û şîrîn-leban jehrî ne şubhet eqreban***

***Lê min ji biska purr-girê, îro tenê girtin du ta.***

Dîsa jî hûn dibînin ku “min”ê kithijmar du tayên biska pirr-girê “girtin”.

www.arsivakurd.org

## 1.2. Zayenda Navan

Di dîwana Cizîrî da bi eşkirayî zayendên wekî kurmanciya evro hene. Lê, ji ber ku dêrr û malikên helbestên Dîwanê bi kêşan û pîvanên erûza helbesta erebî hatine kêşan û pîvan, li hindek cihan zayend qurbanî kêş û mûsaqaya helbestê bûye. Lê tiştekê pirr giring heye ku dibê bihêt gotin. Pirraniya caran, zayend ji ber bikarînana term û risteyên farisî di helbesta kurdî da hatine binpêkirin. Jibo mînak, di kurdiyê da av navekê mê ye (ava sar, ava zelal), lê hindek caran di helbestên Cizîrî da li şûna *av*a kurdî, *ab*-a farisî hatiye û riste û îdiyomên mîna "abê çeşm"ê ji wê hatine çêkrin. Anku dema îzafe anku birnesera peyvan li goreyê risteyên farisî be, zayend di îzafeyê da wekî zayenda nêr diyar dibe. Di serrastkirina destxetan jibo capê da jî dibê ev yek li ber çavan bihêt girtin (û ev yek di hemî dîwanên çapbûyî yên Dîwana Cizîrî da hatiye piştguhvehavêtin). Nemaze dema peyvên ku di farisî û kurdiyê da wekhev in (can, hebîb, qelb, derd, sofî, dua, seher, …) di dîwanên çapkirî da ew risteyên farisî jî mîna yên kurdî derbaz dibin, lê di koka xwe da ne kurdî ne. Hindek mînakên vê ev in:

***Xerqê <u>deryayê</u> gunah în, teşneyê lutfa heq în***

***<u>Rehmetê</u> Amurzgar û <u>şefqetê</u> Xeffar bes.***

Wekî hûn dibînin, *derya, rehmet* û *şefqet* di kurdiyê da mê in, lê di helbestê da, jiber parastina kêşa eruzî ya helbestê û jiber îdiyomên farisî-erebî, zayenda wan wekî ya nêr hatiye. Mînakeka dî:

***Ku îşaret bi bişaret biderit <u>nexmeyê</u> çeng***

***Ji rûyê <u>ayîneyê</u> dil birretin <u>perdeyê</u> jeng.***

Di vê malikê da jî, *nexme*, *ayîne* û *perde*, hersê mê in û li goreyê ristesazî a farisiyê di kurmanciyê da wekî navên nêr hatine (*nexmeya çengê*, *ayîneya dilî*, *perdeya jengê*). Lê ji bîr mekin ku dema ez dibêjim zayenda wan anvên mê wekî nêr hatiye, di rastiyê da ew ne nêr hatine. Tenê ku ew wekî farisiyê bihên nivîsîn di kurdiyê da wekî navên nêr dihên xwîndin.

Mînakên mîna van gelek in, lê ev mistek in ji barekî.



www.arsivakurd.org

### 1.3. Tewang

Li gelek cihan, di Dîwanê da tewang jî qurbanî kêşa helbestê bûye. Ev di stranên fulklorî yên kurdî da ku kêşa wan ne kêşa erûza erebiyê ye jî dihêt dîtin. Anku qurbanbûna tewangê li beranberî kêş û rewaniya helbestê ne tiştekê taybetî yê qalibên teng ên helbesta erûzî ye. Tiştê ku nabe bihêt jibîrkirin ew e ku binpêkirina tewangê di helbestan û stranan da çi qas rewa û belav jî be, ev yek di zimanê pîvankî anku standard da ne rewa ye. Mînakeka vê ev e:

***Ku <u>îşaret</u> bi <u>bişaret</u> biderit nexmeyê <u>çeng</u>***

***Ji rûyê ayîneyê <u>dil</u> birretin perdeyê <u>jeng</u>.***

Mirov dikare vê malikê bi kurdiyeka pexşankî weha binivîse: *Ku nexmeya çengê îşaretê bi bişaretê biderit, perdeya jengê ji rûyê ayîneya dilî birretin*. Hûn dibînin ku tewandina îşaretê, bişaretê, çengê, dilî, û jengê hatiye binpêkirin.

Mînakeka dî:

***Belko dîwar bi guh in, lê bi Xudê kî, bi Xudê!***

***Bi tu rengî nekirî eşkere esrarê <u>hudûs</u>.***

Li vêderê *hudûs* nehatiye tewandin. Mînakeka dî:

***Ma ji umrê me çi mabit, were êdî vi me ra***

***Da di eqtarê wucûdê bikirîn seyrê <u>melek</u>.***

Ev mînak pirr balkêş e. Di nîvmalika duyê da *wucûd* hatiye tewandin û bûye “wucûdê”, lê her di wê nîvmalikê da, ji ber parastina kêşa helbestê, “melek” nehatiye tewandin.

Mînakên ji vî rengî jî zehf in. Herwekî zayendê, dibe ku risteyên li goreyê ristesaziya farisiyê jî rolek di vê binpêkirina tewangê da hebe. Lê ya rast ew e ku nemana tewangê gelek caran ne ji ber bandora farisiyê, lê ji ber erûz û kêşa helbestê ye.



www.arsivakurd.org

Tiştê balkêş ew e ku qet ergatîvitiya kurdiyê ji ber kêşa helbestê nehatiye binpêkirin. Ev bingehînbûn û pêdivîbûna ergatîvityê wekî saloxeteka dî ya kurdiyê diselmîne û îsbat dike.

### 1.4. Kurtkirina Peyvan

Di axiftina rojane ya kurdan da gelek caran hindek peyv bi awayekî dihên kurtkirin ku hemî kes bi kurtkirîbûna wan dihesin. Jibo mînak, her kurmancek, li kî deverê dibe bila bibe, û ser bi kî devokê dibe bila bibe, dizane ku "dibêm" kurtkiriya peyva "dibêjim"ê ye. An "mi go" kurtkiriya "min got"ê ye. Mînakên weha di Dîwana Melayê Cizîrî da jî hene. Ez dê çend mînakên wê diyar bikim.

***Yarê ku <u>dî</u> em geda, dest bi destê me da***

***Em bi semayê birîn, reqs û sema jî we ma.***

Li vir "dî" li şûna "dît"ê hatiye. Mînakeka dî:

***<u>Heçî</u> furqet <u>nedî</u>, hicran, <u>nebê</u> "min dax û key lê ne"***

***Jibil derbê di hicranê, firaqê rûh û can kê da.***

Peyva "heçî" kurtkiriya "her çî"yê ye, "nedî" kurtkiriya "nedît"ê ye, "nebê" kurtkiriya "nebêjit"ê ye.

***Ji Wadî Eymenê dilber <u>nizam</u> enguştek izhar kir***

***Ku xweş enwar û berq in, ew tecellî bûn di Torrê da.***

Di vê malikê da jî "nizam" li şûna "nizanim"ê hatiye. Di mînakeka dî da "min" hatiye kurtkirin:

***Zahir tu perîşaniya hale <u>mi'</u> nebîn***

***Mecmu' di zatê xwe û Tuxra im ez.***

Bi dîtina min xebitandina peyvên kurtkirî nîşaneyeka peydabûna astên cida-cida yên zimanî ye. Jibo mînak, dema kurdek digel mezinekî, berpirsekî, seydayekî biaxive, kêmtir peyvên kurtkirî bi kar diîne,

lê dema digel hevalên xwe an endamên malbata xwe diaxive zêdetir dibêje “mi’ go’.” Lê, jibo mînak, dema kesekê xelkê Silêmaniyê berî 60-70 salan ji zaroyan ra digot “minall” nedizanî ku kurtkiriya “mindall”ê bû. Jiber ku wî qet nedigot “mindall”. Kurmancan dema digot “dibêm” dizanî “dibêjim” jî hebû.

### 1.5. Neparastina Daçekan ji ber Kêş û Erûza Helbestê

Ev jî tiştekê hevpişk yê hemî edebyata me ya nivîskî û zardev û klasîk û nûjen e. Mînakên wê jî dibe ku di helbesta erûzî da mişetir bin, ji ber ku qalibên helbesta erûzî ji ya azad tengtir in. Hindek mînakên wê di Dîwanê da ev in:

***Zerreyek bûm <u>di</u> hewaya te <u>di</u> wêraneyekê***

***Mislê rojê bi şu’aa xwe te meşhûr kirîn.***

Awayê pexşankî yê vê malikê (ku yek ji malikên bijare yên rewanbêjî ya Dîwanê ye), dibê bi vî awayî be: “Ez zerreyek bûm <u>di</u> wêraneyekê <u>da</u>, <u>di</u> hewaya te <u>da</u> (anku di eşq û evîna ted a), wekî (mislê) rojê bi tîrojka (şu’aa) xwe te em meşhûr kirîn”. Wekî dihêt dîtin, du caran “da” hatiye piştguhvehavêtin.

### 1.6. Ji-hev-veqedandina Parçeyên Lêkeran

Dîsa dibe ku jiber rewanbêjiyê an jî ji ber kêşa erûzî ya helbestê, carina lêker jî parçe dibe:

***Selwa ’eqarib lê weten, ew nazika nûrîn-beden***

***Qendê dirêjin guft û ken, biskan <u>di</u> lê <u>kir</u> baweşîn.***

Di koka xwe da, dibê “lê dikir baweşîn” ba.

### 1.7. Awayê Cida yê Kesê Yekê yê Pirrhijmar

Bi xêra kêş û mûsîqaya helbesta erûzî mirov bi eşkirayî dibîne ku di Dîwanê da, wekî pirraniya deverên Behdînan û Hekariya ya niha, Mela jî kesê yekê yê pirrhijmar cida ji du kesên dî yê pirrhijmar dixebitîne. Niha di wê kurmanciya nîv-pîvankî da ya ku pirranî li Bakur dihêt bikarînan jibo me û em-

ê jî lêker mîna (he)we û hûn û wan û ew-ê dihêt bikarînan. Jibo mînak em/hûn/ew hatin/keftin/dîtin/kuştin û em/hûn/ew diçin/dibînin/dibêjin.

Lê, li pirraniya deverên Behdînan û hindek deverên Hekariyayê hêşta dibêjin: Em hatîn/keftîn/dîtîn/kuştîn, û em diçîn/dibînîn/dibêjîn.

Mînakên weha di dîwana Melayê Cizîrî da jî mişe in. Bi dîtina min ku bervajî vê di Dîwanê da hebe, an jiber parastina kêşa helbestê bûye an jî ji şaşiyên libernivîsîna nivîskaran.

***Yarê ku dî em geda, dest bi destê me da***

***Em bi semayê birîn, reqs û sema jî we ma.***

“Em birîn”, ne em birin.

***Du sucde ferz in, fîlhal bibîn ber***

***Dema xoya bin ew qed û qamet.***

Li vêderê jî, “bibîn” hatiye. Mînak zehv in, ez tenê dê wan xêzlibin nivîsim:

***Dest nehêlîn em ji se’y û cehdeyê***

***Cehde û se’ya me nadit her ’ebes.***

***Kerixîn em di qiyamê, me ji dil perde dirrand***

***’Arifê weqt im û Me’rûf bila bêt ji Kerx***

***Bê hed ku ’eyb d’ ew bexşeya Rizwanê Xeyb***

***Van naliyan nînin tu ’eyb, suhtîne em, dil bû seqer.***

***Xerqê deryayê gunah în, teşneyê lutfa heqq în***

***Rehmetê Amurzgar û şefqetê Xeffar bes.***

www.arsivakurdi.org

## 1.8. Çêkirina Lêkerên Kurdî ji Peyvên Erebî

Yek ji saloxetên zimanên zindî ew e ku li dema wergirtina peyvan ji zimanên biyanî wan peyvan li goreyê rêzmana xwe dixebitînin. Lê mixabin niha di kurdiyê da (û bi rengekê gellek berçaftir di farisiyê da jî) lêkerên ku ji peyvên biyanî dihên bi rêya lêkerên alîkar ên mîna kirin, girtin, dan û bûn-ê dihên xebitandin. Mînakên van coreyên lêkeran di kurdiyê da gellek hene: hisabkirin, kopîkirin, resimkirin, îsbatkirin, haşayîkirin, îfadekirin. Ev awayê çêkirina lêkeran wesa berbelav bûye ku peyv û lêkerên kurdî jî hingaftine. Niha mirov peyvên mîna hizirkirin, pirskirin, axiftinkirin û hwd jî dibihîse. Bi rastî ev tiştekê wesa ye ku li paşerojê dikare makîneya kurdiyê bisekinîne.Berê di kurdiyê da elimandin, elimîn, tebitîn, fehmîn, xeyyirîn, qulipîn (qulibîn), û gellek peyvên dî yên mîna van ji peyvên erebî hatine çêkirin û hatine bi kar anîn. Lê niha tenê li hindek deverên mîna Şingalê hêşta ev saloxeta kurdiyê maye û carina dibe sedema wê ku xelkên Dihokê henekên xwe bi şingaliyan bikin. Li Şingalê mirov mişe rastî peyvên mîna beyyitîn, ecizîn, ezilîn, û hwd dihêt. Melayê Cizîrî jî mînakên weha di helbestên xwe da înane:

***Ew şekl û sûret <u>sewwirîn</u>, esl in lib ala <u>zeyyinîn</u>***

***Nisbet bi wan em saye în, tertîbê xellaqî we da.***

Lêkera *sewwirîn*-ê ji sûret (wîne) ya erebî hatiye çêkirin. Sewwirîn lêkereka negerguhêz anku nederbaz e. Lê di mînaka bihêt da sewwirand hatiye ku lêkera gerguhêz anku derbaz a wê ye:

***Husnek munezzeh <u>sewwirand</u>, nûra Hebîb jê afirand***

***Alem di kunhê <u>heyyirand</u>, Rûhulqudis can nefxe da.***

***… Işqa ji husnê rakirî, xaret kirin hûr û perî***

***Herçî di kunhê <u>fekkirî</u>, ew ma di ecz û heyrê da.***

Lêkerên *fekkrîn* û *heyyirand* û *sewwirand* jî bi rêz ji peyvên erebî yên *fikr*, *hîret* û *sûretê* hatine çêkirin.

Ev di avakirina zimanekê standard da dikare gellek bi kêrî me kurdan bihêt.

### 1.9. Kurdandina Peyvên Erebî

Di dîwana Melayê Cizîrî gellek peyvên erebî û farisî hene. Jiber rênivîs anku alfabêya Kevin a kurdî (ku mîna ya farisî) liser bingehê alfabeya erebî hatibû avakirin, şiklê peyvên erebî dihat parastin. Anku, êdî giring nebû ka kurdan ew peyvên erebî bi çi awayî bilêv dikirin û digotin, ew peyv bi rênivîsa xwe ya erebî dihatin nivîsîn. Ev awayê nivîsînê tiştekê berniyas yê pirraniya pergalên nivîsînê li cîhanê ye. Bi vê yekê etîmolojî anku riha peyvan dihat parastin. Hemî edebyata klasîk ya farisî, kurdî, osmanlî, urdû, peştû û neteweyên dî yê îranî gevahên vê rastiyê ne.

Niha jî di pirraniya Dîwanê Melayê Cizîrî da, çi yên ku bi tîpên erebî li Başûr, Rojhilat û Rojavayê, çi jî yên ku bi tîpên latînî li Bakur an Ewropayê belav bûne, peyvên erebî bi awayekî ji awayan wekî peyvên erebî dihên nivîsîn. Ji xwe nivîsîna peyvên erebî bi tîpên erebî ne zehmet e, lê bi alfabeya latînî jî, wekî Dîwana çapa Nefel/Arasê, peyvên erebî bi hindek tîpên cida ji tîpên kurdiyê hatine nivîsîn.

Bi ser vê hemiyê ra jî, li hindek cihan, bi eşkirayî Melayê me peyvên erebî kurdandine. Çawa? Jiber ku rênivîsa original ya Dîwanê erebiye û jiber ku hemî helbest liser kêşa erûzî hatine helbestin, mirov dikare bi eşkirayî bibîne ku li hindek malikan da peyvên erebî wekî peyvên kurdî hatine nivîsîn, bi awayekî ku eger wan bikî erebî dê helbest tûşî dalengiyanê bibe. Di van mîankên li jêrê, peyva mîftah a erebî bûye mifte a kurdî:

***Nesîmê sunbul û sêvan, seher da hebs û zindanê***

***Vebû qufla me bê <u>mifte</u>, zirringînî li quflê da.***

Her weha, di helbesta navdar a ku bi “Ellah sehergaha ezel”ê dest pê dike da, weha hatiye:

***Nûrek ji nûrê wî vekir, genca zuhûrê pê vekir***

***Kenza xwe qufl û <u>mifte</u> kir, hêj wê di qufl û <u>mifte</u> da.***

Eger bi her awayekî “mifte da” ya dûmahiyê bihêt guhartin dê şaşî bikeve nav serwa anku qafiyeya helbestê. Lewa cihê gumanê nîne ku Melayî “mifte” ya kurdandî li şûna miftaha erebî nivîsiye.

## 2. Saloxetên Rêzimanî yên Taybetî Dîwana Cizîrî

Merema min ya serekî ji vê nivîsarê ev e. Di dîwana Melayê cizîrî da, hindek lêker di dema nebihurî da bi rengekê gellek nemaze anku taybetî hatine bi kar înan. Min ev awayê xebitandina wan lêkeran bi tivavî bervajiyê xebitandina wan lêkeran di devok û bindevokên niha yên kurmancî û soranî û kelhurriyê dîtiye. Ev awayê xebitandinê di zimanê farisiyê nûdem da jî nemaye.

Di Dîwanê da, çend lêker hene mîna kirin, dan û birin-ê ku di dema nebihurî da gellek cida ji awayê nihayê wan lêkeran di zimanên îranî da dihên xebitandin. Jibo mînak, em di kurdiya niha da dibêjin: Ez filan karî dikim. Ez filan tiştî dibim. Ez filan tiştî didim. Lê di Dîwanê da, Cizîrî jibo mînak jibo lêkera kirinê weha dibêje:

***’Erzê kê dê bikirim sûretê hal***

***Ku tu î qibleyê erbabê du’a.***

***Belko dîwar bi guh in, lê bi Xudê kî, bi Xudê***

***Bi tu rengî nekirî eşkire “esrarê hudûs”.***

***Şîrê elmasê kişînit, tu ji lami’ de xeber***

***Vekirit huqqeyê yaqût, ji gewher meke behs.***

***“Kullu yewmîn huwe fî şein” nebî xafil jê***

***Her peyapey ji şiûnan dikirit feyz û meded.***

***Rûz û şeb her seyrê dîdara te tên***

***Nakirin ew seyr û dewranê xelet.***



www.arsivakurdi.org

An jibo birin-ê:

***Şimşadê xeram û serwê xennac***

***Canan dibirit bi ’îşwe tarac.***

An jibo dan-ê:

***Ser bi ’eczê diderit quwwetê derrakeyê ma***

***Rece’e ’lqelbu kelîlen we meta qame qe’ud.***

***Du qedeh mey bi Nîşanî diderit reng bi reng***

***Nêrgiza nazika re’na û gula taze ya geş.***

***Sunbulên ter li gulan pal bi mestî diderin***

***Sûsinên taze ji nesrîn-wereqan bûne helek.***

***Ku îşaret bi bişaret biderit nexmeyê çeng***

***Ji rûyê ayîneyê dil birretin perdeyê jeng.***

Kirin, dan û birin di kurdiya niha da, li dema nebihurî, jibo mînak, bi vî rengî ne:

*Ez dikim, tu dikî, ew dikit, em dikîn, hûn dikin, ew dikin.*

*Ez didim, tu didî, ew didit, em didîn, hûn didin, ew didin.*

*Ez dibim, tu dibî, ew dibit, em dibîn, hûn dibin, ew dibin.*

Lê li cem Cizîrî, li hindek cihan weha ne:



www.arsivakurd.org

*Ez dikirim, tu dikirî, ew dikirit, em dikirîn, hûn dikirin, ew dikirin.*

*Ez diderim, tu diderî, ew diderit, em diderîn, hûn diderin, ew diderin.*

*Ez dibirim, tu dibirî, ew dibirit, em dibirîn, hûn dibirin, ew dibirin.*

Bi rêya seydayê xwe, rêzdar Malmîsanij jî agehdar bûm ku di kirmanckî da jî bi awayekê kêmzêde her bi vî rengî ye ku di Dîwanê da hatiye. Jibo mînak, ev nîvmalika Dîwanê, *Da di eqtarê wucûdê bikirîn seyrê melek,* di bi kirmanckî weha be:

*Ke eqtarê wucûdî de bikirên seyrê melek*

Kirin di kurdiya niha da, li dema bihurî dibe "kir". "min dikir, te dikir, wî/wê dikir, me dikir, we dikir, wan dikir", an "ez (zindanî) dikrim, tu … dikirî, ew … dikir, em dikirin, hûn dikirin, ew dikirin". Lê li dema nebihurî, em dibêjin: "Ez dikim, tu dikî, ew dikin, em/hûn/ew dikin", û "min … dikî/dike/dikin, te … dikim/dike/dikin, wî/wê … dikim/dikî/dike/dikin, me/we/wan … dikim/dikî/dike/dikin".

Anku di dema nebihurî da, em ji kirinê tenê "ki"ê dihêlin, û li dema bihurî "kir"ê. Di soraniyê da, û di farisiyê da jî hosa ye.

Mînaka farisî:

Jibo dema nebihurî:

Men mîkonem, to mîkonî, û mîkoned, ma mîkonîm, şoma mîkonîd, îşan/anan mîkonend.

Jibo dema bihurî:

Men kerdem, to kerdî, û kerd, ma kerdîm, şoma kerdîd, îşan/anan kerdend.

Mînaka Soranî:

Jibo dema nebihurî:

Min dekem, to dekey, ew deka(t), ême dekeyn, êwe deken, ewan deken.

Jibo dema bihurî:

Min kiridm, to kirdit, ew kirdî, ême kirdman, êwe kirdtan, ewan kirdiyan.



www.arsivakurd.org

Tenê jibo lêkerên mîna girtin-ê em li dema nebihurî “gir”ê dihêlin. Jibo mînak em dibêjin: “ez digirim, tu digirî, ew digirit, …”. Dîsa di farisî û soraniyê da jî weha ye:

Bi farisî: “men mîgîrem, to mîgîrî, û mîgîred, ma mîgîrîm, şoma mîgîrîd, îşan/anan mîgîrend”. Di soranî da: “min degrim, to degrî, ew degrê(t), ême degrîn, êwê degrin, ewan degrin”.

Çima Cizîrî li hindek cihan van lêkeran bi vî awayî dixebitîne? Gelo ew formê kevnar an yê arkayîk yê van lêkeran bûye? Gelo dibe ku mirov bifikire helbestên Dîwanê mumkin e ne yên yek demê bin û hindek ji wan kevnartir bin ji hindekan?

Ev pirsyar cihê pûtedaneka zêde ne. Lê du tişt li beranber anku dijberî hizra arkayîkbûnê derdikevin. Yek, qesîdeyeka gellek balkêş di Dîwanê da heye ku bêhna min pê hat û di eynî qesîdeyê da lêkera kirin-ê bi herdu awayan (ku dikarim bibêjim awayê ortodoks û awayê awarte) hatiye xebitandin. Da em lê binihêrrin:

***Qesdê wehdet <u>dikirit</u> rûh bi rûh***

***Wer ne aşiq ji wîsalê çi xerez.***

Du malikan bi dû ra weha dibêje:

***Ne cemala te tecellî <u>bikirit</u>***

***Me ji xûban bi cemalê çi xerez.***

Lê her di malika piştî wê da dibêje:

***Ne ji le’lên te mela behsê <u>bikit</u>***

***Me ji vê behs û sualê çi xerz.***

Wekî diyar, her di yek demê da, helbestvanê vê qesîdeyê kirin bi her du awayan bi kar înaye. Ev nîşana wê ye ku ev diyrde ne bi tena sere xwe ne nîşana wê ye ku helbestên Dîwanê di yek demê da nehatine nivîsîn.

Jibo zanîna wê ka ev awayê xebitandina van lêkeran arkayîk e an ne, dibê me nivîsên kevnartir ji Dîwana Cizîrî jî hebin ku mixabin heta niha nîne. Jiber nebûna belgeyên kevnartir bi kurdî, mirov

dikare li belgeyên farisî jî binihêre. Lê bi qasî ku nivîskarê van rêzikan dizane, di farisî ya nûdem û ya ku dibêjinê Farisî ya Derî da jî mînakên weha yên xebitandina van lêkeran nînin.

Di zimanê pehlevî da, rewş piçekê cida ye. Di pehleviyê da li dema nebihurî, kirin bi du awayan dihêt bikarînan. Kirin ku bi ramana evro ya kirinê di zimanê kurdî da bihêt, riha wê di zimanê pehlevî da jî mîna farisiya niha dibe “kun”. Mînakeka wê ev e:

*Destweran fremûd kû hemgoneg kun*.[Destweran anku mûbedan ferman kir, emir kir, ku herweha bike] (ji kitêba: Gignoux, Ph., 1984, Le Livre d’ Arda Viraz, Paris; ji zardevê kitêba1384 ،يدالله منصورى )

Lê ku kirin bi ramana pê dane kirinê be, bi rengekê dî anku piçekê wekî ya Melayê Cizîrî, dihat bikarînan. Ev awa di farisî ya nû da nîne, herwekî ku di kurdiya me da jî nîne. Mînakeka vî awayî di zimanê pehlevî da ev e:

Gyagrob ej men kerînd, kî wîrazînd mîhen ûd man. [Cêrrûf anku gêsikî ji min çê dikin, ku xan û manê pê dirazînin] (ji kitêba: Dirextî Asûrîk, ji zardevê kitêba: 1384 ،يدالله منصورى)

Anku em dibînin awayekê xebitandina lêkera kirin-ê di zimanê pehlevî da heye ku dişubhe awayê xebitandina wê li cem Cizîrî, lê ya Cizîrî bi çi awayekî wekî wê nîne. Bi gotineka dî, di Dîwanê da, cidatiyeka bi wî rengî di navbera du core anku du ramanên kirin-ê da nahêt dîtin.

Rewşa zimanê Avestayê nêzîkî rewşa zimanê Cizîrî ye. Ev ecêbiyeka mezin e. Di avestayiyê da di dema nebihurî da riha lêkera kirin-ê (li şûna kun- a pehlevî) dibe kiri- û riha kirin-ê bi raman pê dane kirinê dibe kirya- (1384 ،يدالله منصورى).

Di zimanê partî da jî, rewşeka kêm-zêde mîna rewşa zimanê avestayî heye. Di dema nebihurî da riha lêkera kirin-ê kir- e, û dema raman pê danekrinê ji peyvê bixwazin dibe kirî- [Johnny Cheung, 2007].

Lê jibo dan û birin-ê jî tiştekê weha heye? Li goreyê zaîna min, ne di kurdiya nû da, ne jî di farisiya nû, û pehlevî û avestayî da dengê /r/ê di riha nebihurî ya lêkera dan-ê da dernakeve.

Di kurdiya nû da, em dibêjin:

Ez dibem, tu dibî/dibey, ew dibe/dibit/dibê/dibet/dibetin, em dibin/dibîn/dibeyn, hûn/ew dibin/diben.

Di farisiya nû da jî, weha ye:

Men mîdehem, to mîdehî, û mîdehed, ma mîdehîm, şoma mîdehîd, îşan/anan mîdehend.

Dihêt dîtin ku, ne di mîankên kurdiya nû û ne di mînakên farisiya nû da, çi /r/ di van lêkeran da nîne.

Di pehlevî û zimanên dî yên kevnar da jî min dengê /r/ê di riha dan-ê di dema nebihurî da nedîtiye. (da-, deda-, dedatî-, date-, …). Lewma, nahêt zanîn ka /r/ê ya lêkera dan-ê di dema nebihurî da ji kîderê hatiye. Herçend e ku di gellek devokên kurdiyê da, jibo navê bikerî dengekê /r/yê derdikeve nav navan. Jibo mînak, li şûna ku bihêt gotin "filan kes nande ye", dibêjin "filan kes nander e". Dibe ku ev ji qiyas û berhevdaneka –ker a navên mîna karker-ê hatibe. Lê, lêkolîneka zêdetir divê.

Awayê xebitandina lêkera birin-ê piçekê dişubhe kirin-ê. Jiber ku di lêkera birin-ê da jî dengê /r/yê ji xwe heye. Lê, di kurdiya niha da di dema nebihurî da ew deng dernakeve. Lê di farisiyê da jî mîna pehlevî û avestayiyê û zimanên dî yên kevnar ew deng derdikeve (We dît ku di farisiya nû da, mîna kurdiya nû, ew dengê /r/yê dernakeve). Li vê derê jî Melayê Cizîrî awayekê kevintir ji kurdiya niha dixebitîne.

## Encam

Wekî encam, em dikarin ji xwe bipirsin çima weha ye. Bi dîtina min çend şirove hene, lê ku rastiya meseleyê bi tivavî zelal bibe, bi rastî jî xebatên berfirehtir pêdivî ne.

Ku mirov dibîne niha jî di kirmanckî da dengê /r/yê digel lêkerên dema niha ya kirin û danê dihêt, dibe yek ji şiroveyan ew be ku li dema Cizîrî ew saloxet bi awayekê arkayîk û kevnar jî bûbe, hêşta di (hin) devokên kurmanciyê da jî mabû, an jî bi kêmanî Cizîrî xwestiye bi rengekî devoka kurmanckî jî di dîwana xwe da vebihewîne. Ka kî ji van herdu şiroveyan digel rastiyê ye, lêkolînên zêdetir divên.

Yek ji şiroveyên dî dikare ew be ku bibêjîn hindek parên wê dîwana ku niha em bi navê Dîwana Cizîrî diniyasin kevnartir in ji hindek parên dî. Bi derbazbûna demê, jiber awayê libernivîsîna destxetan, û jiber rewşa aloz û şerpize ya kurdan jiber dagîrkarî û şewitandin û komkujî û tevkujiyan gelek parên dîwanên corbicor ji kesên corbicor, ji yên kevntir û nûtir tevlihev bûne û hemî wekî dîwanekê hatine binavkirin. Ji xwe pirraniya xwînda û xwîndewar û zanayên kurdan û pirraniya neteweyên herêmê li destpêkê her mela bûn, lewma ne dûr e ku gelek kesan bi navê "mela"yî helbest helbestibin.

Lê, tiştê ku vê şiroveyê piçekê lewaz dike ew e ku hindek caran (wekî mînaka me ya bertir) di yek helbestê da herdu awayên nû û yên kevnar hatine. Şiroveyeka vê dîsa dikare her ew be ya me got, anku tevlihevî ya gelek dîwanan û şaşiyên libernivîsînê.

Şiroveyeka dî dikare ew be ku ew awayê kevnar yê xebitandina wan lêkeran di dema Cizîrî bi xwe da hêdî-hêdî ber bi nemanê bûye, lewma carina hatine û carina jî ne.

Kî ji van şiroveyan dikare bersiva dawîn be? Nizanim, lê dibe ku ev dergehkutan destpêka lêkolînên berfirehtir di vî warî da be.

## Jêder û Çavkanî:

Jibo lêkolîna Dîwanê, mifa ji gelek nusxeyên çapbûyî û çapnebûyî yên hêşta destnivîs hatiye wergirtin. Lê ez nikarim bibêjim ku çi yek ji dîwanên çapbûyî û neçapbûyî bi awayekê serekî hatine bikarînan.


1. Edwin Lee Johnson, 1917, Historical Grammar of Ancient Persian Language, New York, American Book Company.
2. D. N. MacKenzie, 1971, A Concise Pahlavi Dictionary, London, Oxford University Press.
3. Johnny Cheung, 2007, Etymological Dictionary of Iranian Verbs, Leiden, Brill.
4. ژاله‌ی آموزگار، احمد تفضلی، 1381، زبان پهلوی، ادبیات و دستور آن، تهران، مرکز.
5. یدالله منصوری، 1384، بررسی ریشه‌شناختی فعلهای زبان پهلوی (فارسی میانه‌ی زردشتی)، تهران، فرهنگستان زبان و ادب فارسی.
6. Namenigariyeka elektronî bi Malmîsanij ra.


www.arsivakurdi.org

# Bîkarkersazî[47] le Kurdî Kirmaşanî

**Rizgar Behadur**



Cumłey karkerdar[48] cumłeyg e hem karker[49] ha tî hem karleser[50], bełam cumłey bîkarker[51] cumłeyg e karker neyrî û karleser cî karker girdîe. Ye manay ewe s karleser cumłe bayed le cî temamker[52] kar[53] hełsî û biçû binîşî e cî řûşinker[54] desey biçem[55].

Le zwan Kurdî, kar karkerdar we şîwey řîk û pîk gürřyey e kar bîkarker û bîcge tûzî cyaî le deň şîwey karegan cûr yek in.

Îse wegerd yey nimûne nîşan deym çün qûanx we qûnax cumłey karkerdar gürřyey e cumłey bîkarker.

1. Lafaw małege řiman. (cumłey karkerdar)
2. Małege řimya. (cumłey bîkarker)

[47] passivization
[48] active
[49] subject
[50] object
[51] passive
[52] complement
[53] verb
[54] specifier
[55] Inflectional phrase




www.arsivakurdi.org

Le îre karleser nexş tita[56]-y bigir[57] peyda key. Le ser bineway Tiurî Yeksanî Bexşîn Tita[58], le her du şîwey karkerdar û bîkarker, karleser cumłe bayed girî bixuey[59] e ser desey kar[60]. Bîkarkersazî le Kurdî Kirmaşanî şîwey çemyanî[61] dîrî. Yanî tenya beş biçem[62] kar we şîwey bîkarker güřyey. Bîkarkersazî kar wegerd hatin nîşaney bîkarkersaz[63] eřa beyn kar û cînaweyl likya tyey e dî. Nîşaney bîkarkerî eřa zeman ewsa ***ya*** s. Eřa ewey cumłey karkerdar bû e cumłey bîkarker, le düay la çîn karker û hatin e naw nîşaney bîkarkersaz, çen qûnax we pî çû ta werewere karleser xuey biřesinî e cî karker.


Her ew cûre ki bas kirya, eřa bîkarker kirdin nîşaney bîkarkersazîg we cumłe izafe kiryey. Î nîşane du taybetmendî dîrî, yey taybetmendî bîkarkerkerî ki tefsîr kiryey û yey taybetmendîegey çemyaî ki tefsîr nîekiryey. Nîşaney bîkarkersaz karî hełwijardin yey kar bîkarleser e ta biker[64] le naw biwey.

Werce herçiştîg kar bayed weger karleser girî bixuey ta desey kar **VP** duris bû:





Witîm bîkarkersazî şîwey çemyanî dîrî, we î xatire kar îş bayed muxtac î nîşaney çemyanîe bû ki le wîney ban beşîg e le taybetmendîeyl tefsîr nekiryay kar. We î xatire, le qûnax düatir nîşaney bîkarkersaz **Pass** wegerd desey kar girî diryey ta taybetmendî [uInfl:] le **V** çik[65] bikey.

[56] theta
[57] patient
[58] Uniform Theta-Assignment Hypothesis
[59] merge
[60] Verb phrase
[61] inflectional
[62] inflectional element
[63] passivizer
[64] agent
[65] check





Îse gey ew e ta nîşaneyl çemynaî zeman û mutabiqe[66] wegerd î saxtimane girî bixuen. Le îre **I** wegerd **PassP** girî diryey, î kare bû we bayis ewey şîwey [case] **małege** çik bû ki karkerî e [nom].





Inca [ø:3sg] **małege** taybetmendî [*u* ø:] le **I** muntebiq key[67], erziş dey[68] e pî û çikî key.


[66] agreement
[67] match
[68] value





[past] îş le I taybetmendî [uInfl:] naw **Pass** muntebiq key û erziş dey e pî.




**Pass** çû e **I** ta [uInfl:past] le **Pass** çik bikey. Wegerd î kare nîşaney çemyaî bîkarkersaz çû e şandes nîşaneyl çemyaî tir cûr zeman û mutabiqe:




Le axirîn qûnax îş **małege** çû e cî řûşinker **IP** ta binîşî e cî karker û [uN] yanî Bineway Yeyca Xisin e Deyşt[69] le **I** çik bikey û bîkarkersazî tekmîl bû:




[69] Extended Projection Principle (EPP)

www.arsivakurd.org

## Repertûara zimanî û afirandina edebî

# Nirxandineke zimannasî li ser edebiyata kurmancî ya hevçerx[70]

**Ergin Öpengin**



Ergin Öpengin

### 1. Destpêk

Nivîserê kurd[71] yê li Kurdistana bakur û li Tirkiyeyê xwedanê repertûareke[72] pirzarî û pirzimanî ye ku ew repertûar ji ber şertên dîrokî-civakî-siyasî di guherîneke daîmî û bilez de ye. Nivîserekî[73] kurd ê asayî bi devoka gund û herêma xwe dizane û pê emel dike, bi kurmanciya nivîskî/standard dizane û pê emel dike û herwiha bi tirkî jî dizane û pê emel dike. Lê şiyan û zanyariyên wan ên bi van du zimanan di nav têkiliyeke asîmetrîk û nayeksan de şikl digirin, lewre kurdî, wek zimanê bindest, di çarçoveyeke tengtir de tê bikaranîn û, nisbet bi tirkî, îmkanên ji bo pêşxistina wî gelek kêmtir in. Pirsa me li vir ew e ka repertûareke wiha têkel, aloz û laseng çawa tesîrê li afirandina edebî ya bi kurdî dike. Bi gotineke din, em dê bi perspektîfa zimannasiyê lê binêrin ka wate, binyad û avaniyên zimanî yên di repertûara zimanî ya nivîserê kurd de bi çi awayan li qalibê deqeke edebî werdigerin.

Me ji bo pêdaçûnê romana *Otobês* ya Yunus Eroğlu hilbijart, ku berhemek e ji edebiyata kurmancî ya hevçerx. Carinan ji *Pêşbaziya Çîrokên Neqediyayî* ya Şener Özmen û ji çend deq û berhemên din jî nimûne hatine wergirtin. Her du berhem jî di nav deh salên dawî de hatine nivîsîn û repertûara zimanî ya nivîseran, ji bilî zar û devokên kurdî, bi kêmî ji kurdî, tirkî û îngilîzî şikl girtiye û nivîser di heman demê de karê wergêranê jî dikin.

---

[70] Ev gotar berê, bi heman serenavî, di vê kitêbê de hatiye weşandin: Remezan Alan û Ergin Öpengin (amd.) 2014. *Tîr û armanc: Gotarên rexneyî li ser edebiyata kurdî ya modern* (rr. 173-208) Stenbol: Peywend.

[71] Li seranserê gotarê, heke wekî din nehatibe diyarkirin, têrmên "kurdî" û "nivîserê/a kurd" bi mebesta *kurmancî* û *nivîserê/a kurmanciyê* hatine.

[72] "Repertûara zimanî" têgeheke psîkolenguîstîk e û mirov dikare wek "qewareya hemû zanyarî û şiyanên zimanî yên axêverekê" têbigihe (bnr. para 2yan).

[73] Zayenda navên giştî (bn. "kes") û pîşeyî (bn. "nivîser") bi rengekî têkel carinan wek *mê* û carinan *nêr* hatiye nîşandan. Anku, li şûna nivîsandina *nivîserê kurd* an *nivîserê/a* kurd, em carinan *nivîserê kurd* û carinan *nivîsera kurd* dinivîsin. Bi vî rengî, hem nayeksaniya cinsî di ziman de kêmtir dibe, hem aliyê dîtinî yê nivîsê bi işareta teqsîmê (/) giran nabe. Ev rêkar herwiha pêşniyazek e ji bo kurmanciya nivîskî û devkî. Rêkareke din ew e ku ev nav bi halê xwe yê pirjimar bêne bikaranîn (wek *nivîserên kurd*), lê, ev rêkar, ji ber endîşeyên şêwazî û wateyî, di hemû haletan de cîbicî nabe.



www.arsivakurd.org

Em dê di para 2yan de çend têgehên girîng ên meydana vekolînê rave bikin û pirsên vekolînê têxin nav çarçoveyeke teorîk. Paşê, di para 3yan de, em dê behsa “rêziman”a di mêjiyê axêver de bikin û bi têgihiştineke alternatîf a ji “rêziman”ê çarçoveyeke bêtir zimannasî pêşniyar bikin ji bo nirxandinên zimanî. Di para 4an de em dê li jêr çar babetan tehlîlên xwe yên li ser têkiliya repertûara zimanî û nivîsîna edebî di nimûneya *Otobês*ê û nivîsevaniya kurdî de pêşkêş bikin û di para 5an de bi lêkdana çend encamên ji nîqaşan bidestketî dawî li behsa xwe bînin.

## 2. Paşxaneya teorîk û têgeh[74]

Ev xebat perspektîfeke zimannasî tîne nav rexneya edebî. Ziman û berhemhênana bi rêya ziman keresteyê bingehî yê tehlîlên zimannasî û nirxandinên edebî ye; lê belê, wek dîsîplîn, zimannasî û edebiyat du meydanên ji hev cuda ne. Tevî vê, wek xebatên serkeftî (bn. Scotton-Myers 1998) nîşan didin, piştî ku musteqiliya her du dîsîplînên zimannasî û rexneya edebî hate pejirandin, yek dikare bi amraz û têgehên zimannasiyê deqên edebî ji gelek aliyan ve tehlîl bike; bo nimûne, taybetiyên cudaker ên zimanê berhemekê destnîşan bike, diyardeyên pirzariyê *(heteroglossia)* salox bide,[75] an jî, weku em dê di vê xebatê de bikin, bikeve dû pirsa nivîsevaniya duzimanî û netîceyên temasa zimanên repertûara nivîseran tehlîl bike.

Li ser vê paşxaneya danûstandina zimannasî û rexneya edebî, em dê xwe bispêrine têgehên meydana “kontakta zimanî” an jî temasa zimanan (*language contact*). Fikra berbelav di vê meydana vekolînê de ew e ku di temasa zimanan de du an jî zêdetir sîstemên zimanî li hev diqelibin, anku yek bi rêya wergirtina form an jî avaniyên zimanê serdest, bêtir mîna wî zimanî lê tê. Ev yek bi giştî bi du rengan dibe: “qerzkirin” (an jî deynkirin, *borrowing*) û “levqelibîn” (*convergence*).

Di qerzkirinê de peyvek an her çi form û qalibeke zimanekî din tê xebitandin, lê ev yek sîstema zimanê wergir têk nade. Bo nimûne, di vê hevokê de, *Xezalê çay rête ser* ***silgi****yê xwe*, peyva tarîkirî ji tirkî ketiye nav axiftinê, lê sîstema serdest her kurdî ye; anku hevok bi pêy prensîbên sentaks (rêz), morfolojî (zayend) û fonolojiya (kîteya şidandî) kurdiyê hatiye dariştin. Gelek caran peyvên naverokî bi vî rengî têne veguhastin. Ji vê birrê re herwiha “qerzkirina keresteyî” (*material borrowing)* jî dibêjin (bnr. Öpengin 2008 bo xebateke li ser vê babetê). Di levqelibînê de, zimanek, piştî temaseke dûdirêj a bi zimanekî serdest re, hindek an jî gelek hêmanên peyvdan û gramera xwe ji dest dide û form û qalibên zimanê serdest lê bi cî dibin. Anku, çi bi peyv çi bi avaniyên xwe, zimanên di temasê de reng û dirûvê hev digirin, bêtir jî zimanê bindest reng û dirûvê zimanê serdest digire. Pareke mezin a levqelibînê di *dexaleta rêzimanî* de xwe nîşan dide, anku xebitandina prensîbên rêzimana zimanê din. Anku, ziman ne tenê form û qaliban yekser ji zimanekî din werdigire, belku mentiqa xebitîna rêzimana wî zimanê din jî werdigire û li ser formên xwe piyade dike. Ji vê birrê re herwiha “qerzkirina mastereyê/modêlê” (*pattern borrowing*) jî dibêjin.

Bi pênaseya Myers-Scotton (2003: 85), di encama pêvajoya levqelibînê de, hemû morfemên diyar yên zimanê wergir/bindest in, lê belê, biyada/strûktûra wî di dariştina peyvan de û di xebitandina rêzimanê de bêtir ji zimanê jêder/serdest e. Bi ya wê, her dîsa pêvajo û mekanîzma levqelibînê dibe sebebê xuyabûna diyardeyên wek lawazketina şiyanên zimanî, zimanguherî (*language shift*) û pêkhatina zimanên têkel (bnr. Öpengin 2011: 40–47). Tesîra zimanên xizm li ser hev hêsantir e, lê ne ya zimanên dûrî hev. Lewma tesîra tirkî li ser kurdî, ku ne xizmên hev in, gelek caran dê bibe sebebê guherînên binyadî di rêzimana kurdî de. Herwiha, zimanê ku

---

[74] Hindek têbînî li ser nîşane û têrmên kurtkirî: Têgehên nû û xerîb carinan bi têrmeke kurdî hatine derbirrîn û îngilîziya wan di nav kevanekan de îtalîk/xar li rex hatiye nivîsîn. Raveyên bi kurdî di nav kevanekên goşeyî de hatine nivîsîn. Di beşên munaqeşeyên zimannasî de, stêrkeke (*) li ber hevokê tê wê wateyê ku ew hevok yeka rêzimanî nîne, an jî li dû qaîdeyên rêzimanî hevokeke qebûlbar nîne ji bo axêveran. Herwiha, işareta tîr (→) li ber hevokê alternatîfeke ji aliyê rêzimanê ve duristtir nîşan dide. Kurteyên di vê gotarê de ev in: *bn.*: bo nimûne, *bnr.*: binêre vê jêderê an parê, bb.: bide ber vê berhemê, *tr.*: bi tirkî, *îng.*: bi îngilîzî; *r.*: rûpel. Herwiha, heke di nimûneyan de (di para 4an de) li ber kurteya *r.* navê berhemeke din nebe, nimûne ji *Otobês*ê hatiye wergirtin; nimûneyên ji *Pêşbaziya Çîrokên Neqediyayî* bi kurteya PÇN hatine nîşandan.

[75] Bnr. Xakî (2014) ji bo nirxandineke li ser babetên wek pirzarî û temsîla şiûra zimanî ya karaktêran di romana *Otobês* ya Yunus Eroğlu de.

form û qalib û mastereyan ji zimanê din hildigire û dişibe zimanê din gelek caran zimanê bindest an jî duyemî ye. Anku hiyerarşiya navbera zimanê wergir û zimanê jêder vedigere ser paye û prestîja sosyo-ekonomîk a cemaetên zimanên di temasê de.

Li dû teoriyeke taze ya Matras (2007: 51), ku bêtir hevaheng e ligel têgihiştinên post-modern ên ziman û zimannasiyê, di mêjiyê axêvera duzimanî an pirzimanî de "sîstem"ên zimanî yên musteqil nînin. Ziman, ji bo axêvera duzimanî, par û "pêkhate"yên repertûareke giştî ya form, avaniyên zimanî, tecrube û behreyan e ku axêver ji bo danûstandinê jê îstifade dike. Hemû form û amrazên zimanî yên di serê axêverê de bi hev re repertûara zimanî ya axêverê pêk tînin, û tiştê ku em dibêjinê "ziman" parek an pêkhateyek e ji wê repertûara berfireh. Çawa ku axêvera yekzimanî şêweyên cuda yên zimanê xwe fêr dibe û wan di dever û helkeftên cuda de bi kar tîne, axêvera duzimanî jî bi rêya tecrube û sosyalîzasyonê fêrî qaîdeyên hilbijartina hêmanên pêkhateyên (ziman) repertûara xwe dibe; anku fêr dibe ka kîjan pêkhateya repertûara wê di kîjan helkeftan de û beramber kîjan guhdaran qebûlbar û munasib e. Bi vî rengî, her zimanek an jî pêkhateyeke repertûarê dibe xwediyê peywendên/kontekstên cuda û cure-danûstandinên cuda; û axêvereke duzimanî, li gor pêdiviyên hevokê form û avaniyan ji repertûara xwe hildibijêre û bi awayê peyvî, nivîskî an jî îşarkî derdibirre. "Ziman" beramber bikaranîna sîstematîzekirî ya peyv û avaniyên repertûarê ye. Lê belê, cudakirina peyv û avaniyên zimanên repertûarê li gor şert û pêdiviyên peywendê her gav pêk nayê; axêvera duzimanî di axiftina bi an xebitandina zimanekî de, bi rengên cuda û cihêreng, ji peyv û avaniyên pêkhateyeke din (anku zimanekî din) a repertûara xwe îstifade dike. Tiştê jê re dibêjin "tesîra zimanekî li ser zimanekî din" hingê diqewime gava hidûdên di navbera van pêkhateyên repertûarê de têne pêpeskirin. Axêverek çend qabil û behredar be di her du (an zêdetir) pêkhateyên (zar, ziman) repertûara xwe ya duzimanî de, ew "tesîr" dê ewqas kêm be.[76]

Heke em guh bidin Matras (2007) û qebûl bikin ku di mêjiyê axêveran de, û wiha jî li bal nivîserên kurd, sîstemên zimanî yên musteqil nînin, belku bi tenê repertûarek heye ku hemû wate û avaniyên derbirrînê tê de depokirî ne û cudakariya wan bi tenê li gor peywendê û di nav peywendê de pêk tê, hingê pirsa têkiliya peywend û bikaranîna zimanî xwe dide pêş. Bi gotineke din, nivîsera kurd, ku sosyalîzasyona wê ya bi kurdî ji ber egerên sosyo-polîtîk bi tenê di çend qadên civakî yên wek navmal, gund û taxê de bi duristî bi rê ve diçe, çawa û bi kîjan stratejiyan wan peywend û qadên civakî yên dûrî sosyalîzasyona xwe ya bi kurdî xwemalî dike û wan dadigerîne sehneya dariştina çîroka xwe? Heta çi dereceyê û di kîjan haletan de serî li rêya "wergerandin"ê dide ji bo lêanîna zimanê vegotinê/qisetê li wan peywendên taze? Berî ku em bi van pirsan dest bavêjine tehlîla zimannasî li ser edebiyata kurdî, em dê di para 3 de bi kurtî behsa "rêziman"ê û kêşeya "rastî" û "xeletî"ya di rexneya zimanî de bikin ji bo ronkirina prensîbên tehlîl û tefsîrên xwe.

## 3. Rêziman û pirsa "xeletî"yê di rexneya zimanî de

Rêziman gelek caran wek tevahiya qaîdeyên zimanekî nivîskî an zimanekî standard tê famkirin. Lehce an zarên herêmî mehrûm ji rêzimanê têne hesibandin. Zimanê standard bi rêya platformên wek televîzyon, fêrkarî û weşanan payeya xwe ya raser dide pejirandin û bi vî rengî teweccuha xwendewar û nexwendewarên zimanî bi xwe ve digire. Helbukê, zimanê standard an nivîskî, bo nimûne kurmanciya nivîskî, hemin şêweyeke zimanî ye ku norm jê re hatine tayînkirin; anku bikaranîna wê ya nivîskî û devkî bi normên rêzimanî hatiye sabîtkirin da ku ji bo danûstandinên wêdeyî-deverî jî bê bikaranîn. Nivîser û bikarhênerên zimanî, bi hewla ku "li gor rêzimanê" biaxivin an jî binivîsin, xwe ji zarên herêmî dûr dixin û carinan digihine qenaetên wek "tu bi herêmkî dipeyivî, rastiya wê peyvê ... ye" an "ergatîfa wî şaş e", hd. Li vir, gelek caran, qistas an pîvana ji "rastî" û "xeletî"yê, hevahengiya bi normên rêzimana kurmanciya standard e. Heman qenaet di rexneya zimanê berhemên edebî de jî feal in, ku gelek caran pîvana nirxandinê bi tenê zewq û tercîhên şexsî yên rexnegiran e.

[76] Carinan axêverek dikare bi armancên wek xwe-cuda-kirinê an jî bi merema îstifadekirina ji prestîja zar an zimanekî xwe, hindek formên zimanekî din tevî axiftina xwe bike, anku bi zanyarî wan hidûdên pêkhateyên repertûara xwe ya zimanî pêpes bike. Ev yek derveyî munaqeşeya li vir e.

Bo nimûne, di rexneya xwe ya li ser romana *Saturn* a Remezan Alan de, rexnegir Sadedîn Çira (2012), di hukmên xwe yên li ser zimanê romanê de xwe dispêre zewq û têgihiştina xwe ya zimanî, lewma fikrên xwe yên giştî, bi hevokên wek "zimanê romanê bi giştî xweş e", "hevok û gotinên ku me *aciz kirine* û yên bi me *xweş hatine*" derdibirre.[77] Rexnegir herwiha çend biwêjan destnîşan dike ku bi ya wî ji tirkî hatine wergerandin. Biwêj û qalibên derbirrînê yên çandî di nava zimanên cîran de gelek caran dişibin hev, ji ber ku mekanîzma ku şikl dide derbirrînê di bingehê xwe de cîhanbîniya çandî ye û ew cîhanbînî bi pêvajoyên civakî û çandî dikevine qalibên nêzî hev (bnr. Aikhenvald û Dixon 2007: 5). Lewma nêzikatiya hindek biwêjan di encama temasa zimanî û çandî de heta dereceyekê çaverêkirî ye; ya zehmettir û "xirab"tir, şibîna binyadê rêzimanî (*grammatical structure*) ye.

"Normparêzî" û "standardhezî"yeke bêqeyd û berteng dê ji îmkanên ziman kêm bikin û bêguman zererê bigihînine geşedana zimanî, ji ber ku di heman demê de, bi têgeha Bakhtine (1981), helwêstên wisa, alîgirên "yekmentiqî"yê (*monologic*) ne û zimanî wek sîstemekê dibînin ku bi normên xwe yên kêm-zêde mutleq hukmî li gotinê dike. Têgihiştin û şîroveya têgeha "rêziman" û "xeletî"ya rêzimanî, weku li jorê dixuye, biarîşe ye. Pênaseyeke bêtir zimannasî ya rêzimanê dê wê wek "tevahiya qaîdeyên zimanî ku axêver di şert û mercên xwezayî yên sosyalîzasyonê de fêrî dibe" binirxîne. Ji vê behsê derdikeve ku gelek caran munaqeşeyên "rastî" û "xeletî"ya zimanî xwe dispêrin "rêzimana kurmanciya standard", ne ku têgihiştineke berfirehtir a "rêziman"ê. Bi ya me, nirxandinên "xeletî"ya formên rêzimanî bi tenê hingê bicî û durist in gava ku formek, an jî her çi bikaranînek, di rêzimana ti zarekî –herêmî an civakî– kurmancî de durist nebe. Anku, rêzimana xwezayî ya ti zarekî kurdiyê wê avanî û bikaranînê hilnegire, hingê mirov dikare behsa "xeletî"ya wê bike. Lewma "xelet" bi tenê ew form û bikaranîn in ku ji qalibê zarên kurdî nayên û herwiha ji şiklê xebitîna wan û îmkanên wan ên potansiyel dûr in. Gava em di deqê de sifeta "xelet" an "şaş" hiltînin qesta me ev rave ye.

Ligel van tesbîtan, divê herwiha diyar bikin ku her gotina ji zarê mirov derdiçe kelameke taze û serbixwe ye, dubareya kelamekê nîne ku di mêjiyê me de an di peyvdana me de hatibe qeydkirin. Bi heman rengî, derbirrîna ser kaxezê jî kiryareke afirîner e û, bêguman, ji bo her fikr û wateyê, rêziman û peyvdan di mêjiyê mirovî de xwe jinûve rêk dixin û bi şiklê bêjeyên taze û xweser dibin derbirrînên nivîskî. Lê heye ku di vê merheleyê de mêjiyê mirovî yê zimanî, ji par û pêkhateyên din ên repertûara xwe ya zimanî jî îstifade bike. Xala hesas li vir ew e, heke ew îstifadekirin li dû şiklê xebitîna yek ji zarên kurmanciyê an jî normên xweser ên kurmanciya standard bin, hingê tesîra zimanên din ên repertûarê dê dewlemendker be; lê heke tesîra aloziya repertûarê bibe sebeb ku hevok û gotar/rabêj bi rengekî dûrî normên bingehî yên rêzimana zarekî kurmanciyê û normên xweser ên kurmanciya standard bêne darijtin, hingê heye ku tesîra zimanên din ên repertûarê û aloziya giştî ya repertûarê zerermend bin, lewre işaretê bi zalbûna sîstema wî zimanê din yê serdest dikin. Erkê tehlîla zimannasî li vir, jihevkirina van her du cîhetan e; lê belê, armanc bi ti awayî peydakirina arîşeyên zimanê berheman nîne, belku tehlîlkirina merheleyên paşxaneya nivîsîna bi kurmancî ye ji bo paktir famkirina pêvajoya afirandina edebî li bal nivîserên kurmancî-ziman ve.

## 4. Tehlîla zimanî ya romana *Otobês*ê

Li dû pênaseyên *levqelibîn* û *qerzkirina mastereyê/modêlê*, ku me di paşxaneya teorîk de rave kirin, em dê di bin çend serenavan de li hindek tezahurên levqelibîn, an jî dexalet û tesîra rêzimana tirkî li ser rêziman û avakirina qisetê di romana *Otobês*ê de binihêrin.[78]

---

[77] Îtalîk yên min in.

[78] Têrm û têgehên rêzimanî yên di vê meqaleyê de hindek bi kurdî ne û di meydana kurdî de berbelav in, hindek ji îngilîziya wan hatine adaptekirin û hindek ji kurdiya soranî (kurdiya navendî) hatine wergirtin. Pênase û muadilên bi tirkî û bi îngilîzî yên hindek ji têrm û têgehan wiha ne: *hevoka bestî*: *tr.* yan cümle – *îng.* subordinate/dependent clause; *fraz* an *destewaje*: *tr.* söz öbeği – *îng.* phrase [hêmaneke hevokê ya ji yekê zêdetir peyvan pêkhatî]. Di vê hevokê de, "Min bihîst *ku ew **bi kesine nenas re** diçe masîgirtinê*", tevahiya derbirrînê ya di nava neynûkan de *hevok* e, para îtalîk *hevoka bestî* ye, para tarîkirî *fraz* e, "frazeke daçekî" ye û *kesine nenas* "frazeke navdêrî" ye. Herwiha hin têrmên din wiha ne: *kirde*: *tr.* özne – *îng.* subject; *berkar*: *tr.* nesne – *îng.* object; *lêker*: *tr.* fiil *û* yüklem – *îng.* verb *û* predicate; *berkarê neyekser* an *berkarê daçekê*: *tr.* dolaylı nesne û edat nesnesi – *îng.* indirect object *û* prepositional object; *serf* û *serf kirin*: kişandin an kêşana lêkerê, *tr.* fiil çekimi – *îng.* verbal inflection; *binyad* û *heykel*: *tr.* yapı – *îng.* structure; *avanî*: *tr.* yapı



www.arsivakurd.org

### 4.1 Bikaranîna cînavkan û cînavka vegerok

Hevoka pêwendiyê (*relative clause, ilgi tümceciği*) ew hevok e ku navekî diwesfîne, anku wesfa wî navî dide yê ku li pêş hevokê tê. Bo nimûne, di vê hevokê de, *mirovê **ku min li bazarê dît***, para tarîkirî hevoka pêwendiyê ye û wesfê navê "mirov" dide. Zimanên wek kurmanciyê, ku kurmancî ji bo vî karî amrazê pêwendiyê *ku* [û paşgir û pirtikên ezafeyê *-ya*, *-yê* û *-yên*] dixebitîne, bi piranî nahêlin ku navê ku tê wesfkirin, bi awayê cînavk dîsa di nava hevoka pêwendiyê de xuya bibe. Lewma, bi kurmancî, hevokeke wek ***mirov**ê ku min **ew** li bazarê dît*, hevokeke ne durist e, ji ber ku "ew" lê zêde ye.

Di hevok (1) de, hevoka pêwendiyê [di nav kevanekên goşeyî de] wesfê cînavka "yên" dide; lê di nav hevoka pêwendiyê de cînavka "ew" wek hevreferansa "yên", anku kesê sêyem ê pirjimar, hatiye. Lewma hevok yeke xelet e. Heman kêşeya cînavka zêde di hevoka pêwendiyê ya hevok (2) de jî li kar e, lewre li vir jî "ew"a di hevoka pêwendiyê de cînavka wî navî ye yê ku tê wesfkirin ("çavên min"). Derxistina cînavkên zêde (tarîkirî û îtalîk) ji hevokên pêwendiyê bes e ji bo serastkirina van herdu hevokan.

(1) **Yên** [ku min berê qet ***ew*** nedîtibûn jî] mîna ku em bi hev re derketibin ... zûka ez nas kirim ... (r. 55)

(2) ... jixwe **çavên min** ên [ku we ***ew*** nedîtin] wê nîgaşeke min a ji ya cinekê çêtir raneke di aşopa we de. (r. 188)

Cînavka vegerok *xwe* di kurmancî de, û li dû prensîbeke gerdûnî ya zimanan,[79] di wê rewşê de tê bikaranîn gava di hevokê de berî wê hêmaneke bi heman referansa kesî hebe. Anku yek dikare bibêje *ew pozê xwe di awêneyê de dibîne* ji ber ku di hevokê de berî "xwe"yê "ew" heye û referansa her duyan kesê sêyem ê yekjimar e, anku hevreferans in. Berevajî bikaranîna cînavka vegerok, cînavkên serbixwe, wek *ez, tu, ew,* di hevokê de hingê tên gava referansa wan di nav heman hevokê de nebe; anku kesê ku ev cînavk cihê wan digirin divê ne di nav heman hevokê de belku di hevokeke pêştir de hatibin. Ji ber vê hindê ye ku yek nikare bêje *(ez) min dibînim* an jî *(ez) pozê min digirim*. Lê belê, di hevokên (3)-(5) de, bi rengekî ku berevajî van qaîdeyan be, cînavka serbixwe ligel formeke din a hevreferans di nav heman hevokê de hatiye bikaranîn.

(3) ***[ez]*** Pêjna xwêdaneke hûrik dikim di binê çermê pozê **min** *[→ xwe]* ê ku bistika berçavkê li ser e û dixurîne de. (r. 185)

(4) ***[ez]*** Bi şev a li wê derêkê, mîna yekî bi cinan ketî, di nava nivînên mala hevalê **min** *[→ xwe]*de bi tirsan, bi gumanan diketim, ... (r. 159)

(5) Vegerê **ez** ê surprîzekê lê bikim li mala **min** *[→ xwe]*. (r. 188)

Ji bo ku ev hevok li qaîdeyên rêzimanê bên divê cînavkên serbixwe, ku di her sê hevokan de jî "min" e, dagerine cînavka vegerok, wek di nav kevanekan de hatî nîşandan. Bi ihtimaleke mezin ev bikaranîna xelet a cînavkan, bi taybetî cînavka vegerok, ji tesîra tirkî ye, ji ber ku cînavka vegerok a tirkî herwiha paşgira kesane

– *îng.* construction; *bêje*: her çi tiştê hatî gotin/derbirrîn, *tr.* sözce – *îng.* utterance; *zimanê jêder*: zimanê ku peyv an formekê dide, çavkaniya wê peyv an formê ye; zimanê wergir: zimanê ku peyv an formekê werdigire ji zimanekî din.

[79] Teoriya *Government and Binding* a zimannasiya hilberîner –*Generative Grammar*– bi sê prensîbên gerdûnî babeta hevreferansê ron dike. Bnr. Chomsky (1988) ji bo pêşkêşkirineke hêsan a vê çarçoveya formel a zimannasiyê. Bnr. Öpengin (2006) ji bo tetbîqeke seretayî ya teoriya navhatî li ser daneyên kurmanciyê.

jî hildigire (bn. *kendi**mi** görüyorum*), di demekê de ku kurdî (wekî zimanê çînî û gelekên din) agahiya kesî li ser cînavka vegerok nîşan nade (bi tenê “xwe” ye). Îcar, heke mentiqa rêzimana tirkî di lehzeya derbirrîna van hevokan de zal û feal be, hingê heye ku ne cînavka vegerok a kurmancî (“xwe”) lê cînavka serbixwe bê bikaranîn, lewre ew mîna cînavka vegerok a tirkî agahiya kesî derdibirre.

## 4.2 Hukmê paşdaçekan

Di kurmanciyê de çend cure daçek hene. Pêşdaçek hene wek *li, ji, bi, di* û paşdaçek hene wek *de/da, re/ra ve/va*; û axirî bazinedaçek hene ku ji pêşdaçek û paşdaçekekê pêk tên wek *di ... da, ji ... re* û *bi ... re, di ... re, ji ... ve*.[80] Wek qaîdeyeke gerdûnî ya zimanan, berkarên/bireserên daçekan elementên “navdêrî” (*nominal*) ne, ku nav, cînavk, lêkerên mesder (bn. ***hatin**a te*) û çêbiwar/partîsîp (bn. *kirasê **şûştî***) û ‘hevokên navdêrîkirî’ dikevine nav vê kategoriyê; lê belê, lêkerên serfkirî/kêşayî, anku hevokên asayî nakevinê. Lewma bi kurdî mirov bi rehetî dibêje *li malê, ji xwarinê re, di nav darên birîyî de*, ji ber ku berkarên daçekan giş nav in an jî elementên navdêrî ne. Lê belê, yek bi heman rihetiyê nikare bêje, ***bi** mirovê ku bêbextiyê li şirîkê xwe dike **re** nikarî bixebitî*, ji ber ku di navbera herdu pişkên bazinedaçekê (“bi” û “re”) de lêkereke serfkirî, an jî hevokeke asayî, heye. Bi gotineke din, paşdaçeka “re” ji derveyî “hukmê” xwe hatiye xebitandin û li dawiya hevokê hilawistî/daliqî maye. Ji bo ku kêşe zelal bibe, em hevokên (6) û (7) bidin ber hev –ku parên van hevokan yên ji bo behsa me girîng di nav kevanekan de ne.

(6) ... ez mecbûr mam ji ajovên tika bikim [***di** kolana li pişt sûka kevnikfiroşan **re***] bajo. (r. 180)

(7) Belam ew jî nizanin parêzereke wan a ku wê qasekê bi şûn de [***bi** evîndarê xwe yê ji rêzê yê ku li fûarên gerok şekalên jinan difiroşe **re***] li devereke ji deverên ku wan û yên mîna wan berî pey hev didan hev bibîne. (rr. 182–183)

Bikaranîna daçekan di hevok (6) de durist e, lewre berkarê bazinedaçekê, herçend dirêj jî be, frazeke navdêrî ye; an jî lêkereke serfkirî nîne di navbera pêşdaçeka “di” û paşdaçeka “re” de. Bi vî rengî, hukmê daçekê li ser berkarê xwe heye. Lê belê, di hevok (7) de, di navbera herdu pişkên bazinedaçekê de lêkereke serfkirî [anku hevokeke asayî “yê ku li fûarên gerok şekalên jinan difiroşe”] heye.

Ev bikaranîna di hevok (7) de hem derveyî qaîdeyên rêzimana kurdî û zimanên cîhanê ye, hem jî ji ber ne-kurdîbûna xwe dibe sebebê girêkên têgihiştin û rewaniya vegotinê. Girêka têgihiştinê ji ber wê yekê ye ku gava xwîner an jî bihîzera vê hevokê digihe peyva “difiroşe”ya li dawiya hevoka serfkirî, di mêjiyê wê de hevokeke tekmîl bi cî bûye (*yê ku li fûaran şekalan difiroşe*) û hewleke zêdeyî û ne-ekonomîk pê divê heta ku paşdaçeka “re”yê bi pêşdaçeka “bi” ve girêbide û pêwendiya pêşdaçek-paşdaçekê ava bike. Em bawer nakin ku formûlasyoneke evqas giran, û ji layê psîkolenguîstîk ve ne-ekonomîk, di ti devereke kurmancî-ziman an kurdî-ziman de pareke rêzimana xwezayî be. Heta niha me di ti deqên ji kurmanciya devkî de (Nikitine 1926; Ritter 1970; MacKenzie 1962, 1995) bikaranîneke wisa nedîtiye, anku di deqên di ti yek ji van xebatan de, ku hecmekî mezin ê metnên axiftina xwezayî û metnên edebiyata devkî bi xwe ve digirin, me nedîtiye ku hevokeke tekmîl serfkirî bikeve nava du daçekan û bibe berkarê bazinedaçekê.

Mirov nikare yeqîn teşxîsê bi wê pêvajoya hişî bidin ku nivîserî dibe formûlasyonên dûrî qaîdeyên rêzimana xweser a hemû zarên kurmanciyê, kurdiyê û zimanên din. Bo nimûne, dibe ku sebeb berbelaviya bikaranînên wiha be di nivîsevaniya kurmancî ya hevçerx de, lewre heman xeletiya rêzimanî di zimanê edebî û rojnamegeriyê de gelek berbelav e. Çend nimûneyên ji berhemên edebî û rojnamegeriyê, di hevokên li jêr (8) û (9) de, berbelaviya vê bikaranîna daçekan nîşan didin. Di her hevokê de, ji bo hêsankirina têgihiştinê, pişkên

[80] Komeke din a daçekan hene wek *rex, ser, ber* û hd., lê ev derveyî mijara me ne.

bazinedaçekê tarîkirî ne, berkarê ferzkirî di nav kevanekên goşeyî de ye û lêkera serfkirî ya di nav berkar/hevokê de *îtalîk* e.

(8) a. Wek gelek tiştên din ên ku min bêdilê xwe û ji bêgavîtiyê dikirin an jî bi cî dianîn, neqirandina derî jî bûbû qaîdeyeke esasî **di** têkiliya me ya [ku her roja Xwedê rêz û rêzikên nû lê *zêde dibûn*] **de**. (*PÇN*, r. 10)

b. [**Ji** ciyê ku min ji xwe re wekî kozikeke qewîn *bijartiye* **de**] dibînim ku kalo bi dûr û dirêjî behsa tiştine wiha dike. (Nemir 2012: 27)

(9) a. **Di** raporta [ku ji 63 rûpelan *pêk tê*] **de**, HRW balê dikişîne ser [...][81]

b. **Di** nava çalakiyên [ku Dîcle *beşdar bûn*] **de** û [wekî "ne qanûnî" *hatin binavkirin*] **de** merasima ji bo cenazeyê nivîskarê kurd Mehmed Uzun [...][82]

c. **Di** hevdîtina [ku li nexweşxaneyê bi wî re *hatiye kirin*] **de** dibêje ne gengaz e ku mirov bi lingekî bilîze.[83]

Bi ihtimaleke mezin, ev bikaranîna berbelav, lê xelet, ya meydana nivîsevaniya kurmanciyê, ku di *Otobêsê* de jî pir zêde li kar e, nimûneyeke encama têkiliya kurdî-tirkî ye; bi gotineke deqîqtir, nimûneya hilgirtin an jî kopîkirina mentiq û mastereya binyadê zimanê tirkî ye. Ji bo nîşandana vê tesîrê em li hevok (10a) vegerin û wê bidin ber tirkiya wê di (10b) de:

(10) a. Belam ew jî nizanin parêzereke wan a ku wê qasekê bi şûn de ***bi*** [*evîndarê xwe yê ji rêzê yê [ku li fûarên gerok şekalên jinan difiroşe]]* ***re*** li devereke ji deverên ku wan û yên mîna wan berî pey hev didan hev bibîne. (r. 182–183)

b. Ama onlar da bir avukatlarının, birazdan, önceleri onlar ve onlar gibilerin ard arda dizildikleri yerlerden birinde [[*gezici fuarlarda kadın ayakkabısı satan*] *sıradan* sevilisiy]**le** buluşacağını bilmiyorlar.

Ji berhevdana hevoka resen a kurdî û wergera wê ya teqrîbî bi tirkî çend xalên girîng xwe didin der:

I. Karê ku di kurmancî de bi bazinedaçekê diqete, di tirkî de bi paşgira rewşê (*case suffix – ad durum eki*) bi cî tê (ku tarîkirî ne di hevokan de).

[81] Rûdaw Ewrûpa, hj. 22, r. 1, nûçeya *Human Rights Watch* [...].
[82] Diyarname, nûçeya *Hatîp Dîcle* ...: http://diyarname.com/news.asp?Idx=6413 (Têketin: 12ê îlona 2013an)

[83] Azadiya Welat, hj. 169, nivîsara *Di çapemeniya cîhanê de kurd.* Bnr. Haig (2002).

II. Paşgira rewşê ya tirkî tê ser navdêrekî (*sevgili* “evîndar”), navdêra ku hevoka pêwendiyê wesfê wê dide û ku cihê wê li dawiya hevoka navdêrî ye.
III. Di hevoka pêwendiyê ya bi tirkî de, *gezici fuarlarda kadın ayakkabısı satan*, lêkereke serfkirî nîne, anku hevokeke neserfkirî ye (*non-finite clause*), bi gotineke deqîqtir, element an hevokeke navdêrî (*noun clause*) ye. Lêkera heman hevoka pêwendiyê ya kurdî yeke serfkirî ye *(difiroşe)*, anku hevok yeka asayî ye, ne navdêrî ye.

Ji van her sê xalan derdikeve ku hev-erkê bazinedaçeka kurdî di tirkî de paşgira rewşê ye. Paşgira rewşê jî di tirkî de bi tenê bi elementên navdêrî ve tê kirin. Di hevok (10b) de, bicîkirina wê paşgira rewşê li dû hevoka pêwendiyê asayî ye, ji ber ku hevoka pêwendiyê yeka navdêrî ye û bi lêkereke navdêrî (ku di rêzimana tirkî de jê re “fiilimsi” dibêjin) hatiye duristkirin. Lê belê, di versiyona kurdî de hevokeke asayî ya bi lêkereke serfkirî heye, ne hevokeke navdêrî; û bicîkirina daçekê li dû hevokeke asayî an jî lêkereke serfkirî xelet e, ji ber ku daçek bi tenê berkarên navdêrî hildigirin. Xuya ye ku cihê paşdaçekê di hevokên wek (10a) de ji ber tesîra tirkî ye, lewre di her du versiyonan de, (10a-b), wateya pêrebûnê *(comitative)* bi elementên ji kategoriyên cuda lê li heman cihî, anku piştî hevoka pêwendiyê [parên di nav kevanekên goşeyî yên navxweyî de], hatiye derbirrîn. Wiha, mentiqa bicîkirina forma tirkî ya ku wateya pêrebûnê dide hatiye veguhastin bo ser hevoka kurmancî. Lê belê, wek me gotî, di versiyona tirkî de, bicîkirina paşgira rewşê ya pêrebûnê li dû hevoka pêwendiyê nabe pirsgirêk, ji ber ku hem nav e (“sevgili”) yê ku paşgira rewşê hildigire û hem jî hevoka pêwendiyê ya wesfê wî navî dide hevokeke navdêrî ye, anku ne lêkereke serfkirî lê lêkereke navdêrî (“satan”) dihewîne. Lê belê, di versiyona kurmancî de, cuda ji ya tirkî, hevokeke pêwendiyê lêkereke normal serfkirî “difiroşe” dihewîne û ew hevok jî wek berkarê bazinedaçekê ketiye navbera herdu pişkên daçekê, lewma ji layê rêzimanê ve xelet e (herwiha bnr. raveyên di para 4.4.1an de).

Ji bo bêtir selimandina îdiayên nîqaşê em ê bi kurtî hevokên soranî jî bidin ber hev. Hevoka jêder (11a) ji *Otobês*ê hatiye wergirtin; hevokên (11b-c) wergera teqrîbî ya hevoka jêder e bi soranî û bi tirkî:

(11) a. Pêjna xwêdaneke hûrik dikim [**di** binê çermê pozê min [ê ku bistika berçavkê li ser e û dixurîne] **de**]. (r. 185)

b. We xo dekewim ke wirde eraqeyek dête xwarê [[**le** jêr postî lûtim **da**] [ke sîmî eynekekanim le sere w deyxurênêt]].

*We xo dekewim ke wirde eraqeyek dête xwarê [[**le** jêr postî lûtim] [ke sîmî eynekekanim le sere w deyxurênêt] **da**].

c. Ufak bir terleme seziyorum [[gözlük telinin üstünde olduğu ve kaşıdığı] [burnumun derisinin altı]n**da**].

Di hevok (11a) de dîsa du lêkerên serfkirî an jî du hevokên asayî hene di nav bazinedaçekê de. Ji layê rêzimanê ve ev hevok xelet e ji ber ku daçek hukmî li lêkeran nakin, anku lêker û hevokên bi lêkerên serfkirî nabin berkarên daçekan. Di hevokên bi soranî û tirkî de (11b-c), bi tenê elementên navdêrî hene di bin daçekan de, lewma hukmê daçekan li kar e û hevok durist in. Di hevoka bi soranî de, hukmê bazinedaçekê bi bêjeya navdêrî *postî lûtim* “çermê pozê min” ve hatiye bisînorkirin, anku berkarê daçekê bêjeyeke navdêrî ye; hevoka pêwendiyê jî, ku lêkereke serfkirî dihewîne, li dû paşdaçekê hatiye. Lê belê, di hevoka jêder a bi kurmancî de, hevoka pêwendiyê berî paşdaçekê hatiye, ku pirsgirêk ji vê yekê dizê. Bi vî rengî, qaîdeya hukmê daçekan tê



www.arsivakurd.org

pêpeskirin ku li reftara ti yek ji van zimanên li jorê nayê. Hevoka ferazî ya bi soranî ya bi işareta (*), ku li ser usûlê hevoka jêder a kurmancî ya (11a) ye, xelet e û ne di zimanê axiftinê û ne di yê nivîskî de bikaranînên wiha nînin.

Rêbaza hevoka soranî ya (11b) tekane rê ye ji bo avakirina hevokên wiha di soranî de. Di soraniya standard de, bazinedaçeka "le ... da" muqabilî "di ... de" ya bi kurmancî ye. Paşdaçeka "da" li dû navdêrê an jî bêjeyeke navdêrî tê û heke hevokeke pêwendiyê bi erkê wesfkirina navdêrê rabe, hingê paşdaçek dikeve dû navdêrê û berî hevoka pêwendiyê. Bo nimûne, di hevok (12) de, berkarê bazinedaçekê bêjeyeke navdêrî ye ku tê de mesder heye –ku mesder jî elementeke 'navdêrî' ye.[84] Di hevok (13a) de berkarê daçekê *ew rojan û şewane* ye. Herwiha hevokeke pêwendiyê ("ke be hoy ...") heye û wesfa berkarê daçekê ("ew rojan û şewane") dide. Hevoka pêwendiyê yeka asayî ye û lêkereke serfkirî tê de heye. Lewma, hevoka pêwendiyê ne di nav du parên bazinedaçekê de, lê li dû paşdaçekê hatiye bicîkirin, da ku hukmê paşdaçekê bi hêmanên xwe yên navdêrî ve bê bisînorkirin. Nabe paşdaçek li dû hevoka pêwendiyê ya bi lêkera serfkirî bê. Hevoka bi soranî heke li dû mentiqa şaş a hukmê daçekan a nivîsevaniya hevçerx a kurmancî bihata dariştin dê wek di (13b) de bûya, ku ev hevok ji bo axêverên soraniyê ji layê gramerê ve xelet e û ti kes ne bi vî rengî diaxive û ne jî dinivîse.

(12) **Le** [salyadî sûtanî shar] **da** [...] (Nehayî 2010: 93)

Di [salvegera sotina şehr] de

(13) a. Las zor lewe duwa. ... **Le** [ew rojan û şewane] **da** [ke be hoy tenyayî w bêdesellatî be bîreweriyekanîyewe denûsî]. (Nehayî 2010: 93)

'Las gelek hizra vê yekê kir. **Di** wan roj û şevan **de** ku ji ber tenêtî û bêdesthelatiyê bi bîranînên xwe ve dizeliqî.'

b. *Las zor lewe duwa. ... **Le** [ew rojan û şewaney ke be hoy tenyayî w bêdesellatî be bîreweriyekanîyewe denûsî] **da**.

'Las gelek hizra vê yekê kir. **Di** wan roj û şevên ku ji ber tenêtî û bêdesthelatiyê bi bîranînên xwe ve dizeliqî **de**.'

Bi qewlê xulaseyekê li dabaşa hukmê daçekan, me divê bi hevokên nimûneyî nezera xwe derbibirrin li ser awayên çêtir ên bikaranîna bazinedaçekan û awayê rêkxistina hevokên pêwendiyê. Ji bo vê, hejmareke hevokan ji *Otobês* û *PÇN* hatine wergirtin, ji (14) ta (21). Hevokên jêder, wek di berheman de hatî, hevokên (a) ne, li bin wan, di hevokên (b) de, me, li dû nîqaşa dûvedirêj a li jorê, pêşniyarên xwe nivîsîne ji bo bidestxistina awayekî rêzimanî û kurdî yê rêkxistina hevokên jêder û manend.

(14) a. **Di** nava xeyalên ku li ber siya wan a milmilokî ji min hez dike **re**, min evîna xwe da vî dildarê xwe yê ku ji nava hemûyan derket û hate ber min, (...). (r. 184)

b. **Di** nava wan xeyalan **re**, ku li ber siya wan a milmilokî ji min hez dike, min (...).

(15) a. Erebe [...] hê **di** ber vê peyarêka ku darên stûr ew bi tevayî vegirtiye **de** ye. (r. 103)

[84] Bnr. Aydogan (2012: 215), ku jê re dibêje "navdêrên lêkerî".

b. Erebe [...] hê **di** ber vê peyarêkê **de** ye ku darên stûr ew bi tevayî vegirtiye.

(16) a. Roja ku winda bû, di ber pêlên sîtavka roja çûyî ava re, pê hisiyam min **di** derba ku min nû ev dîtibû **de** ez ji vê yekê serwext bûbûm. (r. 85)

b. Roja ku winda bû (...) pê hisiyam (di) derba min nû ev dîtî (de) ez ji vê yekê serwext bûbûm.

(17) a. Ji êvara şerê ku ez dam û berdam de? (r. 162)

b. Ji êvara wî şerî de/ve ku ez dam û berdam?

(18) a. ... û bangî min kirin **di** dawiya wê menzela ku kesî nas lê tunebû **de**. (r. 57)

b. ... û bangî min kirin **di** dawiya wê menzelê **de** ku kesî nas lê tunebû.

(19) a. Wek gelek tiştên din ên ku min bêdilê xwe û ji bêgavîtiyê dikirin an jî bi cî dianîn, neqirandina derî jî bûbû qaîdeyeke esasî **di** têkiliya me ya ku her roja Xwedê rêz û rêzikên nû lê zêde dibûn **de**. (*PÇN*, r. 10)

b. Wek (...) neqirandina derî jî bûbû qaîdeyeke esasî **di** têkiliya me **de** ku her roja Xwedê rêz û rêzikên nû lê zêde dibûn.

(20) a. Wê şevê Sertac, **di bin** ronahiya çardeh mûmikên ku li çarmedorê odeyê belav bûbûn **de**, berî min û berî eta min a li metbexê di xew re çûbû. (*PÇN*, r. 10)

b. Wê şevê Sertac, **di bin** ronahiya çardeh mûmikan **de**, ku li çarmedorê odeyê belav bûbûn, berî min û berî eta min a li metbexê di xew re çûbû.

(21) a. Bi vê fikarê wî ne yek û ne du, tam sê tasik Ava Sûsê vexwaribûn **bi dû** du porsiyonên kelepaçeya têr rûn û têr simaq a ku diya wî çêkiribû **re** û ... (*PÇN*, r. 188)

b. Bi vê fikarê wî ne yek û ne du, tam sê tasik Ava Sûsê vexwaribûn **bi dû** du porsiyonên kelepaçeya têr rûn û têr simaq **re**, ku diya wî çêkiribû, û ...

### 4.3 *Ka* û *ku* li ku?

Di kurmanciyê de hevokên bestî bi amrazên (gihanek, *conjunction*) "ku" û "ka" li hevokê têne girêdan. Hevokên bestî yên asayî/îxbarî (*indicative*, *bildirim*) bi amrazê "ku" [beramberî *that* ya îngilîzî û *que* ya frensî] û hevokên bestî yên pirsyarî an yên bi raweya daxwazî/şertî (*subjunctive*, *şart*) bi amrazê *ka* [beramberî *whether* û *if* yên îngilîzî û *si* ya frensî] bi hevoka serekî ve têne girêdan. Bo nimûne, hevoka bestî ya di (22a) de yeka îxbarî ye û bi amrazê "ku" durist bûye, di demekê de hevoka (22b) îxbarî nîne, di eslê xwe de hevoka pirsê ye, lewma gava dibe hevoka bestî ya lêkera hevokeke serekî, wek amrazê pêwendiyê ***ka*** (an jî ***bê***) hildigire. Herwiha, gava axiftina yekî din, bi rengekî neyekser di nav hevokê de bê neqlkirin (*indirect quotation*), hingê jî hevokên pirsê bi amrazê *ka* têne duristkirin.

(22) a. Ez dizanim [***ku*** tu şagirt î].

(Ji hevoka 'tu şagirt î.')



www.arsivakurdi.org

b. Ez dixwazim bizanim [***ka*** tu şagirt î an na]. (Ji pirsa 'tu şagirt î?')

Di Otobêsê de gelek nimûne hene ku vê cudakariya sade lê esasî ya hevoksaziya kurdî pêpes dikin. Hevoka bestî ya (23)yê, yeka ne-îxbarî ye, ji hevokeke pirsê ye; lewma divê bi amrazê "ka" li hevoka serekî bê girêdan, ne bi "ku"yê. Di hevok (24) de, bi heman rengî, hevokeke di eslê xwe de pirs bi amrazê "ku" li hevoka berfireh hatiye girêdan, ku diviya bi "ka"yê bûya. Axirî, di (25) de, du pirsên naverokî, bi awayê neqla neyekser li hevoka serekî hatine girêdan, lê ne bi "ka"ya pêdivî, belku bi "ku"ya hevokên îxbarî. Heman modêla nelihev li (26) jî li kar e. Ev hevok hemû, (23)-(26), bi guhertina *ku*'yê bi *ka*'yê sererast dibin.

(23) Min ne xwest, ne jî han da xwe bifikirim [***ku*** tişta ku diqewime û encam dide **çi ye**]. (r. 90)

Ji pirsa: *Çi ye diqewime û encam dide?*

(24) Her ku dikevim şikê, [***ku*** ew bi hawê ez difikirim fikirîne, an berra vî tiştê ku ji min tirê bi awayekî sêhrdar û sermest rê û rewşê dide tevgerên wan dibînim, an na,] hingê qehr û behca min min ji darê meferê dixe. (r. 181)

Ji du pirsan: *Ew bi awayê min fikirîne?*

(25) Lewma dema ku ew bi şer ji min dipirse, [***ku*** "îro" min **çi kir**], nayê bîra min, [***ku*** min **çi kiriye**], û ez nizanim ez ê çi bibêjim. (r. 187)

Ji pirsên: *Te îro çi kir?*; *Min çi kiriye?*

(26) Ya rast ez bi xwe jî nizanim, [***ku*** ew kewarên (*binolî* digotine wan, niho kes nizane çi ne) li binê xaniyên ku bi dengê tep û repa tanqan û balafirên ji nizm de hêlan dibûn re ji binî de bi gurmîniyeke biçûk dihezizîn bi kêrî xelkê **dihatin, an na**]. (r. 86)

Ji pirsa: *Ew kewarên ... bi kêrî xelkê dihatin an na?*

Zehmet e mirov bi piştrastî teşxîsê bi pêvajoya psîkolenguîstîk a li dû çêkirina hevokên wiha bide, lewre di heman berhemê de li gelek deverên din hevokên pirsê bi awayê çaverêkirî, anku bi amrazê "ka", ne bi "ku", di hevokê hatine xistin û emilandin. Dîsa ihtimal heye ku mastereya tirkî, ku bêguman di hizr û prêzeya rojane ya nivîserên kurd ên li Tirkiyeyê çalak e, tesîr li hevokên kurdî kiribe. Berevajî kurdî û îngilîzî û frensî, di tirkî de ferqeke analojîk di navbera hevokên bestî yên îxbarî û pirsî/şertî de nîne, hemû ji paşgirên hevokên bestî (*subordinating suffixes, adlaştırma ekleri*) *-mA, -mAK, -DIK, -(y)AcAK, -Iş* îstifade dikin. Bo nimûne, wergera hevok (25) ya bo tirkî, *bana bugün ne **yaptığımı** sorduğunda* ('gava ji min pirsî **ka** min îro çi kiriye'), û hevokeke îxbarî ya bi heman lêkerê, *bugün helva **yaptığımı** biliyor* ('dizane **ku** min îro helaw çêkiriye') ji heman paşgirê û heman avaniyê îstifade dikin. Lewma nêziktirîn ihtimal ji bo çavkaniyên muhtemel ên vê bikaranîna xerîb dîsa çalakbûna mastereya tirkiyê ye di pêvajoya nivîsandina van hevokên bi kurdî de.



www.arsivakurdi.org

### 4.4 Sentaksa hevokên têkel

Hevokeke têkel ew hevok e ku tê de ji yekê zêdetir lêker –û lewma hevok– hene. Ji wan yek lêkera hevoka serekî an hevoka berfireh e, ya din (an yên din) ya hevoka bestî [*subordinate clause*, *yan cümle*] ye. Hevokên têkel bêtir malê zimanê nivîskî ne. Zimanê axiftinê bi giştî li ser qiseta sade ava ye, lew armanca serekî ya zimanê axiftinê û yê rojane bêtir qetandina danûstandinê ye bi rengekî yekser û bêkêşe. Lewma di meydana nivîsevaniya kurmancî de, ku bêpar e ji tradîsyoneke berdewam a xwendewarî û nivîseriyeke berbelav û ku, bi taybetî li Kurdistana bakur, heta dereceyekê ji rehên resen ên kurdiyê qut bûye, alozî û sergêjiyeke zêde heye di dariştina hevokên nisbeten dirêj û têkel de. Em dê niha çendek ji wan kêşeyên berbelav yên bi sentaksa hevokên têkel re elaqedar di nimûneya *Otobês*ê de binirxînin.

#### 4.4.1 Hevokên bestî di hevokên têkel de

Di zimannasiyê de cudakariyeke girîng heye di navbera du komên lêkeran de: lêkerên *serbixwe* (*finite*) ew in yên ku dikarin kirdeyekê hilgirin û hevokeke serbixwe saz bikin û, du, lêkerên *bestî* (*non-finite*) ew in yên ku nikarin hevokeke serbixwe saz bikin. Formên lêkeran yên serfkirî wekî “diçe” û “çû” ji koma lêkerên serbixwe ne; formên lêkeran yên mesder û partîsîp (*halê çêbiwar*) wekî “sotin” û “şkestî” ji koma lêkerên bestî ne. Mirov dikare bi yên koma ewil hevokên serbixwe saz bike (bn. *ew niha* ***diçe*** *bajêr*), lê ne bi yên koma duyê (bn. ***sotin****a bajêr*, ne hevokeke serbixwe ye).

Kurmancî û zimanên hind-ewrûpî bi giştî feqîr in ji bo morfolojiya lêkerên bestî; di demekê de ku tirkî û zimanên altayî û zimanên Qefqazê û çendîn komên din dewlemend in bo formên lêkerên bestî. Di termînolojiya tirkî de bo wî celebê lêkeran dibêjin “fiilimsi”, ku çendîn cureyên cuda bi xwe ve digirin, wek *lêkerên hokerî, lêkerên rengdêrî* û *lêkerên navdêrî*. Bo mijara me *lêkerên navdêrî* girîng in. Lêkerên navdêrî yên tirkî ew in yên ku bi van paşgiran têne duristkirin: *-mAK*, *-mA*, *-DIK*, *-(y)AcAK* û *-(y)Iş*. Lêkera ku yek ji van paşgiran hildigire dibe hevokeke navdêrî, anku ew hevokên ku bi erkê hêmanên hevokê wek “kirde” û “berkar” radibin. Bo nimûne, di vê hevokê de, ***çocukları görmek*** *istiyorum* ‘ez dixwazim zarokan bibînim’, hevoka bestî (tarîkirî) bi lêkera navdêrî “görmek” hatiye sazkirin, lewma *hevokeke navdêrî* (noun clause) ye, û bi erkê navdêran radibe, lewre mirov dikare li şûna wê navdêreke sade û tîpîk (wek *çiçekleri* ‘kulîlkan’) dayne.

Di kurdî û piraniya zimanên din ên îranî de formên lêkeran yên wisa nînin ku hevokên navdêrî durist bikin, lewma lêkera hevokên bestî di kurdî de yeka serfkirî ye û hevoka bestî gelek caran bi amraz an gihaneka *ku* li hevoka serekî tê girêdan. Ev yek di tercumeya hevoka bi tirkî de, ya li jorê, xuya bû: ‘ez dixwazim (ku ez) **zarokan bibînim**’, lewre di versiyona kurmancî de lêkera hevoka bestî [tarîkirî] lêkereke serfkirî ye, ne yeka navdêrî. Bi kurdî tenê mesder dibin hevokên navdêrî, wek ***kuştina mirovan*** *guneh e* an ***çûna ser çiyayan*** *xweş* e. Di demekê de ku bi tirkî hevokên navdêrî dikarin gelek hêmanan (“kirde, berkar”) bihewînin. Bo nimûne, di vê hevokê de, *Yemeğini bitirmeni istiyorum*, hevoka navdêrî kirde (*sen* “tu”) û berkarî dihewîne; bi kurdî, ji ber nebûna morfemên wisa ku lêkerên bestî durist dikin, hevokên navdêrî yên wisa aloz mumkîn nînin, divê bi hevokên bi lêkerên serfkirî bêne îfadekirin, wek *ez dixwazim [ku* ***tu xwarina xwe xelas bikî****]*. Heke bi mentiqa tirkî em wê hevokê biqelibînin ser kurdî dê teqrîben wiha be: *ez xelaskirina xwarinê ya te dixwazim* an *ez xelaskirina te ya xwarinê dixwazim*, ku hevokên wiha bi kurdî ne mumkîn in. Heman cudakariyên girîng ên di navbera binyad û heykelê hevokên tirkî û kurdî de di nimûneyên (27) de rontir dibin:

(27) a. *[Kürtçe konuşabildiğini] bilmiyordum.*

*‘Min [kurdî (karîn) axiftina te] nedizanî’

→ ‘Min nedizanî [ku tu dikarî bi kurdî biaxivî.]’

b. *[Onun benden beklentilerine cevap veremediğim]e hayıflanıyorum.*



www.weşanxaneyakurdi.org

*'Heyfa min ji [bicîneanîna xwe ya bendewariyên wî yên ji min] tê'.

→ 'Heyfa min ji wê yekê tê [ku ez nikarim bendewariyên wî yên ji min bi cî bînim].'

Di hevokên bi tirkî yên di (27a-b) de, hevoka bestî yeka navdêrî ye û bêyî amraz an gihanekekê di hevoka serekî hatiye xistin; di wergera wan hevokan a bi kurdî de lêkerên hevokên bestî formên serfkirî ne (ne navdêrî ne) û hevokên bestî bi amrazê *ku* di hevoka serekî hatine xistin. Hevokên bi kurdî yên işareta (*) hildigirin xelet in, ji ber ku, li gor binyadê hevokên tirkî, barekî derveyî şiyana mesderên kurdî li wan hatiye kirin. Eger çî axêvera kurdîziman têbigihe jî ka wateya armanc çi ye ji van hevokên xelet, lê bi ti awayî ti kurdîzimaneke asayî hevokên wiha nakelime.

Heçî nivîserê kurd e, ew di repertûara xwe ya zimanî de xwediyê zanyarî û prêzeya rojane ya her du awayan e, awayê tirkî û kurdî. Lewma tê heye ku nivîserê kurd, ê ku bi têra xwe hişyar an hesas nebe li ser van cudakariyên girîng ên di navbera her du awayên dariştina hevokên bestî de û heke binyadê hevokên tirkî lê zal û feal bin, hingê heye ku mentiqa awayê zimanê tirkî li ser afirandina xwe ya bi kurdî piyade bike. Gelek mixabin ku *Otobês* pir e ji hevokên ku wiha bi qaîdeyên dûrî kurdî û zimanên îranî (hetta hind-ewrûpî) hatine dariştin. Hevoka (28a) yeka wisa ye, ku li dû qaîdeya hevoka bestî ya tirkî (28b) hatiye dariştin.

(28) a. Kêmaniya di dilê xwe de, pirr pêjna wê nekim jî, bi **[*vê nedîtina xwe ya ku tiştên ku ew bi min re dibînin ez nikarim di xwe de bibînim*], rave dikim**. (r. 181)

b. İçimdeki eksikliği, çok sezmesem de, **[*bu benim onların bende gördüklerini kendimde görememem*]le açıklıyorum**.

Ji qiyasa hevokên (28a) û tirkiya wê (28b) derdikeve ku di hevoka kurdî de, her wekî ya tirkî, hevoka bestî ji lêkera navdêrî (mesder) "nedîtin"ê durist bûye. Me dît ku mesderên kurdî bi tenê gava wateyeke sade tê derbirrîn, wek *"*nedîtina dinyayê kêmasî ye" –ku dîsa jî wate her ron nîne–, hevokên navdêrî durist dikin. Ji ber nebûna amrazên morfolojîk ên wek paşgirên lêkerên bestî yên tirkî, hevokên bi vî rengî aloz bi kurdî pêdivî bi hevokeke bestî ya bi lêkereke serfkirî heye. Lewma sepandina heman mentiqê li ser hevoka kurdî bûye sebebê xumambûna wateyê û dûrketina ji îmkanên her çi rêzimaneke xwezayî ya zar û zimanên kurdî.

Mentiqa binyadê zimanê tirkî yê hevokên navdêrî yên wisa aloz bi zimanên din ên îranî û hind-ewrûpî jî an ne mumkîn e an pir zehmet e. Tercumeya hevoka (28) bo zimanên frensî (28c), farsî (28d), soranî (28e), û bi alternatîfên kurmancî (29f-g), diselmînin ku di ti yek ji van zimanên li kurdiyê nêzîktir îmkaneke wek navdêrîkirina hevokan a tirkî nîne, lewre ev hemû jî mîna kurdiyê ji amrazê hevokên bestî (muqabilî *ku*'ya kurdî) û hevokên bestî yên serfkirî îstifade dikin.

(28) c. J'interprète le manque en moi, quoi que je ne le ressente pas autant, par [le fait *que* je *ne vois pas* en moi ceux qu'ils y voient].

d. Fekr mîkonem ke mehromiyetê tuyê delem, eger çî an qedr ehsaseş hem nekonem, *be xatirê în est* [*ke* men çîzhayî ke anha ba men mîbînend ba xodem *nemîbînem*.]

e. Kem û kurrîy le naxî xom, eger çî ewende hestîşî pê nekem, bewe *tefsîr dekem* [*ke* ew şitaney ke wan le min da debînin min le xom da *nabînim*].

f. Ez kêmaniya di dilê xwe de, pirr pêjna wê nekim jî, bi vê yekê *dizanim* [*ku* tiştên ku ew di min de dibînin ez di xwe de *nabînim*].

g. Diyar e kêmaniya di dilê min de, herçend pirr pêjna wê nekim jî, *ji ber wê qasê ye* [*ku* ew tiştên ku ew di min de dibînin ez di xwe de *nabînim*].

Bi vî rengî, şik tê de nîne ku hevoka jêder a *Otobês*ê (28a) ji qalib û mastereya kurmanciyê bêtir ya tirkî xebitandiye. Anku mastereya zimanê din, ya zimanê tirkî, hatiye kopîkirin. Form/kereste her yên kurdiyê ne, lê awayê rêkxistina mebestê li dû mentiq û modêla rêziman û semantîka zimanê tirkî ye.

Niha, bêyî ku yek bi yek tehlîl bikin, li xwarê, di hevokên (29)-(30)-(31)-(32)-(33) de, çend nimûneyên din ji *Otobês*ê heman prêzeya bikaranîna hevokên navdêrî yên aloz, li ser mastereya tirkî, nîşan didin. Li bin hevokên jêder, di hevokên (b) de, şêwe-dariştinên alternatîf ên heman hevokan her bi kurmancî hatine dabînkirin.

(29) a. Pêdiviya min bi [têgihiştina wî ya hestên min] **heye**. (r. 162)

b. Pêdiviya min pê **heye** [ku ew di hestên min bigihe/bigihîje].

(30) a. Çawa qurf li dilê mirov nakeve ku mirov ji [derfeta ku hîn bibe ka gelo yê din jî di mehne û peyamên bêqisekirin gihişt], **bêpar be**. (r. 162)

b. Çawa qurf li dilê mirov nakeve ku mirov **pêbar be** ji [derfeta hînbûna wê yekê [ka gelo yê din jî di mehne û peyamên bêqisekirin gihişt(iye an na)]].

(32) a. [Nezanîna ku ez ê çi bikim] ez **qilqilandim**. (r.89)

b. Ez **qilqilîm** [(ji ber) ku min nedizanî çi bikim].

(33) a. Ez çi qasî çûm û hatim, [hizra [ku rihetiya min a beriya valakirina kîsikê nava xwe ji ava bêreng, bicir û bêhnnexweş ji ya ku ewqasî dibêjin pişt re tê mirov, hê mezintir bû,]] **ji hişê min nediçû**. (r. 93)

b. Ez çi qasî çûm û hatim, [ew hizr **ji hişê min nediçû** [ku rihetiya (min a) beriya valakirina kîsikê nava xwe ji ava bêreng, bicir û bêhnnexweş] hê mezintir e ji ya ku ewqasî dibêjin piştre tê mirov].

Di van hevokan hemûyan de, mirov bes bi fealkirina zanyariyên xwe yên zimanê tirkî dikare merema hevokan têbigihe. Lê gelek aşkera ye ku ti yek ji van hevokên me destnîşankirî li reng û dirûvê kurdiyê nayên. Tevdaniyên heta vê dereceyê dûr û havî ji binyad û heykelê zimanên kurdî û îranî, ku seyr e çawa di merhaleyên edîtoryal re derbas dibin, nîşaneyên "raseriyeke mutleq" a zimanê tirkî ne di hin qonaxên afirandina edebî ya nivîserên kurd de li Tirkiyeyê.

### 4.4.2 Lêkerên hilawistî û sentaksa li dijî bîra axêveran

Babetên heta niha me nirxandî, hin aliyên kêşeyên li dor hevokên têkel [ew hevokên ku ji yekê zêdetir lêkeran dihewînin] nîşanî me dan. Lê belê kêşeya herî mezin û bi ya me herî bêsiûd, lê mixabin berbelav, piyadekirina awayê zimanê tirkî yê bicihkirina lêkeran e di hevokên têkel de, ku em dê niha bi kurtî rave bikin.

Weku berê jî hate diyarkirin, di zimanê tirkî de, hevokên bestî piranî bi şiklê hevokên navdêrî ne (bi lêkerên neserfkirî an nîvserfkirî, wek hevok (27)) û lewma li cihê hêmaneke asayî ya hevokê (wek kirde an berkar) tên. Ji ber vê yekê, lêkera serekî ya hevokeke têkel her dîsa li cihê xwe, li dawiya hevokê dibe (bnr. 28b). Lê kurmancî û –soranî û farsî jî tê de– gelek zimanên din ên hind-ewrûpî, ji bo hevokên bestî, bêtir ji hevokên/lêkerên serfkirî îstifade dikin. Anku di hevokeke têkel de du lêkerên bi rengekî asayî serfkirî dibin, yek ya hevoka serekî, ya din ya hevoka bestî. Lewma, heke cihê lêkeran di hevokên têkel de bi duristî neyê destnîşankirin, dibe ku wateya hevokê xumam bike, mîna di hevoka (34an) de.

(34) [**Ecêbmayîn**a herî mezin jî, [dema ku destê wî li doxika tembûra [ku li ber lingê wê, spartî kêleka qûç ***hatibû***] ***ket*,]** pê re **peyda bû**.]

Sê lêkerên hevokê, anku lêkera hevoka serekî "peyda bû", û du lêkerên hevokên bestî "hatibû" û "ket", li dawiya hevokê, li pey hev hatine rêzkirin. Her du lêkerên li dawiyê "ket" û "peyda bû" bi awayekî "hilawistî" mane, anku mirov yekser nizane ka karê kîjan hevokê [her hevokek di nav coteke kevanekên goşeyî de ye] û kîjan hêmanan radigihînin. Rêya têgihiştina vê hevokê tenê ew e ku xwîner bi xwendina lêkeran re par ve vegere û vebîne ka kîjan lêker karê kîjan hevokê radigihîne. Hevokeke wiha, bi vî binyad û heykelê xwe yê sentetîk, ji zarê ti kurmancî-zimaneke asayî dernakeve, ji ber ku barê jihevkirina parên navxweyî û cuda yên vê hevokê zêde giran e ku axêvereke kurmanciyê, bi rengekî asayî û ekonomîk, têbigihe û kar pê bike û axirî ji bo derbirrîna hizr û meremên aloz xwe bispêriyê. Jixwe di ti yek ji deqên edebiyata zarekî de (Nikitine 1926; Ritter 1970; MacKenzie 1962, 1995) avaniyên wiha an manend li ber çavên me neketin.

Nimûneyeke seyrtir (35) e. Lêkera vê hevokê, "qal kirin", yeka lêkdayî/hevedûdanî ye, ji du pişkan pêk tê: pişka navdêrî (*qal*) û pişka lêkerî (*kirin*). Berkarê lêkerê/hevokê [di nav kevanekên goşeyî de] dikeve navbera "qal" û "kirin"ê.

(35) Li ber serê wê, bi çi dengekî nazik û zirav di wî temenî de, ***qala*** [diya wê, xweha xwe ya dilsoz, zewaca ku ew ji hev *felişandin* û heta hetayê *veqetandin*, bextê wê û mêrê wê yê ku ji aliyê mêrxasên qenadê har ê welêt ve hatibû windakirin, nexweşiyên ku *belav dibin*, her kesî *çirûk dikin*, hindik maye *bigihê* lawiran û ew jî ji ber vê bêbextiya me mirovên ku me ev bajar jî *anî xiste* vî halî *pê bikevin*, *nebe* nesîbê me, ku em *bibînin* bê çiya êgir *bikuxîne*, derya carekê *vereşe* çi *tê* serê me,] ***dikir***, ... (r. 77)

Di navbera her du pişkên lêkerê de, ji "qal"ê heta "dikir"ê, sêzdeh lêkerên din hene [*îtalîk*]. Ev yek tê wê wateyê ku xwîner an bihîzera vê hevokê dê piştî biwatekirin û têgihiştin û hezmkirina sêzdeh rewş û rûdanên cuda dê axirî bigihe zanyariya ka hevoka ku dixwîne *çi rewş* an *rûdan*ekê radigihîne, anku ka *lêkera serekî* çi



www.navkurd.org

ye, an jî, bi gotineke sadetir, ka ev hevok *qala* çi *dike*. Lê belê, ji ber ku lêkereke lêkdayî ye û ji du pişkan pêk hatiye, xwîner divê *qal* û *dikir*ê wek yek lêker têbigihe, lewre *qal* û *dikir* serbixwe nînin di hevokê de, tenê bi hev re wateyekê pêk tînin, û lewma xwîner mecbûr e her du pişkên lêkerê bi hev re bihizire.

Xuya ye nivîserê vê hevokê ji serî ve qebûl dike û li hêviyê ye ku xwîner, piştî gihişte peyva “dikir”a li dawiyê, li beşên pêştir ên hevokê vegere û di nav sêzdeh lêkerên berî xwe re berev paş biçe heta pişka navdêrî (*qal*) ya lêkera lêkdayî peyda dike û wateya “qal kirin”ê wek di merkeza vê qiseta dirêj de vebîne. Ji ber ku tebîeten îmkan nîne ku gava xwîner hevokên van sêzdeh hevokan dixwîne “qala”yê di bîra xwe de ragire û, gava gihişte “dikir”a li dawiya hevokê, van herduyan bi rengekî xwezayî bi hev ve têkildar bike. Vekolînên li ser bîra kurtedemî (*short-term memory*) ya mirovan selmandiye ku rêjeya peyvên/elementên ku mirov dikare di bîra kurte-demî de ragire navînî 7 peyv in (du kêm du zêde); gava ji vê reqemê zêdetir dibin yên pêştir pak dibin û yên nû tên. Di navbera “qal” û “dikir”ê di hevoka (35) de, ji çilan zêdetir peyv hene, 6 caran ji hidûdê qabiliyeta bîra mirovên asayî zêdetir. Diyar e xwendina vê hevokê bi xwe temrîneke peydakirina wateyê ye, lewre xwîner divê di hengava xwendinê de herwiha hisab û nirxandinên meta-lenguîstîk jî bike ji bo têgihiştinê, ku reng e kar û endîşeyên zimanî ku xwîner di xwendina edebî de dê teqdîr bikin ne ev be.[85]

Hevok (36) jî her dîsa nimûneya hevokeke wisa aloz e ku bicîkirina lêkeran a bi rengekî seyr xwînera xwe mecbûr dike ku ji bo têgihiştinê ji xwendinê wêdetir tehlîlên zimanî jî lê bike.

(36) Wan **mirovên** [ku li otêla li pêşberî wê, sê qatî, û şibakeyên wê her wekî [ku wê demê bi rewac bû di teşeyê qabeyan de ***hatibûn avakirin] diman]***, ku niho ev avahiya rewneqdar a yeke ku li Ewrûpayê ew lê kiriye heye di şûna wê de, **diçin** serşokê exlebî. (r. 81)

Yek dikare li ser rêza hêmanên hevokê di kurdiyê de (ku bi giştî wek *kirde-berkar-lêker* e) îdia bike ku rê heye bo avakirina hevokên wiha û bo bicîkirina lêkeran bi vî rengî li dawiya hevokên aloz. Lê divê em bizanin ku formûlasyonên rêza peyvan a zimanekî (wek *kirde-berkar-lêker*) piranî ji rêza peyvan a di hevokên sade tê derxistin. Asayî ye ku rêza peyvan a hevokên sade bi kêrî hevokên têkel û dirêj neyê.[86]

Di van hevokan hemûyan de pirsa esasî awayê ne-kurdî/ne-îranî yê bicîkirina lêkeran û bikaranîna xelet a amrazê *ku* ye. Lê belê, di kurdî de çendîn rê û rêbaz hene, ku ji zimanê axiftinê û edebiyata zarekî tên, ji bo têxistina hevokên bestî û ji bo duristkirina hevokên têkel. Hevoka (37), ji berhemeke bi kurmancî, xweş nîşan dide ku bicîkirina lêkera serekî ya hevokê (*hêwirîme*) berî hevoka bestî ya temamker têgihiştinê pir hêsantir dike, lewre bi vî rengî sînorên hevokên navxweyî aşkeratir in û hêmanên hevokên cuda bêtir bi hev re ne, bêyî ku lêkerên hevokên cuda (lêkera hevoka serekî û lêkerên hevokên bestî) li dû hev siwar bibin.

(37) Ciyê ku ez bi dizî lê ***hêwirîme*** li pêşberî hewşa xaniyekî wiha ***ye***, [ku [***dimîne*** peristgeheke agirê wê vemirandî] û [***dihêle*** [ku bi xwe **hest bikim** [ez abirrê vê warkoza kavil **im**]]]]. (Nemir 2012: 14)

---

[85] Piraniya rexneyên ku heta niha derheq *Otobês*ê de belav bûne gazind ji têgihiştinbarnebûna wê kiriye (bnr. Xakî 2014). Wisa diyar e sersebebê vê yekê ev teserufa nivîserî ya keyfî ye bi sentaksa zimanî re.

[86] Bi heman rengî, weku yek ji gewretirîn zimannasan Steven Pinker (1994: 200) behsê lê dike, bi îngilîzî jî gelek awayên duristkirina hevokên têkel hene ku sentaksa zimanî di teoriyê de rê dideyê, wek vê hevokê : *“He gave the girl that he met in New York while visiting his parents for ten days around Christmas and New Year’s the candy.”* Lê belê, bi ti awayî ne wate ji vê hevokê derdikeve û ne jî ti îngilîzîzimanek hevokeke wisa dikelime. Lewre li vir jî lêker *gave* ‘dan’ û *candy* ‘qend’ bi hev ve têkildar in, lê di navbera van herduyan de pir zêde peyvên din hene ku nahêlin xwîner an bihîzer wê pêwendiya di navbera *gave* û *candy* de bi rengekî xwezayî ava bike.

Bicîkirina lêkera serekî berî hevokên bestî ji bo sivikkirina derbirrînê di farsî û soraniyê de jî rêyeke berbelav e, û, bêguman, awayê xelet ê kurmancî dûrî normên rêzimana van zimanan e, weku nimûneya (38a) ji farsî û versiyona wê ya muqabilî awayê xelet ê kurmancî (38b) nîşan didin. Di versiyon (a) de lêkera serekî (tarîkirî, ne-îtalîk) berî hevokên bestî hatiye bicîkirin, lewma durist e; lê awayê (b), ku lêkera serekî piştî hevokên bestî li dawiya hevokê hatiye bicîkirin, xelet e, ji ber ku "hilawistî" maye û xwîner nikare bizane ka çi karekî lê dike.

(38) a. Der heman doran serokelley-ê merd-ê cewanî der rosta **peyda şod** [ke ez şehrhayî etraf ***amade bûd*** ve bîşter veghtêş ra be geşt-o gozar der haşiyey rosta ve rûyê tepêha ***mîgozerand***]. (Mo'temedîn 2001)

'Her li wan heyaman, kelleserê mirovekî ciwan li gund peyda bû [ku ji şehrên cîran hatibû û piraniya wextê xwe bi ger û çerxa li dewrûberên gundî û li ser giran derbas dikir].'

*b. Der heman doran der rosta serokelley-ê merd-ê cewanî [ke ez şehrhayî etraf ***amade bûd*** ve bîşter weghtêş ra be geşt-o gozar der haşiyey rosta ve rûyê tepêha ***mîgozerand***] **peyda şod**.

'Her li wan heyaman, li gundî kelleserê mirovekî ciwan ê [ku ji şehrên cîran hatibû û piraniya wextê xwe bi ger û çerxa li dewrûberên gundî û li ser giran derbas dikir] peyda bû.'

Rêbazeke din a çareserkirina aloziya di hevokên wisa dirêj û têkel de vegeryana bo rê û dirbên zimanê axiftinê û edebiyata zarekî ye. Bo nimûne, hevokeke wiha ya ji axiftina rojane dibe gelek rênîşander be: *ez ê hingê belaya xwe ji te vekim gava tu perê min didî*. Li vir bi rêya bikaranîna *hingê* û bi bicîkirina lêkera hevoka serekî (*bela jê vekirin*) li para pêşiyê, wateya hevokê safî ye, û reng e gelek ji formûlasyoneke wiha ya beramber hevokên aloz ên li jorê baştir be: *ez ê belaya xwe gava tu perê min didî ji te vekim*. Heke em bi heman têgihiştinê li hevoka (39a) binihêrin, dîsa li me me'lûm dibe ku ji perspektîfa xwînerê ve gelek zehmet e mirov demûdest bizane ka *derket holê* li dawiya hevokê divê çawa bê tefsîrkirin, lewre lêker li dawiya hevokê hilawistî maye. Lê heke em wê mîna zimanê axiftinê rêk bixin, wek di (39b) de, wate gelek yeksertir tê veguhastin û xwîner hevokê bêyî aliqîn dibe serî.

(39) a. Tam di hîna [ku hew baweriya min pê dihat cîhan bi lehengên ku ji qelemên nivîskaran derketine tijî ye] **derket holê ev yek**. (r. 156)

b. Tam di wê hînê de **derket ev yek** [gava ku hew baweriya min pê dihat ku cîhan tijî ye bi lehengên ji qelemên nivîskaran derketî].

### 4.4.3 Cihê lêkera "bûn"ê di hevokên têkel de

Weku berdewamiya behsa her du jêrbeşên li jorê, bicîkirina lêkera "bûn"ê jî gelek caran xwe dispêre kopîkirina qaîdeyên binyadî yên zimanê tirkî. Weku me bi çendîn helkeftan bal kêşayê, zimanê tirkî xwedanê wan îmkanan e ku hevokên navdêrî yên aloz û dirêj saz bike (bn. *binlerce insan arasında herkesten önce dikattimi çeken kişi*) û wan hevokên navdêrî li cihê/pozîsyona hêmanên sade (bn. *odun*) bi cî bike. Lewma di hevokên bi lêkera *olmak* "bûn" têne duristkirin, lêker li dawiya hevokê tê, çi li pişt hêmaneke sade (bn. *o bir odun**du***), çi li pişt hevokeke navdêrî ya aloz (bn. *binlerce insan arasında herkesten önce dikattimi çeken kişiy**di***).

Lê belê, bi kurdî, û bi zimanên din ên îranî, bikaranînên wiha ne mumkîn in, ji ber ku hevokên bestî piranî bi lêkerên serfkirî têne duristkirin (anku hevokên asayî ne, ne hevokên navdêrî). Lewma lêkera "bûn"ê ya kurdî

nabe li dawiya hevokeke bestî ya bi lêkereke serfkirî were bicîkirin; "bûn", ji tebîetê xwe ve, bes dikare bibe lêkera elementên navdêrî, û ev yek bi îngilîzî (*to be* an *am-is-are*) û bi hemû zimanan wisa ye –ku lewma carinan ji hevokên bi lêkera "bûn"ê avabûyî re dibêjin *hevokên bêlêker*.

Lê belê, danîna serfa "bûn"ê li pey hevokeke bestî ya bi lêkereke serfkirî gelek berbelav e di *Otobês*ê de, lê herwiha bi taybetî di zimanê rojnamevaniya kurmancî de yê ku bêtir li ser wergera ji tirkî ava bûye. Bo nimûne, hevok (40a) yeka wisa ye ku tê de dema borî ya lêkera "bûn"ê (*bû*) li pey hevokeke bestî tê ku bi lêkereke serfkirî (*diket*) hatiye avakirin. Di tirkiya vê hevokê de (40b), bicîkirina serfa lêkera *olmak* 'bûn' *(-di)* li dawiyê, li pişt hevoka bestî, mumkîn e û ya durist e, ji ber ku hevoka bestî ji lêkereke navdêrî *(çeken*) ava bûye, anku hevokeke navdêrî ye û lêkera "bûn"ê dikare li dû hemû elementên navdêrî were. Ne zehmet e mirov bibîne ku li vir jî her modêl û mastereya sentaksa tirkî hatiye kopîkirin û li gewdeyê kurmanciyê hatiye werkirin.

(40) a. Êdî di nava bi hezaran kesî de [[yê ku pêşî bala min pê *diket*] **bû**], (...) (r. 86)

b. 'Artik binlerce insan arasında [[ilk dikkatimi *çeken* kişi]y**di**], (...)'

Bi heman rengî, serfa dema niha ya lêkera "bûn"ê li gor kesê sêyem ê yekjimar (*ye*), di hevok (41a) de li dawiyê, li pey hevokeke/lêkereke asayî serfkirî (ne navdêrî) tê. Ji ber heman egerên me li jorê behs kirîn, ev hevok jî bo binyadê xwe dûrî kurdiyê û nêzîkî tirkiyê ye.

(41) a. Erebe (...), [hê di ber vê peyarêka [ku darên stûr ew bi tevayî *vegirtiye* de] **ye**]. (r. 103)

b. 'Araba (...), [hala a şu [kalın ağaçların tamamen *kapladığı*] kaldırımın önünde**dir**].'

Lê belê, mîna hemû babetên me tehlîl kirî, ev awayê bikaranîna lêkera bûnê di nivîsevaniya kurmancî de gelek berbelav e. Bo nimûne, hevoka di (42a) de, ku ji gotareke rexneyî (Çira 2012) ya li ser zimanê romaneke bi kurmancî ye, lêkera bûnê li dû lêkereke serfkirî/kêşayî bi cî dike, helbet ji ber întibaya ji binyadê hevoka bi tirkî (42b).

(42) a. Tiştê ku vedibêje, hema hema gişt [tiştên [**ku** em wan bi awayekî dizanin] ***in*]**.

b. Anlattığı şey, hemen hemen tümüyle [[bir şekilde bildiğimiz şeyler]***dir*]**.

Ev hevok hemû dibe bi vegera ber bi rehên kurdiya axiftinê, anku bi fealkirina rêkar û modêlên ku di nav zimanî de hene çareser dibin. Bi ya me formûlasyonên di hevokên (43) de xeletiya van her sê hevokên jorê sererast dikin, ji ber ku lêkera "bûn"ê bi rengekî sîstematîk li dû elementên navdêrî tê, anku berî lêkera "bûn"ê lêkereke serfkirî nîne û hevoka bestî ya bi lêkera serfkirî li pey lêkera "bûn"ê tê.

(43) a. Êdî di nava bi hezaran kesî de [ew **bû** [yê ku pêşî bala min pê *diket*]].

b1. Erebe (...), [hê di ber vê peyarêkê de **ye** [ku darên stûr ew bi tevayî *vegirtiye*]].

b2. Erebe (...), [hê di ber vê peyarêka [bi darên stûr *vegirtî*] de **ye**].

c. Tiştê ku vedibêje, hema hema gişt [ew tişt ***in*** [**ku** em bi awayekî dizanin]].

## 5. Encam û xulase

Armanca vê xebatê, ku nisbeten dirêj û aloz derhat, ew bû ku dakeve nav pêvajoyên psîkolenguîstîk ên nivîsevaniya bi repertûarên pirzimanî di peywenda edebiyata hevçerx a kurmancî de. Bêguman, ji ber rewşa

ziman û civaka kurdî ya civakî-siyasî, nivîsevaniya edebî, wek beşekî afirandina hunerî bi giştî, dê xwedanê karakter û taybetiyên xweser be. Lewma, herçend arezûyeke cezzab be ku vekoler bi têgehên gewre û ezmûnên ji lîteratûra rewtên cuda yên teoriya edebî û stîlîstîkê dest bavêje nirxandina berhemên kurdî û meydana edebiyata kurdî –ku mixabin heta niha zêdetir ya duyem hatiye kirin–, em bawer dikin ku heta ku xwendinên wird *(close reading)* nebin li ser naverok û layenên zimanî yên berhemên kurdî, qenaet û encamên têne pêşxistin û berbelav dibin dê bes sepandina têgehên gewre be li ser meydana kurdiyê, ku boçûn û encamên wisa, bêguman, hem dê pir kêm raveker bin ji bo baştir têgihiştina taybetiyên xweser ên meydana kurdiyê, hem jî, bi rengê gihiştina bi qenaetên kurtebirr, dê derbeke kêmker li bergeh û asoya wan diyarde û hûrdekariyan bidin ku tê heye ji xweseriya meydana kurdiyê zabin û bizên. Ji ber vê hindê, di vê xebatê de, tevî rîska bêcirrî û çîrdirêjiyê, me perspektîfeke *ji diyardeyê-ber bi têgehê* da ber xwe: têgeh û têgihiştinên heyî, ku me bi dûdirêjî rave kirin, ji bo rave û tehlîlkirina diyardeyên zimanî û edebî ne, ne diyardeyên zimanî û edebî ji bo selimandina têgeh û têgihiştinên heyî. Ji nirxandinên li jorê çend qenaet derdikevin sebaret bi pêvajoya afirandina berhema edebiyata kurdî û meydana kurdiyê bi giştî, ku em dê wan li xwarê bi çend hevokan bidin hev.

Têgihiştina berbelav ji *rêziman*ê di rexnegiriya kurdî de têgihiştineke teng e, rêzimaneke yekreng û bi piranî tayînkirî pêş dibîne, ku bêguman ew cure têgihiştin ji bo paşeroja ziman û edebiyatê xeter in, lewre rê û dirbên geşedan û kemilîna zimanî teng dikin. Bêkêriya boçûnên otorîter li ser reng û rûyê zimanî di edebiyatê de gelek beloqtir dibe, lew li dijî cewherê edeb û poetîkayê ne, ku weku Claude Regyê yek ji pispor û tetbîqkerên herî mezin ên şanoya frensî ya hevçerx dibêje, “axirî, tişta ku şa’ir dike her ‘xirab’kirina normên zimanî ye”. Têgihiştineke çêtir ji “rêziman”ê dê ferqê bixe navbera rêzimana zimanê standard ê kurmanciyê (anku normên zimanî yên danayî) û rêzimana kurmanciyê bi rengekî giştî û dê guherîn/varyasyona navxweyî ya zimanî wek kereste û sermiyanê edebiyateke cihêreng û vehewîner bibîne.

Weku di xebateke me ya pêştir de li ser romana *Otobês*ê (Xakî 2014) bi dûvedirêjî hatiye behskirin, *Otobês*, ji tevn û teknîka xwe ya qisetê/vegotinê ve, berhemek e ku lap dikeve ser kelepor û paşxaneya berhemên ku kêşedar in bi zimanên heyî re, anku *a priori* berhemek e ku bikare hemerengî û bêhidûdiya derbirrîna takekesî di cismê karakterên xwe de berceste bike. Tevliheviya hişê karakterên *Otobês*ê bi hemû bêserûberiya xwe di asta fikrî de hatiye nimandin, lê belê, zimanê ku karakter pê diaxivin ji rexê nivîserî ve hatiye tayînkirin. Anku, çarçoveya fikrî ya ku di ziman de berceste dibe, cihêrengiya derûnî û fikrî ya karakteran baş temsîl dike, lê belê, keresteyê zimanî, anku peyv û hevokên berhemê, carinan dûr in ji yên ku dê ji devê wan karakteran derkevin. Di rewşa heyî ya edebiyata kurdî de nivîserên berhemên edebî heta dereceyekê xwe mecbûr dizanin pêşengiyê li berfirehkirina îmkanên zimanî yên derbirrînê bikin. Di hindek haletên din de mecbûr in xwe bispêrine zimanekî îdealîzekirî, lewre carinan karakterê berhemê di peywendên wisa de ye ku tê de normên bikaranîna kurdiyê li ti kesî me’lûm nînin. Di wan haletan de ku pêwendiyeke yekser nîne di navbera cîhana karakter û cîhanên nas û berdest ên zimanê kurdî li Tirkiyeyê, nivîskarê *Otobês*ê xwe spartiye têgihiştina xwe ya ji zimanî, anku “zimanê xwe” li karakteran ferz kiriye. Lê repertûara zimanî ya nivîskarî, mîna zimanê hemû nivîskarên kurdiyê û belku mîna zimanê hemû axêverên kurdiyê yên li mekteban an jî di nav hiyerarşiyên zimanî yên li dora kurdiyê fêrî zimanê tirkî bûne, herwiha ji rêzimana tirkî (û ziman û şêwezarine din) pêk tê. Di hengava tayînkirina zimanî de, bêguman, bi qasî kurdiyê, zimanê tirkî jî çalak e di repertûara nivîserî de. Ev yek xwe di bêjeyan *(utterance)* de, an jî bi giştî di îcraya zimanî *(performance)* de bi rengê qalib û binyad û heykelê rêzimanî nîşan dide ku derveyî qaîdeyên heyî û potansiyel ên “rêziman”a “kurmanciyê” –ne ya kurmanciya standard– û zimanên hevreh û nêzîk in. Me ew averêbûnên rêzimanî li jêr hejmareke babetan, tevî paşxaneya wan a zimannasî, tehlîl kirin. Me dît ku, di asta hevoksaziyê de, binyadê zimanê tirkî, an jî meylên tîpolojîk ên zimanê tirkî, qet nebe di 6 xalan de, bi rengê kopîkirina modêla binyadê rêzimana zimanê tirkî têne ber çavan. Anku zimanê tirkî heta dereceyeke bilind diyarker e di qonaxa afirandina *Otobês*ê de, ku ev yek berhemê û xwînerên wê bi rengekî dike tabi’ên zimanê tirkî.

Bêguman ev diyardeyên teşxîskirî heta dereceyekê taybetiyeke berbelav a meydana nivîsevaniya kurdî ye, ne diyardeyeke tak û mexsûs bi berhema navhatî –ku jixwe ev yek bi nimûneyên analojîk ên ji meydana nivîsevaniya kurdî hate selmandin. Di nimûneya *Otobês*ê de, berbelaviya tesîr û dexaleta rêzimana tirkî, ji ber tebîetê qiseta romanê hinek normaltir e, lewre berhemek e ku ji qiseta çavdêrî û hizirînên navxweyî

(întrospektîf - *introspective*) yên karakteran pêk tê. Ev ne şêwazeke zêde-ceribandî ye di edebiyata kurdî de; lewma, mirov dikare van pirsgirêkên zimanî û vegotinî yên *Otobês*ê wek qolincên hewla duristkirina vê şêwaza nû jî bibîne.

Herwiha, heman meyla duseriya rêzimanî û levqelibînên berbelav di gelek zimanên din ên wek kurdiyê de jî têne dîtin. Ji ber vê yekê ye ku Gardy (1996: 277), ku bêtir ji rewşa zimanê oksîtanî li Frensayê bi rê dikeve, ji bo *nivîsevaniya duzimanî* dibêje, "ew zîgzaga di navbera du zimanan, du sîstemên bikaranînê de, ew axiftin û ew nivîsîna li wê beynê, li wê navbera-duyan"; di demekê de ku Edouard Glissant (1996: 40), teorîsyenê lîteratûra post-kolonyal û nivîskarê duzimanî, dibêje, "êdî ez nema dikarim bi rengekî yekzimanî binivîsim." Lewma, wek me di vê gotarê de bi çendîn helkeftan cext lê kir, jixwe ne mumkîn e nivîskarê kurd ji xisletê aloz û heterojen ê repertûara xwe ya zimanî rizgar be; lê belê, kêşe û girêk di wê hindê de ye ka –bi taybetî di wan berheman de ku bi nûxwaziya xwe qesta ezmûn û peywendên wêdeyî heyiyên zimanê heyî dikin– nivîskar elementên repertûara xwe ya aloz çawa dadipale û ka cehdeke çend serkeftî dibe serî li dijî dawa wergerandina mekanîk a wan hemû peywend û pêwendiyên ku heye nû bin ji bo nivîsevaniya kurdî. Bi ya me –bila nebe giştîkirineke kurtebirr–, ji layê zimanî ve, *Otobês*ê kariye rêberiyeke serkeftî bike ji nivîsevaniya kurdî re bi saya muameleya xwe ya xweser bi zimanî re û hewla xwe ya dahûrandina lehzeyan di qalibê qiseteke tîr û aloz de, lê belê, kêşeyên ji tesîr û dexaleta giran û zêdebar a zimanê tirkî û keyfiyeta hevoksaziyê di heman demê de rîsk û arîşeyên heyî û potansiyel ên nivîsevaniya edebî ya kurdî li me aşkera dikin. Tevî vê, wek xulase, divê em li vir diyar bikin ku tehlîla zimannasî ya berhemên edebî heta dereceyeke bilind di nav çarçoveya "nirxandinên zimanî" de dimîne, zêde ne xwedangotin e li ser aliyên edebî yên berhemê; lewma *Otobês*, wek berhemeke ceribî û xwedanê çendîn rehendên xwe yên ji aliyê qisetnasiyê ve xweser, hêja ye di çarçoveya tehlîlên edebî de bi berfirehî bê nirxandin.

**Çavkanî**


Aikhenvald Y. Alexandra. 2007. Grammars in contact: A cross-linguistic perspective. Tê de: Aikhenvald Y. Alexandra û W. Dixon (ed.) *Grammars in contact: A cross linguistic typology* (1-54). New York: Oxford University Press.

Aydogan, Mistefa. 2012. *Rêbera rastnivîsa kurmancî.* Stenbol: Rûpel.

Bakhtine, Mikhail. 1981. *The dialogic imagination: Four essays.* Austen: University of Texas Press.

Chomsky, Noam. 1988. *Language and problems of knowledge*. Cambridge, Mass.: MIT Press.

Çira, Sadedîn. 2012. Remezan Alan "Saturn". *Çirûsk* 15, 9–13.

Edouard, Glissant. 1996. *Introduction à une poétique du divers.* Paris: Gallimard.

Eroğlu, Yunus. 2010. *Otobês*. Amed: Lîs.

Fowler, Roger. 1966. Linguistics, stylistics; criticism? *Lingua* 16, 153–165.

Gardy, Philippe. 1996. *L'écriture occitane contemporaine. Une quête des mots.* Paris: L'Harmattan.

Göksel, Aslı û Celia Kerslake. 2005. *Turkish: A comprehensive grammar.* London: Routledge.

Haig, Geoffrey. 2002. The corpus of contemporary Kurdish newspaper texts. Serekaniya înternetî berdest e li ser: http://ikarus.pclab-phil.uni-kiel.de/daten/Sprachwiss/CCKNT.htm (Têketin: 15ê îlona 2013an)

Matras, Yaron. 2007. Contact, connectivity and language evolution. Tê de: Rehbein, Jochen, Christiane Hohenstein û Lukas Pietsch (ed.) *Connectivity in grammar and discourse* (51–75). Amsterdam: John Benjamins.

Mo'temedîn, Behmen. 2001. *Şenlê bozorg*. Tehran: Neşrê Çeşme.

Myers-Scotton, Carol 1998. Marked grammatical structures: communicating intentionality in the *Great Gatsby* and *As I Lay Dying*. Tê de : Carol Myers-Scotton (ed.), *Codes and consequences: Choosing linguistic varieties* (62–88). New York: Oxford University Press.


www.arsivakurd.org

Myers-Scotton, Carol. 2003. What lies beneath: Split (mixed) languages as contact phenomena. Tê de: Matras, Yaron û Peter Bakker (ed.) *The mixed language debate: Theoretical and empirical advances* (73–106). Berlin: Mouton de Gruyter.

Nehayî, Eta. 2010. *Gullî şorran*. Qom/Ghom: Setare.

Nemir, Kawa. 2012. *Çavdêriyên barbarekî*. Amed: Lîs.

Öpengin, Ergin. 2006. Refleksîf di kurmanci de. *Bîr* 4, 106–112.

Öpengin, Ergin. 2008. Qalib û modêlên kod-qelabtinê di zimanê kurdî de û rewşa kontakta zimanî ya kurdî-tirkî. *Zend* zivistan 2008, 67–76.

Öpengin, Ergin. 2011. *Rewşa kurdî ya sosyolenguîstîk li Tirkiyeyê*. Stenbol: Avesta.

Özmen, Şener. 2010. *Pêşbaziya çîrokên neqediyayî*. Amed: Lîs.

Pinker, Steven. 1994. *The language instinct.* New York: Harper.

Schwartz, E. 1970. Notes on Linguistics and Literature. *College English* 32(2), 184–190.

Xakî, Gurgîn. 2014. Qiset û şiûra zimanî di *Otobês*a Yunus Eroğlu de. *Wêje û Rexne* 1, 28–38.

# ZIMAN Û ÇANDE[87]

**George Yule**

**ji inglîzî: Dilyar Amûdî**



*wêne: wergêr Dilyar Amûdî*

Quaker an jî komeleya hevalan qebûl nake ku mirov peyva "hûn: you" wek awayekî rêzgirtinê bi kar bîne lê "tu; thou" tercîh dike ku ew jî jidilî û wekheviyê nîşan dide. ber bikarnehanîna peyva "you" wek awayekî rêzgirtinê, kesên dî ev reftara wan wek bêrêzî nirxand û bû sedema dûrketinê. Encamên tiştên wisa ne jirêzê gelek caran ji bo hin Quakeran giran bûn wek gava ku Richard Davis ku qala meseleyeke xwe kir gava bangî bermaliyekê kir û got "thou" bê çawa jinikê rahişt darekî û di serê wî yê rût de lêxist û serê wî bi awayekî xerab werimand. Gelekî hêrs bûbû û heta sûnd xwar ku dê wî bikuje." Romaine (2000)

### Çande

Em hemû raman û qebûlên derbarê surişta tişt û mirovan de ku mirov hîn dibe gava ku dibe endamê komên civakî, wek **çande**yê bi nav dikin. Herwiha em dikarin wê wek "zanîna bi civakîbûnê tê bidestxistin" jî binasînin. Ev zanînên wisa yên wek zimanê mirovî yê pêşî, bê ku mirov hay ji xwe hebe hîn dibe anku hayê mirovî ji çandeya wê çêdibe tenê piştî ku zimanê wî bi pêş ve diçe. Zimanekî ku em di rêya pêvajoya guhestina çandeyî de hîn dibin, bi kêmasî di destpêkê de, pergaleke amadekirî dide me û ew pergal ji bo kategorîzekirinê dinyaya derdora me û serpêhatiyên me pê re hatiye amadekirin.

[87] Ji pirtûka "The Study of Language" hatiye wergirtin û wergerandin.

Bi peyvên ku em hîn dibin re, em hîn dibin bê çawa cûreyên kategoriyên cuda yên bi cîhana me ya civakî ve girêdayî ne, re jî binasin. Dibe ku zarokên gelekî biçûk *kûçik* û *hesp* wek du hebûnên cuda nefikirin û herduyan wek *eww-wew* bibînin. Her ku hîn di çandeyên Pasîfîkê de, hesp tune tune bûn û ew jî bi awayekî asayî dibû sedem ku peyvek ji bo wî jî tune be

**Kategorî**

Li gel ku em dizanin ku gelek cûreyên kûçikan hene jî lê dîsa jî ji ber ku giş endamên kategoriyekê ne, em bi piranî peyva "kûçik" ji bo hemûyan dibêjin. **Kategorî** komek e ku ji taybetmendiyên hevpar pêk tê û herwiha em dikarin peyvên zimanî yên ku em hîn dibin jî wek komeke mîrasê ya kategoriyên nîşankirî bihesibînin. Ev peyv ew peyv in yên ku ji bo nîşandana konsepta civaka me likar in û pêwîst in ta ku bikarin bi awayekî asayî biaxivin.

Baweriyek heye ku pêwendiyeke sabit di navbera koma peyvên ku em hîn bûne (Kategoriyên me)û awayê ku rastiya derveyî pê hatiye hatiye organîzekirin de heye. Lê belê berjengên cîhana derveyî wisa diyar dikin ku oragnîzasyona cîhana derveyî heta astekê li gorî zimanê ku pê derbarê wê de dihê axiftin, tê kirin. Reng e ku hinek ziman gelek peyvên cuda ji bo şêweyên "baran"ê an jî cûreyên "gûza hindê" hebin lê hin zimanên din belkî peyvek an du peyv tenê hebin. Li gel ku Daniyên Gîneya Nû hemû rengên şebengê [88]dibînin jî lê navên duduyan tenê ji wan bi kar tînin, ew jî hevberên "reş" û "spî" ne. Inûtiyên Grînlendê li gel van herdû navan, sor, kesk û zer jî hene. Dı Ingilîzî de jî navên van her pênc rengan hene û herwiha û çend rengên din wek şîn, qehweyî, mor, pembeyî, pirteqalî û gewr jî hene. Wisa diyar dibe ku zimanê ku ji aliyê kesên xwedan teknolojiyeke pêşkevtî ve tê bikaranîn zêdetir têgehên rengên wan hene. Gava mirov bala xwe bide cudahiya têgehên rengên bingehîn di zimanan de dê bibîne ku di hin zimanan de cudahiyeke têgehî/ramanî heye ku hatiye **sazkirin** (anku bi yek peyvê hatiye nimandin) lê di hin zimanên din de tune.

[88] Danî rengan dabeşî du kategoriyan dikin, **Tarî** û **Vekirî** wek mînak: kesk tarî ye û zer vekirî ye.(T.W)

**Têgehên xizmatiyê**

Zelaltirîn mînakên kategoriya sazkirina peyvên nû ew peyv in yên ku ji bo nimandina endamên malbatekê tên bikaranîn yan **têgehên xizmatiyê.** Di her zimanê de têgehên xizmatiyê hene(mînak: bira, dê, dapîr) lê giş endamên malbatê bi heman awayî kategorîze nakin. Di hin zimanan de peyva *bav* ne tenê ji "bavê biyolojîk" tê bikaranîn lê herwiha ji bo "birayên bavê biyolojîk" jî tê bikaranîn. Di Kurdî de em peyva "Ap/mam" ji bo wan kesan bi kar tînin[89]. Me du peyvên cuda ji bo herdû konseptan saz kirine. Lê dîsa jî zimanê Ingilîzî peyva "Uncle" ji bo birayê dayikê jî bi kar tîne. Ev cudahî di zimanê ingilîzî de bi peyvên cuda nehatiye destnîşankirin lê zimanin din hene ku ev cudahiya hatiye destnîşankirin lê di hin zimanên din de hene. Wek zimanê Watamê (zimanê Papuaya Gîneya Nû) dê peyva Ingilîzî *Uncle*(Birayê bavî) wek *aes* bê wergerandin û *uncle* (birayê dayikê) wek akwae bê wergerandin. Axiverên Mopa Maya(Li Belzie, Amerîka Navendî) van peyvan li ser bingehê cudatir durist dike. Ev peyvên li jêrê wergera peyva Ingilîzî *uncle* in(û ne wisa ne jî)

suku'un: Birayê mezin û birayê dê û bavî yê ciwantir

tataa':Birayê mezin yê dê û bavî û bapîr

Wisa diyar e ku cudahiya temenî di navbera "xal/ap"î de di zimanê Mopayî de giring e. Cudahiyên dî jî di navbera xizman de dibe ku di zimanên cîhanê de bi awayin cuda bên ravekirin.Cudahiya di navbera dapîra ku dêya dayikê ye û ya dapîra ku dêya bavî ye, di zimanê norwecî de wek farmor(dêya dayikê) û mormor(dêya bavî) tên gotin lê di kurdî de ji bo herduyan peyva "dapîr" li kar e[90].

**Konsepta demê**

[89] di teksta orjînal ya wergerê de dibêje ku di ingilîzî de peyva "uncle" tê bikaranîn ku ew jî him ji bo xal û him ji bo ap tê bikaranîn belê ji bo xwendevan çêtir li ber keve, min zimanê kurdî bi kar anî.

[90] Di teksta orjînal behsa peyva ingilîzî *grandmother* dike lê me got bila ya kurdî be ji bo hêsankirina têgihiştinê



www.arsivakurd.org

Em li mînakeke hinekî razbertir binerin, gava ku em di zimanê ingilîzî de peyvên *week*(hefte) û *weekend*[91](dawiya hefteyê) bi kar tînin, ew bi xwe em konsepteke mîratmayî bi kar tînin ta ku behsa mêjera demê di kategoriyên hevpar de bikin. Hebûna yekeyan ji bo nimandina “du rojan” an jî “hefte rojan” nîşan dide ku em demê(ku tiştekî razber) wek tiştekî pîvanbar dibînin û têgehên navdêrî ji bo “du mirov” an jî “heft pirtûk”(ku tiştine fîzîkî ne) bi kar tînin. Lê di nerîna beşin din ji dinyayê dibe ku dem bi vî awayî neyê dîtin. Di zimanê Hîtî de yê ku li Arizonayê tê axiftin, bi awayekî teqlîdî ti têgeh tune bûn ku bikarin peyvên pergala dema me û herwiha têgehên (du saet, sih deqîqe) binimînin, ji ber ku têgehên me konseptên çandeya me ya li ser “demjimêr”ê ava bûye derdibirre. Belkî ji ber wê jî yekeyek ji bo “heft rojan” tune bû, herwiha ne hefte bebû ne jî şemî û yekşem hebûn. “Dawiya hefteyê” jî tune bû.

## Nisbiyeta zimanî

Di van mînakan de me cudahiyên zimanan wek berjeng hesiband bo awayê ku em pê behsa rastiyên derveyî dikin. Ev bi piranî di bin têgeha **nisbiyeta zimanî** tê nîqaşkirin ji ber ku wisa diyar e ku pêkhateyên zimanê em pê diaxivin û kategoriyên wî yên ji berê ve diyarkirî bandorê dike li awayê ku em pê dinyayê fêm dikin. Şêweyeke qels ya vê ramanê bi awayekî besît vê rastiyê nîşan dide; em ne tenê diaxivin, lê herwiha û bi ihtmaleke mezin em behsa dinyayeke serpêhatiyên jî dikin û ew jî bi bikaranîna kategoriyên ku zimanê me dide me. Teqez e ku zimanê me yê pêşî di çêkirina “fikirîna mutat/hînbûyî” de xwedan roleke sereke ye. Ew jî bê em çawa derbarê tiştên rojane yên jiyana xwe de difikirin bê ku em bizanin bê em çawa li ser difikirin.

Lê şêweyeke xurttir ya vê ramanê heye ku jê re **determînizma zimanî** tê gotin ku dibêje “ziman fikiran diyar dike”. Eger bi rastî jî ziman fikiran diyar dike nexwe em ê tenê bi kategoriyên zimanê me dide me, bikarin bifikirin. Wek mînak ingilîz yek peyvê tenê ji bo *berfê* bi kar tînin û ew jî *snow* ye û herwiha hemû wan tiştikên spî wek hev dibînin. Berevajî vê rewşê û di heman mijarê de li wan tiştikên spî dinerin û hemûyan wek tiştên ji hev cuda dibînin ji ber ku gelek navên *berfê* li ba wan hene. Nexwe ew kategoriyên ku ziman dide mirovî diyar dikin bê axiver çawa dinyayê wergerîne û

[91] Têgeha “dawiya hefteyê” di kurdî de eger hebe jî têgeheke nû ye û li kurdistanê li her beşekî li gorî pergalên serdest tên binavkirin wek mînak ji ber ku li herêmên binxetê “dawiya hefteyê” roja îniyê bû, lew niştecihên wê derê “înî”yê bêtir bi kar tînin bo roja betlaneyê ya dawiya hefteyê.

tecrubeyan derbire. Em ê vegerin ser meseleya *berfê* lê dîsa jî ev danberhev mînakeke baş e bo diryakirina pêwendiya ziman û çandeyê ye.

**Hîpoteza Sapir-Whorf**

Nerîna giştî ya analîtîk ya ku en li ser difikirin di nîvê sedsala bîstan de wek hîpteza Sapir-Whorf derdikeve û wisa tê zanîn. Hîn gava zimannasiya Amerîkayî pisporiya xwe bi xurtî li ser bingehekê şûnwarnasî dikir. Edward Sapir û Benjamin Whorf nîşaşeke nû li ser zimanên Amerîkayê yên neteweyî yên wek Hopî vekir, wisa dibêjin ku wî zimanî hişt ku li dinyayê bi awayekî cuda ji axiverên zimanê Ewrupayî binerin. Ji xwe me berî niha jî gotibû ku di navbera Ingilîzî û Hopî de cudahî di pîvan û vegotina demê de heye. Li gorî nerîna Sapir û Whorfî Hopî dinyayê ji êlên din bi çavekî cudatir dibînin(Êlên ingilîzîaxiv jî tê de) ji ber ku zimanê wan dihêle wisa bifikirin. Di rêzimana Hopî de cudahiyek di navbera "giyandar" û "bêgiyan"î de heye û di navbera kategoriya ku wek komeke giyandar tê zanîn "kevir" û "ewr" jî hene. Whorf dibêje ku Hopî bawer dikin ku "kevir" û "ewr" di hebûnên giyandar in û zimanê wan dihêle ku bi vî tiştî bawer bikin. Zimanê Ingilîzî "kevir" û "ewr"an wek du hebûnên giyandar nîşan nade lew ingilîzî dinyayê wek Hopiyan nabînin. Whorf bi van gotinan fikira xwe raber dike " em suriştê bi sînorên ku zimanê me ji me re xêz kirine dinyayê rave dikin"

Çend nîqaşên û fikirên dijî vê nerînê dîtinê derketine. Simpson(1980)wisa dibêje; ka em bifikirin ku di rêzimana êlekê de zayend hene anku nîşanin taybet ji bo *keçik* an *jin*ê dê hebin û gava em hinekî din ji nêzîk ve li wî zimanî binerin ku nîşanên "mêzayendîtî"yê herwiha ji bo peyvên "kevir" û "derî" jî tên bikaranîn[92], gelo kesên wê êlê neçar dimînin ku fêm bike ku "kevir" û "derî" di hebûnên mê ne, eynê wek "keçik" û "jin"ê? Ev êl ne komeke nepenî ye. Têgehên la femme ("jin"), la pierre

[92] Ji bo çêtir bê fêmkirin miorv dikare li zayenda zimanê kurmancî binere û helbet di kurmancî de "kevir" û "derî" nêr in lê di vir de nivîskar behsa zimanekî din dike ku tê de mê ne.



www.arsivakurd.org

("kevir") and la porte ("derî"). Ev êlek e ku li Fransayê dijî. Lê geloma divê em wisa bifikirin ku frensî "kevir" û "derî" jî wek ku çawa jin mê ye,ew jî wisa mê ne?

Kêşeya serencama ku di herdû rewşên zimanan de (frensî û hopî) de ew e ku tevliheviyek di navbera senifandina zimanî ya ("giyandar" û "mêzayend") û senifandina biyolojîk ya (sax û mê) de heye. Gelek caran di navbera van senifandinan de girêdanek an pêwendiyek heye lê ne şert e jî hebe. Bi ser de jî teşeyên zimanî rê li ber me nagire ku em cudahiyên biyolojîk piştguh bikin. Li gel ku zimanê hopî ji aliyê zimanî ve senifandineke taybet ji bo peyva "kevir" heye jî, ew nayê wê wateyê ku gava ajokarê traktorê bi rê de dimeşe, ditirse ku di ser kevirekî re here û wî kevirî bikuje.

**Berf**

Eger em vegerin ser meseleya "berf"ê ya li cihên sar. Pêwîst e ku em peyva Eskîmoyê bi peyveke deqîqtir biguherînin ku ew jî "inîtûît" e û herwiha zimanê wan "inîtûîtikî". li gorî Mardin(1986), di Inuîtikyê de li Grîndlenda rojavayî, tenê du peyvên bingehîn ji berfê re hene (qanik: berfa ku li hewayê ye, aput: berfa li erdê ye). Ji van herdû peyvan dikarin gelek têgehên din yên girêdayî diyardeya berfê çêkin. Dîsa jî ti sedem tune ne ku bihêlim em bawer bikin ku ev têgeh nerîn û fikirên bikarhênerên xwe kontrol dikin, lê ew mirov e yê ku di serpêhatiyên xwe de difikire û biryarê dide bê dê çi bibêje, ne ziman e.

Zimanê Ingilîzî çend peyv ji bo hin cudahiyên berfê çêkirine, wek mînak *sleet, slush* û *snowflake*[93]. Lê dîsa jî axiverên zimanê ingilîzî dikare xwe hinekî biguherînin ta ku têgehin wek *fresh snow: berfa teze, pwdery snow: berfa hûrik, spring snow: berfa buharî* an jî *ew berfa li qeraxa rêyê* çêke. Belkî ev têgeh axiverên ingilîzî ne lê ev têgeh nehatine **ferhengandin**[94](anku wek peyvekê nehatine çêkirin). Axiverên ingilîzî dikarin cudahiyên kategoriyan destnîşan bikin bi rêya peyvên **ferhengandî** (*peyvên wek slush ne rasterast berf)* lê herwiha dikarin tiştin din jî destnîşan bikin bi rêya peyvên **ne-ferhengandî** *(anku wek yek peyv nayê derbirrîn)* li gel axiverên ingilîzî dikarin gelek peyvên ferhengandî û ne-ferhenganî ji bo berfê bi kar bînin jî lê dîsa jî ew nikarin wek Intukîtiyan li berfê binerin. Wek ku çawa inkûtiyan di jiyana xwe gelek peyv ji bo rewşên "berf"ê çêkirine, Tuvuliyanî(xelkê pasîfîka navendî) gelek têger ji bo "gûza hindistanê" çêkirine. Li Hawayê, di zimanê

[93] *sleet: berfa tevli baranê, slush: berfa li ber-hilandinê, snowflake: heba berfê.*

[94] Ferhengandin: leksîkalizasyon anku "kirin peyv" ku di ingilîzî de wek Lexicalizationê tê zanîn

www.arsivakurd.org

xwecihî de gelek têgeh ji bo cûreyên "baran"ê hene. Berevajî vê wisa diyar e ku di ingilîzî de gelek peyv ji bo "pere"yan hene ji ber zimanê mirovî baldarî û mijûliyên mirovî nîşan didin.

Em zimanê ku ji bo ragihandina agahiyan wek mîrat werdigirin lew divê em bizanin ku ziman dê bandorê dike li awayê ku em bê zanîna xwe organîze dikin.

**Kategoriyên têgihiştînî**

Gava ku em têgihişta an jî awayê ku mirov pê difikirin, analîz dikin, em dikarin li pêkhateyan binerin wek berjeng binerin lê wek sedem. Rastiya ku Hopî pergaleke zimanî ava kirine ku tê de "ewr" giyandar e, tiştekî derbarê baweriya wan ya torreyî an jî derbarê awayê pê dikifikirn de nîşanî me dide û ew jî beşek ji çandeya wan e, ne ya me ye. Di zimanê Yaguyî de yê ku li Perûyê tê axiftin, komek tişt hene ku wek "giyandar" tên binavkirin û ji tişteyên wek "heyv, kevir û ananasan re û herwiha ji mirovan re jî tê gotin. Di torreya Yaguyiyan de ev hebûn hemû wek tişteyên binirx tên hesibandin lew ew konsepta ku wan wek "giyandar" dihesibîne dibe ku bê waateya ku ew "tişteyên xwedan qîmet in" ne ku "giyanê wan heye".

**Diyarker**

Em bi hin nîşaneyên rêzimanî yên ku em wan wek **diyarker** bi nav dikin, dizanin bê çawa peyvan di zimanên wek Yagûyî de bisenifînin. Ev diyarker pêş me dike bê ew peyv di kîjan polê de ye. Wek mînak di zimanê Sawahilî de(zimanekî rojhilatê Afrîkayê), hin pêşgir hene ta ku navdêran bisenifînin ku ji mirovan re (wa-), ji bo ne-mirovan(mi-) ji bo tiştên çêkirî (vi-) wek di peyvên *watoto* (zarok:pirjimar) *mimea*(riwek:pirjimar) *visu*(kêr: pirjimar). Anku diyar e bê çiqasî hêsan e ku mirov bi rêya diyarkeran bikare madeyên xam (*miti:dar)* û madeyên çêkirî *(viti: kursî)* ji hev vavêr bike.

Di zimanê Awustralî yê bi navê Diyrbalî de diyarkerin hene ku nîşan didin ku " zilam, bumberg û kangirû" di heman kategoriya têgihî de ne û peyvên "jin, agir û tiştên xeter" di heman kategoriyeke din ya têgihî de ne. Gava em li baweriyên civakî vedikolin (Roj jina heyvê ye)em dikarin fêm bikin bê çima heyv di hundirê pola yekê de ye û roj du nav ya duyem de ye.

Pêwendiya diyarkeran bi giştî bi hejmaran re heye ta ku şêweya tiştên hejmarbar jî nîşan bide. Eger em li van çend mînakên japonî binerin ku ji aliyê şekilê xwe ve tên diyarkirin "tiştê tenik û dirêj"

(*hon*) û “tiştê tenik û pehn” (*mai*) û “tiştê girover û biçûk” (*ku*):

banana ni-hon (“du mûz”)

syatu ni-mai (“du xaşe”)

ringo ni-ku (“du sêv)

Tiştê herî nêzîk ku di ingilîzî de tê bîra mirovî, bikaranîna diyarkeran gava mirov behsa “yeke”yên tiştekî taybet dike. Cudahî di navbera navdêrên ingilîzî yên hejmarbar(*shirt, word, chair*[95]) û yên ne-hejmarbar(*clothing, information, furniture*[96]) de heye. Li gorî rêzimanî şaş e ku mirov pirtikên *a/an* an jî pirhejmariyê bi peyvên ne-hejmarbar re bi kar bîne, (mînak: *a clothing, *an information, *two furnitures). Di ingilîzî de ji bo ku em bikarin xwe ji bê şaşiya rêzimanî biparêzin em tiştin wek “item of” yan “piece of,” wek di *an item of clothing, a bit of information* û *two pieces of furniture.* Peyvên hevwate di gelek zimanên din de hejmarbar dihesbin, ev jî tê wê wateyê ku hebûna têgiha “nehejmarbar” di ingilîzî nîşana kategorîzekirineke têgihiştinî ye ku têkilîdarî mêjerê ye.

**Kategoriyên Civakî**

Wek berê jî me diyar kiribû ku peyvên wek *ap* û *dapîr* hin mînak li ser **kategoriyên civakî** dan me. Ev kategorî yên dabeşkirina civakî ne ku em bi kar tînin ta ku têkiliya xwe bi yên din re diyar bikin. Em dikarin pênaseyeke teknîk wek “birayê bavî yê nêr” bibêjin lê em gelek caran peyva “ap” ji bo gelek kesên din jî bi kar tînin heta caran ji bo hevalên nêzîk re jî. Herwiha peyva “bira” jî em gelek caran ji bo wan kesan bi kar tînin, ku ne endamê malbata me ne.Em dikarin van peyvan bi awayekî bi kar bînin ku kesan wek endamên komeke civakî nîşan dide.

**Têgehên navnîşanî**

[95] xaşe, peyv, kursî

[96] kinc, agahî, mobîlya



www.arsivakurd.org

Gava zilamek li kolanê ji te bipirse *bira! tu dikarî dolarekî bidî?* peyva *bira* wek têgiheke navnîşanî(peyva an têgeh e ya ku ji bo kesê ku mirov jê re dinivîse an pê re diaxive) tê gotin. Bi vê hewldana bikaranîna têgehên malbatî mirov hewl dide ku hesteke hevkariyê biafirîne( wek ku di heman rewşa civakî de ne) ta ku bikare hinek pere bistîne. Herwiha dikarî bi peyva "*sir*"[97](nîşana cudahiyeke civakî ye) û ji ber ku peyva *sir* xwedan statuyeke bilindtir e, dibe ku hinek pere bide

Belkî nimûneyeke din ya berbelav ya ku newekheviya rewşa civakî nîşan dide ew jî bikaranîna navnîşana "*doktor*" yan jî navnîşan û nav wek "*profesor Buckingham*" ji bo destnîşana rewşeke civakî ya bilindtir, herwiha di rewşên ku statûya civakî kêmtir an nizimtir be, tenê nav tên bikaranîn wek mînak; *Profesor Buckingham, dikarim pirsyarekê bikim? ~ Belê, Jennifer, bipirse?* Têkiliyên bêtir nêzîk û wekhev ên di navbera kesên di heman statûya civakî de, bêtir bi bikaranîna navê pêşî an jî leqeban tê kirin: *Bucky, em hinek qehweya dî vexwim? ~ Spas Jenny.*

Di gelek zimanan de mirov biryarê dide bê kîjan cînavkî bi kar bîne, ew jî li gorî dûrî û nêzîkiya kesê dî. Ev wek **cudakariya T/V**[98] tê nasîn wek ku di frensî de *tu(*nêzîk*) vous(*dûr*)*. Herwiha heman kategorîzekirin di almanî de jî heye *(du/Sie)* û di spanî de jî *(tu´ /Usted)* heye. Di va cudakariyan gişan de, wek ya di ingilîziya kevin de *(thou/you)* ya duduyan nîşan dide ku axiver ne zêde nêzîkî kesê dî ye. Berê, ev teşe bêtir ji bo nîşandana têkiliya hêzî dihat bikaranîn. Kesê xwedan hêzeke zêde dikare ji bo yê xwedan hêza kêmtir re *to/thou* bi kar bîne, lê berejvajiya wê ne wisa ye. Wek ku hat serê Quaker Richard Davisî (di nivîsa destpêkê de). Divê ku kesên xwedan statuyeke nizim "vous yan you" ji bo kesên xwedan statûyên bilind bi kar bînin[99]. Ev şêwe wek rewşeke ne-beramber tê hesibandin lê belê gava ku herdû alî heman cînavkan ji bo hev bi kar bînin wê çaxê rewşeke beramber derdikeve holê ku ev rewş anku bikaranîna *tu* di li Ewrupayê zêde bûye, bi taybetî di navbera xwendekaran de tevî ku hev nanasin jî, ew jî ji ber ku hev di heman statuya civakî de dibînin.

[97] peyveke esilzadetiyê ye ku di kurdî de wek ezbenî dikare were wergerandin.

[98] Têgiheke zimannasiya civakî ye ku ji herdû cînavkên latînî(**t**u û **v**os)

[99] Di kurmancî de ev guherîna cînavkan bi piranî tune lê niha li herêm Kurdistanê yên di bin destên tirkan de hin kes ji ber bandora tirkî di şûna "tu" "hûn" bi kar tînin herwiha berê di koma zimanê kurdî de nîqaşeke wiha çêbûbû; bo agahiyên zêdetir http://dilyaramudi.blogspot.com.tr/2012/05/hinge-and-hingo-belki-ne-herdu-ji-le.html

Di ingilîzî de ji bo mirovên bê navnîşanên taybet, têgihên *Mr., Mrs., Miss,* yan *Ms*[100] .Tenê têgehên ji bo jinan tên bikaranîn hinekî rewşa wê ya civakî nîşan didin. Ya rastî yek ji belavtirîn têgehên navnîşanî yên ku ji bo jinên zewicî tê bikaranîn wek mînak ji bo jinekê( ku jina zilamekî bi navê Frank Smtih be) wisa tê gotin; Xm Smith û heta carinan Xm Frank Smith jî tê gotin. Gava mirov bi çavê pergala resen li meseleyê binere, fêm dike ku jin ji aliyê civakî ve bi zilamî dihatin danasîn, çi jin be çi qîz be. Ev têgehên navnîşanî hîn jî wek kategoriyên civakî tên bikaranîn ta ku jinê bidin nasîn ne zilamî bê ka jin zewicî ye an na. "*Ms"*a ku ji bo jinê tê bikaranîn ji bo ku mirov cudahiyê nexe navbera jina zewicî û ne-zewicî. Ev cudakarî jî bala me dikişîne ser bingehîntirîn kategorîzekirina civakî; ew jî zayend e.

**Peyvên zayendkirî**

Di zimanê Sîdamoyî yê li Etyopyayê tê axaftin, hinek peyv tenê ji aliyê zilaman ve tên gotin û hinek jê jî tenê ji aliyê jinan ve, wek mînak wergera peyva "şîr" eger zilamek bibêje "*ado*" ye lê eger jinek bibêje "*gurda*" ye. Gelek zimanên neteweyî yên Amerîkayê jî wek di zimanên Gros Venter(li Montanayê) û Koasatî (li Louisiana) jî tê gotin ku hin peyv ji bo zilaman in û hinekî din ji bo jinan e. Di japonî de jî gava behsa xwe dikin û "ez" bi kar tînin, zilam bi giştî *boku* û jin jî *watashi* bi kar tînin. Di portegalî de, ji bo peyva spas *obrigado* eger tu zilam bî, û ya *obrigada* eger tu jin bî.

Ev mînak wisa diyar dikin ku di hinek zimanan de peyv li gorî zayenda axiverî tên guhertin, ku ew jî wisa dixuyê wek ku ji bo zilamî "asayî" ye lê ji bo jinê "zêdekirinin taybet" in. Peyvên wek *hero–heroine* yan *actor–actress*[101] diyar dike bê çawa yên jinê ji yên zilamî hatine daraştin. Herwiha ji bo nîşandana van cudahiyên zayendî, di ingilîziya amerîkayî ya nûjen de, peyvên wek *firemen* [102]û *policemen* bi peyvên wek *firefighter* û *police officer* ve hatin guhertin. Lê dîsa jî hîn meyleke xurt heye ku formên zilaman bi awayekî giştîtir bi kar bînin wek (*his:wî*[103]*)* wek di hevoka "*Each student*

[100] Di kurdî Mr: Br e ku kurtkirina peyva ***birêz*** e. Mrs:Xm; **Xanim,** Miss:((di ferhengan de nedît) Ms: herwiha ew jî.

[101] Hero: lehengê mêr, heroine: lehenga jin, actor: lîstikvanê mêr, acrtess: lîstikvana jin.

[102] firemen: agirkuj, policemen: polîs(lê di vir de "men" nîşana zilamî ye lew bûye police officer: karmendê polîs û herwiha fireman jî bûye firefighter

[103] Di kurmancî de jî bi giştî gava ku mirov behsa kesan bi giştî dike(li gel ku ew kes dibe ku nêr be yan jî mê be) bi giştî cînavkên nêr bi kar tîne tevî ku di dema dawî de hin nivîskar forma " wî/wê" bi kar tînin lê di nerîna min de forma giştî bi nêr be dê çêtir be, ji bo hêsankirina xwendinê û herwiha ji ber ku ji berê ve di zimanî de wisa bû.

*is required to buy his own dictionary"*[104]. Lê dîsa jî altenatîvên wek (his or her)[105] an jî carinan "their: wan" zêdetir dibin. Herwiha têgehin din jî hene wek *career woman* [106]û *working mother*[107] jî hîn hene lê altenatîvên wan ji bo zilaman tune ne anku "*career man"* an "*working father"* tune ne.

www.arsivakurd.org

[104] Divê her xwendekarek ferhenga xwe bi xwe re bîne: lê di hevoka ingilîzî de "his" tê bikaranîn ku ew jî bi giştî nîşana kesê nêrzayend e.

[105] Wî yan wê: wek ku di nîşeya 16an de me gotiye bê çawa hin nivîskarên kurmancî jî heman formê bi kar tînin

[106] jina ku giringiyeke zêde dide kar û pîşesaziya xwe

[107] jina ku li gel ku xwedî zarok e û dê ye, lê dîsa jî dixebite.

## Kî û kê[108]

Berevajî ku hin caran bi şaşî tê texmînkirin, “kê” ne forma mê ya cînavê “kî” ye. Anku “kî” ne bo nêran (mêran) û “kê” jî bo mêyan (jinan) tenê tê bikaranîn.

“Kî” pirsek e ku dikare bi “Ez, tu, ew, em hûn, Jiyan, Hesen” were bersivdan:

- Kî mamoste ye? - Ew mamoste ye.
- Kî dibêje? - Ez dibêjim.
- Kî hatin? - Em hatin
- Kî keça Hesen(î y)e? - Jiyan keça Hesen(î y) e.

“Kê” forma tewandî ya „kî“ ye, wek çawa ku „min“ forma tewandî ya cînavê “ez” e:

- Kê got? - Min got.
- Kê Hesen dîtiye? - Jiyanê Hesen dîtiye.
- Jiyan keça kê ye? - Jiyan keça Hesen(î y)e.

## Ravek di kirmanckî de

[108] Di soranî de tenê ”kê” heye ji ber ku di soranî de tenê formeke cînavan heye: ”min” heye lê ”ez” nîne, ”to” (hevbera ”tu” ya kurmancî) heye lê ”te” nîne…



www.arsivakurd.org

***Hasan Aslan***

Li ser rêzimana kurdiya kirmanckî (dimilî) xebatên bi kurdiya kurmancî hatine kirin kêm in, jixwe xebatên ku bi zimanên din jî kêm in. Eger zaraveyên kurdî bi zaraveyên din bên hînkirin, hînbûn hêsantir û rasttir dibe lewma armanc ji vê xebatê jî ew e ku rêzimana kirmanckî bi zaraveyê din, bi kurmancî bê hînkirin. Hêvî dikim bo zaraveyên din jî bi vî awayî xebat bên kirin. Bawer dikim ev xebat dê berdewam be û mijarên din jî di her hejmara vê kovarê de bên weşandin.

Di vê nivîsê de min bi mînakan behsa “Ravek”an kir ku armanc hînkirina rêbazên bingehîn bû. Helbet ne bêeger û bêkêmasî ye, ku we kêmasî dîtin, ji kerema xwe hayê min jê çêkin da ku di hejmara bê de serast bikim.

## Raveka Navdêran

Di kirmanckiyê de di dawiya pirraniya peyvên mê de tîpa –e heye, ev tîp di hin rewşan de dikeve, yek ji van rewşan jî ew e, dema ku ravek tê çêkirin. Di ravekê de eger peyva mê raveber be –e’ya ku di dawiyê de ye dikeve.

*Mînak:*

kênekE (m): Keç/keçik

kênekA mi: keçika min

Şaş e ku meriv (kênekeya mi) binivîse.

Di kirmanckiyê de berevajî kurmanciyê, di rewşa xwerû de qertafa pirrjimariyê heye û ew qertaf "–î" ye, ango peyv bi qertafa –î’yê dibin pirjimar, bo mînak; kênekî: keçik (pirrj). Wekî –e’ya peyvên mê, qertafa pirrjimariyê jî di ravekê de raveber yan raveker be dikeve.

*Mînak:*

kênekî (pirrj): keçik, merdimi (pirrj): meriv
kênekÊ merdimAN: keçikên merivan
Şaş e ku meriv (kênekîyê merdimîyan) binivîse.

**Rêbazên ravekê:**

- **nêr + nêr: Raveber+ê Raveker+î**
    - dest (n): dest, Azad: navê lawikan; dest+ê Azad+î → destê Azadî: *destê Azadî*
    - ber (n): derî, keye (n): mal; ber+ê keye+yî → berê keyeyî: *deriyê malê*

Wek ku tê dîtin, tewandina/çemandina navdêrên nêr bi "î"yê pêk tê.

- **nêr + mê: Raveber+ê Raveker**
    - dest (n): dest, Roşna: navê keçikan; dest+ê Roşna → destê Roşna: *destê Roşnayê*
    - por (n): por, kêneke (m): keçik; por+ê kêneke → porê kêneke: *porê keçikê*

Wek ku tê dîtin navdêrên mê di tewandinê/çemandinê de ti qertafan nagirin.

- **nêr + pirrjimar: Raveber+ê Raveker+an**
    - welat (n): welat, kurdî (pirrj): kurd; welat+ê kurd+an → welatê kurdan: *welatê kurdan*
    - keye (n): mal, embazî (pirrj): heval; keye+yê embaz+an → keyeyê embazan: *mala hevalan*

Wekku tê dîtin tewandin/çemandina pirjimarî wek ku kurmancî bi "an"ê tê kirin.

- **mê + nêr: Raveber+a Raveker+î**
    - linge (m): ling, Azad: navê lawikan; ling+a Azad+î → linga Azadî: *lingê Azadî*
    - kêneke (m): keçik, camêrd (n): camêr; kênek+a camêrd+î → kêneka camêrdî: *keçika camêrî*
- **mê + mê: Raveber+a Raveker**
    - linge (m): ling, Roşna: navê keçikan; ling+a Roşna → linga Roşna: *lingê Roşnayê*
    - qeleme (m): qelem, embaze (m): heval (mê); qelem+a embaze → qelema embaze: *qelema hevalê*

www.arsivakurd.org

- **mê + pirrjimar: Raveber+a Raveker+an**
    - qeleme (m): qelem, wendekarî (pirrj): xwendekar; qelem+a wendekar+an → qelema wendekaran: *qelema xwendekaran*
    - dayike (m): dayik, qeçekî (pirrj): zarok; dayik+a qeçek+an → dayika qeçekan: *dayika zarokan*

- **pirrjimar + nêr: Raveber+ê Raveker+î**
    - destî (pirrj): dest, Azad: navê lawikan; dest+ê Azad+î → destê Azadî: *destên Azadî*
    - qelemî (pirrj): qelem, lajek (n): lawik; qelem+ê lajek+î → qelemê lajekî: *qelemên lawikî*

Forma Tewandî: Raveber+an+ê Raveker+î

Mînak: destanê Azadî, qelemanê lajekî

Ev form di dersên bê de dê bi awayekî berfirehtir werin ravekirin.

- **pirrjimar + mê: Raveber+ê Raveker**
    - destî (pirrj): dest, Roşna: navê keçikan; dest+ê Roşna → destê Roşna: *destên Roşna*
    - qelemî (pirrj): qelem, kêneke (m): keçik: qelem+ê kêneke → qelemê kêneke: qelemên keçikê

Forma Tewandî: Raveber+an+ê Raveker
Mînak: destanê Roşna, qelemanê kêneke

www.arsivakurd.org

- **pirrjimar + pirrjimar: Raveber+ê Raveker+an**
  - bajarî (pirrj): bajar, kurdî (pirrj): kurd; bajar+ê kurd+an → bajarê kurdan: *bajarên kurdan*
  - qelemî (pirrj): qelem, wendekarî (pirrj): xwendekar; qelem+ê wendekar+an → qelemê wendekaran: *qelemên xwendekaran*

Forma Tewandî: Raveber+an+ê Raveker+an
Mînak: bajaranê kurdan, qelemanê wendekaran

TÊBÎNÎ: DI RAVEKA NAVDÊRAN DE FORMA TEWANDÎ TENÊ JI BO PIRRJIMARAN HEYE. ANGO JI BO MÊ Û NÊRAN FORMA XWERÛ Û TEWANDÎ WEK HEV IN.

TÊBÎNÎ: DI RAVEKA NAVDÊRAN DE RAVEKÊN NENASKIRÎ BI QERTAFA (–ÊK YAN JÎ –ÊD) TÊ ÇÊKIRIN. EV QERTAF DI NAVBERA *RAVEBER* Û *VEQETANDEKÊ* DE YE. Û WEKÎ DI KURMANCÎ DE, RAVEKER WEKÎ HALÊ XWE YÊ DI RAVEKÊN NASKIRÎ DE DIMÎNE. NIHA EM JI BO HER RÊBAZA JORÎN MÎNAKEKE RAVEKÊN NENASKIRÎ BIDIN.

MÎNAK:

- nêr+nêr; destêkê/destêdê Azadî: destekî Azadî
- nêr+mê; destêkê/destêdê Roşna: destekî Roşnayê
- nêr+pirrjimar; keyeyêkê/keyeyêdê embazan: maleke hevalan
- mê+nêr; lingêka/lingêda Azadî: lingekî Azadî
- mê+mê; qelemêka/qelemêda embaze: qelemeke hevalê
- mê+pirrjimar; qelemêka/qelemêda wendekaran: qelemeke xwendekaran

## Raveka Rengdêran



www.arsivakurd.org

Di kirmanckî de çawa ku zayenda navdêran heye, ya rengdêran jî heye. Ango bi gotineke din rengdêr li gorî navdêrî zayendê digire.

Mînak:

-baş: baş (n); başe (m)

-mezin: gird (n); girde (m)

-mirî: merde (n); merdî, merda (m)

-nû: newe (n); newî, newa (m)

- **nêr + rengdêr: Raveber+o Rengdêr**
    - embaz (n): heval, baş: baş; embaz+o baş embazo baş: *hevalê baş*
    - welat (n): welat, gird: mezin; welat+o gird welato gird: *welatê mezin*

Forma Tewandî: Raveber+ê Rengdêr+î

Mînak: embazê başî, welatê girdî

- **mê + rengdêr: Raveber+a Rengdêr**
    - embaze (m): heval, başe: baş; embaz+a başe embaza başe: hevala baş
    - cinî (m): jin, merdî: mirî; cinî+ya merdî cinîya merdî: *jina mirî*

Forma Tewandî: Di kirmanckiyê de ji bo meyan forma tewandî tune ye. Tewandî û xwerû wek hev in.

- **pirrjimar + rengdêr: Raveber+ê Rengdêrên nêr+î**
    - embazî: heval (pirrj), baş: baş; embaz+ê baş+î → embazê başî: *hevalên baş*
    - qelemî: qelem (pirrj), newe: nû; qelem+ê newe+yî → qelemê neweyî: *qelemên nû*



www.arsivakurd.org

Forma Tewandî: Raveber+an+ê Rengdêrên nêr+an

Mînak: embazanê başan, qelemanê neweyan

DI RAVEKA RENGDÊRAN DE RAVEKÊN NENASKIRÎ BI QERTAFA (–ÊK YAN JÎ –ÊD) TÊ ÇÊKIRIN. EV QERTAF DI NAVBERA *RAVEBER* Û *VEQETANDEKÊ* DE YE. Û WEKÎ DI KURMANCÎ DE, RENGDÊR WEKÎ HALÊ XWE YÊ DI RAVEKÊN NASKIRÎ DE DIMÎNE. NIHA JI BO HER RÊBAZÊ JORÎN MÎNAKEKE RAVEKÊN NENASKIRÎ BIDIN.

MÎNAK:

- nêr+rengdêr; embazêko/embazêdo baş: hevalekî baş
- mê+rengdêr; embazêka/embazêda başe: hevaleke baş

## lêkolînek li ser dengsaziya kurmanciyê



www.arsivakurd.org

# Nihêniyên befrê/berfê[109]

***Newzad Hirorî***



Di werzê zivistanê de, li deverên çiyayî yên Kurdistanê, "berf" li hinek kurmancan û "befr" li kurmancine din dibare. Cidahî di barîna "berf" û "befr"-ê de nîne; lê, ferq di avahiya wan ya dengî de heye. Li pişt vê newekheviya dengî pirsên giring yên **dengsaziyê** veşartî ne. Bi kifşkirina van pirsên nixamtî, hin aliyên pêwîst yên **fonolojiya** kurdiyê dê zelaltir bibin.

Qelsî yan nebûna termên kurdî yên pêwîst di warê nivîsandina babetên zanistî de karê pêşkêşkirin, şirovekirin û gehandina zanyarî, fikir û peyaman zehmet dike. Ya dijwartir ew e ku ji bilî bêjeya ”deng”-ê peyivên kurdî yên din nînin ku mirov pê ewqas termên **dengnasî** û dengsaziyê yên heyî wergerîne. Çend ji min bê, ez dê hewil bidim bi zimanekê sivik û kêmterm vê mijarê şirove bikim. Min term û têgehên ku ez di vê mijarê de bi kar diînim bi xetê stûr di tekstê de berçav kirine û di dawiya nivîsê de rêz kirine û îngilîziya wan li ber wan nivîsiye.

Ev bêje, bi herdu formên xwe ve, gelek kevn in. Ew di zimanê avestayî[110] de “vefre” bû û di kurmanciyê de bûye “befr” – wek [befir] tê bi lêv kirin – û “berf”.  Guhorîna dengê [v] bo [b] di **werara** dîrokî ya vê bêjeyê de diyardeya serekî ye. Nimûneyên din jî hene ku dengê [v]-yê destpêker yê avestayî di kurmanciyê de bûye [b], wek vak- > bêj-, vî-nas > binas, var- > baran, venhrî > bihar[111].

Awayê “befr”, ji bilî guhorîna [v] bo [b], rêzkirina dengan ya kevn parastiye. Herdu nedengdarên dawiyê, [f] û [r], wek berê li dû hev tên. Ev rêz û tertîb di “berf”-ê de guhartî ye û ev diyarde, ya ku deng cihên xwe bi hevûdu diguherin, bi termên dengsaziyê **cihguhorîn** (**metatez**) e. [f] û [r]-yan cihên

[109] Ez spasiya Sidqî Hirorî, Husein Muhammed, Remzî Kerîm û Mustafa Aydoganî dikim ku alîkariya min di kurmancîkirina termên vê nivîsarê de kiriye. Spas ji bo Arif Zêrevanî ku di nav tekstên Memozîna Ehmedê Xanî û Dîwana Melayê Cizîrî de li “befr” û “berf”-an geriye û ez agahdar kirime ku ev bêje di wan tekstan de derbaz nebûne.
[110] Avestayî zimanekê îranî yê kevin bû. Ew zimanê kitêba Avesta ya Zerdeştî bû. Ew li başûr-rojhilatê Îranê berî mîladê dihat bi kar anîn. Zimanên îranî yên nû, wek kurdî, farisî, beloçî û hwd., bi awayekî û yê din neviyên avestayiyê ne.
[111] Ev nimûne ji Chyet, Michael L. (2003) *Kurdish-English dictionary: Ferhenga kurmancî-inglîzî*. New Haven & London: Yale University Press.

xwe li hev guhartine û di zimanekê wek beloçiyê de qonaxekê pêşvetir çûne û [f] bûye [p]. Forma "berf", ya ku di farisiyê de jî heye, ji "befr" nûtir e çunkî ew di zimanê pehlewî[112] de jî hêj "vefr" bû.

Dibêjin: "Nû hatin, kevn(î) xelat in". Lê, ev ji bo "berf" ya nû û "befr" ya kevn derbaz nebûye. Kurmancan herdu awa qebûl kirine û ew wan bê alozî û bê asteng bi kar tînin. Kurmancên Îraqê, û bi wan re soranên Îraq û Îranê, "befr"-ê ji ser ban û kolanan dimalin û keçên xwe bi "Befrîn" nav dikin. Kurmancên Tirkiye, Sûriye û Sovyeta berê ji sir û seqema zivistana "berfîn" natirsin û zarokên wan dikarin "bûka berfê" bê kum û lepik çê bikin.

Tevî ku awayê "befr" – yê ku tê de dengê [r] li dawiyê ye – kevntir e, awayê "berf" – yê ku tê de dengê [r] yê pêşdawî ye – belavtir e. Lê, ne kevnahî ne jî berbelaviya van forman sedemên serekî ne ku dihêlin ev herdu awa bi hev re di kurmanciyê de bijîn. Sebebên serekî bi sîstema dengsazî ya kurmanciyê ve girêdayî ne.

Dengên ku "befr" û "berf"-an pêk tînin [b], [e], [f] û [r] ne. Herçî [b], [f] û [r] ne, ew **dengdar** in. Ew di dengsaziyê de bi C (îng. Consonant) tên nîşan kirin. Dengê [e] **dengdêr** e û bi V (îng. Vowel) tê nimandin. Dengdêr ew deng in yên ku bê asteng ji devî û **bêvilê** derdikevin û dengdar ew deng in yên ku bi asteng ji devî û bêvilê derdikevin. [e] ji **qirikê** dertê û ji wê re **şkeftika devî** berdayî dimîne û çi rêgir nakevin pêş wê. Lê, gava hewayê lerzok ji qirikê dertê û lêv, **didan**, **ziman** û **pidû** rê li ber wî hewayî digirin, ew dikare bibe [b], [f] yan [r] yan jî hinek dengên din.

Dengdarên li jorê li gor çend pîvanan, ji wan **dengjenîn** û **sîmayên cidaker**, tên şirove kirin. Di prosesa dengjenînê de, livîn û tevgera qirikê û organên axaftinê, jihevnêzîkbûn û jihevdûrketina van organan, rewşa dengdanê û awayê derketina hewayî ji devî û bêvilê di wesifkirina dengdaran de biryarder in. Gava hewayê ku ji **pişikan** tê li pişt **pêçekên dengî** kom dibe û **fişarê** lê dike, ew pêçek **dilerzin**, tên û diçin û rê didin ku hewayê lerzok ber bi jor ve biçe. Ji vê **diyardeyê** re **dengdan** tê gotin. Dengên ku bi vî awayî derdikevin dengên **dengdayî** ne. Ji bilî [f]-yê, hemû dengên ku di "befr" yan "berf"-ê de hene dengdayî ne. [f] **nedengdayî** ye çunkî pêçekên dengî di dema derxistina wê de **veqetandî** ne û rê li ber hewayê hatî nagirin.

[112] Pehlewî, yan jî farisiya navîn, zimanekê îranî yê başûr-rojavayî ye ku berî mîladî di dema desthilatdariya sasaniyan de li Îranê dihat bi kar anîn.



www.arsivakurd.org

Hewayê ku ji qirikê ber bi jor ve tê dikare di rêya xwe de di **bihurka dengî** de rastî astengan bê. Bi jihevnêzîkbûn yan jihevdûrbûna organên wek ziman, didan, pidû, **zimanok** û hwd., dengên cida çê dibin. Ji organên ku bi livîna xwe dibin rêgir li ber herika hewayî re **dengjenên çalak** tê gotin. Organên ku neliv in û ji bo derxistina dengan giring in **dengjenên neçalak** in. Navkirina dengan, bi taybetî dengdaran, li gor cihê ku lê dengjenên çalak û neçalak tên ba hev tê dan. [b] **lêvî** ye çunkî herdu lêv di derxistina vî dengî de beşdar in, [f] **lêvdidanî** ye ji ber ku bi nêzîkbûna lêva jêr û didanên jor derdikeve û [r] **pidûyî** ye ji ber ku **piştziman** xwe bi lez di ser pidûyê re dixişîne.

Ev wesifkirin ya ku tenê behsa organên ku tevlî derxistina dengan dibin dike hêj kêm e. Gava ev organ digehin hev, ew tesîrê li awayê derketina hewayî dikin. Di bilêvkirina [b]-yê de, herdu lêv bi temamî rêyê li ber hewayî digirin. Piştî ku ew ji hev vediqetin, hewa bi peqîn derdikeve; lewre [b] dibe dengdareka **peqok**. Gava lêva jêr xwe digehîne didanên jor, herdu bi hev re kuncikeka teng ji hewayî re dihêlin ku xwe tê re bixişîne der. Wesa, dengê [f] çê dibe û jê re dengdara **xişok** tê gotin. Lê, gava pişta zimanî bi tepekê li pidûyê dikeve, dengê [r]-ya sivik dertê. Navê vê [r]-yê dengdara **tepok** e.

Piştî şirovekirina dengdaran ji aliyê dengjenînê ve, mirov dikare [b], [f] û [r]-yên ”berf” û ”befr”-an weha binasîne: [b] peqoka lêvî ya dengdayî, [f] xişoka lêvdidanî ya nedengdayî, [r] tepoka pidûyî ya dengdayî.

Tevî ku [d] û [f] ji ber dengdanê ji hev cida ne, ew herdu li hember [r]-yê ji ber taybetmendiyeka din dikevin heman xaneyê. Di bilêvkirina van herdu dengan de, ceryana hewayî di bihurka dengî de **dialoze** ji ber ku rêya wî hewayî bi temamî yan netemamî tê girtin. Li hember wan, bilêvkirina dengê [r]-yê ceryana hewayî aloz nake û rê dide ku deng bi hêz derbikeve. Lewre, [r] baştir tê bihîstin û ew bi vê maneyê **zingbilind** e û [b] û [f] **zingnizim** in. Li ser bingehê vê taybetmendiyê, **hiyerarşiya zingdariyê**[113] hatiye ava kirin. Deng bi vî awayî li ser hiyerarşiyê hatine danîn (ji yên zingbilind li aliyê çepê heta yên zingnizim li aliyê rastê):

[113] Binêre, bo nimûne,
- Clements, G. Nick (1990) The role of the sonority hierarchy in core syllabification. In John Kingston and Mary Beckman, eds., *Papers in Laboratory Phonology 1*. Cambridge, Mass.: Cambridge University Press. 283-333.
- Selkirk, Elisabeth O. (1982) *The syllable*. Berg. 2. Dordrecht: Foris. Rûpel 337–385.
- Zec, Draga. (1995) Sonority constraints on syllable structure. *Phonology* **12**.85-129.

| | **dengdêr** [a], [e] | **nêzîkbûyî (tehisok [w] û şilok [r], [l])** | **bêvilî** [m], [n] | **xişok** [z], [f] | **nîvpeqok** [c], [ç] | **peqok** [g], [p] |
|---|---|---|---|---|---|---|
| **syll:** | + | - | | | | |
| **aprox:** | + | | - | | | |
| **son:** | + | | | - | | |
| **cont:** | + | | | | - | |
| **del.rel:** | + | | | | | - |

Stûna aliyê çepê yê vê hiyerarşiyê hîmên pîvaneka din ya şirovekirina dengan himbêz dike. Ew jî "sîmayên cidaker[114] e. Li gor vê pîvanê, her deng divê xwedîsîma (+) yan nexwedîsîma (-) be. Sîmayên serekî ev in: [syll] (îng. syllabic, anku kîteavaker), [cons] (îng. consonantal, anku dengdar), [approx] (îng. approximant, anku nêzîkbûyî) û [son] (îng. sonorant, anku zingdar). Bi vî awayî, [e]-ya "befr" û "berf"-an [+syll] e çunkî bê wê **kîte** ava nabe û [b], [f] û [r] [–syll] in çunkî bê wan jî kîte tê pêk anîn. Herweha, [e] [-cons] e ji ber ku dengdar e û dengên din [+cons] in. Ev diyar dike ku dengdar di kurmanciyê de qet nabin navika kîteyan. [e] û [r] bi du sîmayan wekhev in û ji [b] û [f]-yan cihê ne. Ew herdu [+approx] û [+son] in. Sîmayeka din heye ku dibêjinê [cont] (îng. continuent, anku domdar). Ev sîma rêgirtin û rênegirtina ceryana hewayî di bihurka dengî de wesif dike. Li gor vê sîmayê, [d] [-cont] û [f] [+cont] in. Sîmaya [del.rel] (îng. delayed release, anku berdana gîrokirî) ya ku di hiyerarşiya jorê de heye peqokan (wek [d]) ji nîvpeqokan (wek [c]) cida dike. Dengê [d] bi vê sîmayê [-del.rel] û [c] [+del.rel] e.

Li vir pêwîst e çend têbînî li ser terkîba kîteya kurdî (kurmancî) bên gotin. Qalibê giştî yê kîteya kurmancî weha ye:

[114] Binêre Chomsky, Noam & Halle, Morris (1968) *The Sound Pattern of English*. New York: Harper and Row.

www.arsivakurdi.org

(C)(C)V(C)(C) (V = dengdar, C = nedengdar)

Kîte ji du parçeyên serekî pêk tê: **serik** (ku C-yên pêş V-yê ne) û **qafiye** (ku V û C-yên paş serikî ne). Qafiye jî du parçe ye: **navik** (ku V ye) û **dûvik** (ku C-yên paş V-yê ne). Wek ku ji qalibê giştî xuya ye, navik parçeya pêdvî ye û serik û dûvik îxtiyarî ne.

Ji vî qalibî, kîteyên li jêr tên çê kirin:

| | |
|---|---|
| V | û |
| VC | av |
| VCC | aşt |
| CV | du |
| CVC | dar |
| CVCC | bend |
| CCV | spî |
| CCVC | stêr |
| CCVCC | şkeft |

Her deng nikare li her cihî be. Herçend bicihkirina dengan di her zimanekî de li gor qaîdeyên **dengrêziyê** yên taybetî bi wî zimanî ve bi rê ve diçe, lê hin meyilên cîhanî hene ku dengên di kîteyê de xwe li gor wan rêz dikin. Meyilek ji wan SSR (îng. Sonority Sequencing Principle, anku Prensîpa Rêzbûna Zingdariyê) ya ku li gor hiyerarşiya zingdariyê ya navbirî ye. Ev prensîp rêzbûna dengan di kîteyê de diyar dike û dibêje ku hêza dengan ji navenda kîteyê heta kêlekên wê her ku diçe kêm dibe. Li gor hiyerarşiya zingdariyê ya ku li jorê hatiye behs kirin, dengdêr (wek [e]) dengê herî zingbilind e û divê ew li gor SSR-ê navika kîteyê be. Peqok (wek [b]) dengê herî zingnizim e û divê ew li gor SSR-

ê li kêlekên kîteyê cihê xwe bigire. Dengên din weha xwe di navbera dengdêr û peqokan de rêz dikin: nêzîkbûyî (wek [w], [r] û [l]), bêvilî (wek [m]), xişok (wek [f] û [z]) û nîvpeqok (wek [ç]).

Qalibê kîteya kurmancî dûvikê nesade, ya ku ji C-yekê zêdetir e – bi şertê ku rêzbûna wan C-yan li gor prensîpa rêzbûna zingdariyê be – qebûl dike. Di nimûneyên kîteyan yên li jor de, ev şert di [-şt]-ya ”aşt”-ê, [-nd]-ya ”bend”-ê û [-ft]-ya ”şkeft”-ê de hatiye parastin. Diyar e ku rêzbûna dengên [-rf] yên ”berf”-ê tam li gor vê prensîpê ye. Lê, rêzbûna dengên [-fr] yên ”befr”-ê li gel prensîpê nagunce.

Peyiva “befr” di halê xwe yê xweser de, ku ne di **îzafetê** de be, wek [befir] tê bi lêv kirin. Ev dengê [i] yê kin di navbera [f] û [r]-yan de hatiye xistin da terkîba peyivê li gel dengrêziya kurmanciyê bigunce. Kîteya yekê ji corê CV ye û navika wê [e] ye û kîteya duyê ji corê CVC ye û navika wê [i] ye. Bi têxistana [i]-yê, herdu CC-yên ku di dawiya [befr]-ê de hebûn ji hev hatin veqetandin û pirsgirêka **hingaftina** prensîpa rêzbûna zingdariyê jî ji holê rabû. Niha herdu form, [berf] û [befir] li gor dengrêziya kurmancî awayên qebûlbar in.

Ji bilî ku [be.fir] bi dengekî ji [berf]-ê dirêjtir e, ew bi kîteyekê jî jê mezintir e. **Dukîtehiya** [be.fir]-ê pirsa şidandinê tîne pêş. **Şidandin** ew hêza zêdetir e ya ku dikeve ser parçeyekê ji parçeyên bêjeyê. Heger bêje **dukîte** be, şidandin dikeve ser kîteyekê ji wan. Heger bêje **pirkîte** be, hîngê kîteyek ji wan zêdetir tê şidandin. Heger peyiv **yekkîte** be, hîngê ew kîte bi xwe tê şidandin. Bo nimûne (ˈ li vir nîşana şidandinê ye):

ˈba, ˈbar, ba.ˈran, ba.ran.ˈdin, ber.ba.ran.ˈdin

Diyardeya şidandinê di **dengsaziya wezinî** de bû xwedî rêz û pîvanên gelemperî. Di vê teoriyê de, ya ku têgehên wê ji têgehên wezina helbestê hatine deyn kirin, kîte, **pê** û **bêje** sê **astên** bingehî ne ku **hierarşiya newayê** pêk tînin. Kîte yekîneya biçûktir e û ew tê şidandin. Kîte di pêyî de tên civandin û kîteyek ji wan dikare bibe **sereka** pêyî. Pêyek ji koma pêyan dibe serekê **bêjeya newayî**. Di dengsaziya wezinî de, peywendiyên navbera astên newayî û komên kîte û pêyan û herweha şidandin

bi awayê li jêrê tên nîşan dan. Nîşanên ku tên bi kar anîn ev in: σ (kîte), x (şidandî), . (neşidandî), () (kom).

*Ast*

| | ber.ba.ran.din | berf | ge.nim | be.fir |
|---|---|---|---|---|
| bêje | ( x) | (x) | ( x) | ( x) |
| pê | (. x) (. x) | (x) | (. x) | (. x) |
| kîte | σ σ σ σ | σ | σ σ | σ σ |

Wek tu dibînî, kîteya [din] di [ber.ba.ran.din]-ê de ji hemû kîteyên din yên vê bêjeyê bihêztir e. [berf] bi xwe yekkîte ye û hêz bi tenê li ser wê ye. Kîteya [nim] ya [ge.nim]-ê jî bihêztir e. Herçar bêjeyên li jorê navdêr in. Mirov ji van nimûneyan dikare bibêje ku şidandin di kurmanciyê de dikeve ser kîteya dawiyê ya navdêrê. Lê, di [be.fir]-ê de, şidandin, ya ku pîvanên dengsaziya wezinî ew li ser kîteya duyê daniye, di bilêvkirinê de li ser kîteya yekê ye; anku, [ˈbe.fir]. Xuya ye ku qaîdeya şidandinê bi hejmartina kîteyên peyivê bi tenê nikare kîteya ku bi rastî bihêztir e bibijêre.

Avahiyên [ge.nim] û [be.fir]-an dişibin hev. Herdu dukîte ne. Di herduyan de, dengdêra kîteya yekê [e] û ya kîteya duyê [i] ye. Ferqa di navbera wan de ew e ku şidandin li ser kîteya duyê ya [ge.nim]-ê ye û li ser kîteya yekê ya [be.fir]-ê ye. Sedema vê cidahiyê jî ew e ku [i]-ya [ge.nim]-ê **esilî** û [i]-ya [be.fir]-ê **têxistî** ye. Lê, rêzimana me çawa dikare vê ferqê bibîne?

Li jêr asta kîteyê, asteka din heye ku jê re **mora** tê gotin. Mora yekîneya pîvana **senga** kîteyê ye. Serikê kîteyê bi hîç morayan nayê hesab kirin. Qafiyeya kîteyê bi morayan ve tê girê dan û li gor wê

www.arsivakurd.org

girêdanê senga kîteyê tê diyar kirin. Her endama qafiyeyê bi morayekê tê hejmartin. Kîteya **yekmora** kîteyeka sivik e û kîteya **dumora** yan **sêmora** kîteyeka giran e. Di hinek zimanan de, şidandin li gor senga kîteyê tê bi cih kirin. Bo nimûne, kîteya giran tê şidandin. Heger em vê yekê ji bo kurmanciyê biceribînin, encameka weha dê derbikeve.


| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| bêje | ( x) | | ( x) | | (x ) |
| pê | (. x) | | (. x) | | (x .) |
| kîte | σ σ | σ σ | | σ σ | |
| mora | μ μμ | | μ μμ | | μμ |
| μ | | | | | |
| | ge.nim | be.fir | | ben.de | |

Şidandina li gor senga kîteyê pêşbîniyên şaş dide. Li gor vê pîvanê, kîteya yekê ya [ben.de]-yê û ya duyê ya [be.fir]-ê hatine şidandin. Rastiya wê ew e ku kîteya duyê ya [ben.de] û kîteya yekê ya [be.fir]-ê şidandî ne. Xuya ye ku hejmartina morayan ferqa di navbera [i]-ya [ge.nim]-ê û [i]-ya [be.fir]-ê de berçav nake. Rêzimana me bi çi awayî pêşbîniyên rast dike û rê li ber awayên şaş digire?

Bersiva mimkin ew e ku di bicihkirina şidandinê de, dengên têxistî nikarin hilgirên hêza şidandinê bin. Wek ku min li jorê jî diyar kir, kîte dibin pê û pê dibin bêjeya dengsazî. Bi gelemperî, pê ji du kîteyan pêk tê. Zimanê ku bi piranî kîteya yekê ya pêyî bişidîne, ew ziman xwedî **rîtma bezek** e û zimanê ku kîteya duyê ya pêyî bişidîne, ew ziman xwedî rîtma **tinazî** ye. Kurmancî bi gelemperî kîteya duyê ya navdêran dişidîne. Ew, bi vê kiryarê, zimanekê tinazî ye. Lewre, kîteya duyê ya [ge.ˈnim] û ya duyê ya [ben.ˈde] hatine şidandin. Kîteya duyê ya [be.fir]-ê nayê şidandin çunkî dengê navika wê ne dengekê esilî lê dengekê têxistî ye û ew di esilê bêjeyê de nîne. Li jêrê, ez dê van îdîayan di çarçoveya OT (Optimality Theory = Teoriya optîmalîteyê)[115] de pêşkêş bikim.

[115] Çavkaniya serekî ya OT-yê:
Prince, Alan and Paul Smolensky (1993) *Optimality Theory: Constraint Interaction in Generative Grammar*. Technical Report, Rutgers University Center for Cognitive Science and Computer Science Department, University of Colorado at Boulder.

OT dibêje ku ziman, bi hemû beşên xwe yên dengsazî, **peyvsazî**, **hevoksazî** û **manenasiyê** ve, ji sê yekîneyên serekî pêk tê. Yek ji wan, GEN (Generator = **zayinde**) e ya ku lîsteya **derhatiyên** yan **namzedên** mimkin derdixe. Ya duyê, CON (Constraints = **merc**) e ya ku ji komeka mercên rêzkirî yên **hingavbar** pêk tê. Ya sêyê, EVAL (Evaluation = **hilsengandin**) e ya ku li gor hikmê mercên heyî namzedeka **optîmal** dibijêre. Ji bo hêsankirina fikira vê teoriyê, li grafîka jêrê binêre.




Ev grafîk dibêje ku GEN ji bo terkîbekê, bo nimûne bêjeyekê, hemû awayên mimkin yên wê terkîbê, wê bêjeyê, pêşkêş dike. EVAL li gor rewşa mercên heyî awayekî ji van awayên namzedkirî dibijêre û ew awa dibe derhatiya optîmal. Weha, ji bo "befr"-ê, GEN hemû formên mimkin pêşkêş dike, wek [befr] û [befir]. Forma herî optîmal di EVAL-ê de tê bijartin. Forma bijartî ew form e ya ku hingaftinên wê yên mercên heyî kêmtirîn in. Ev mesele dê li jêrê zelaltir bibe. Lê, gelo, mercên heyî kîjan in?

Du corên mercan hene: **mercên gelemperîparêz** û **mercên rehparêz**. Mercên yekê formên aloz û dijwar ji bo bilêvkirin û têgehiştinê qedexe dike yan sinordar dike. Hinek nimûne:

NoCoda: Divê kîte bê dûvik be

Onset: Divê kîte bi serik be

www.arsivakurd.org

Mercên rehparêz dixebitin ku têketî û derhatî wekhev bin[116]. Hinek nimûne:

DEP-IO: Divê hemû parçeyên ku di têketiyê de hene di derhatiyê de bin (Ev dijî lêzêdekirinan e)

MAX-IO: Divê **beramberên** parçeyên têketiyê di derhatiyê de hebin (Ev dijî jêkêmkirinan e)

Mercên gelemperîparêz û mercên rehparêz li gor **pileyan** rêzkirî ne. Formên ku GEN pêşkêş dike dikarin van mercan bihingêvin, lê forma ku mercên pilebilind dihingêve nayê qebûl kirin. OT van **têgeh** û prosesan bi rêya tabloyan nîşan dide. Bo nimûne,

| SIH | MAX-IO | NOCODA |
|---|---|---|
| 1. sî | *! | |
| ☞ 2. sih | | * |

Ji bo peyiva ”sih”-ê, du namzed li vir hene: ”sî” û ”sih”. MAX-IO û NOCODA du merc in ku bi tertîb hatine rêz kirin. Pileya MAX-IO ji ya NOCODA bilindtir e; lewre heger ew namzedekê qebûl bike û NOCODA wê ceza bike jî, dîsa ew namzed bi ser dikeve. (*) nîşana hingaftinê ye, (!) nîşana nemimkinbûnê ye û (☞) nîşana bijartina serkeftî ye.

Mercên ku ji me re ji bo zelalkirina sebebê neşidandina kîteya duyê ya [be.fir]-ê û şidandina kîteya wê ya yekê pêwîst in ev in:

*P/C: Dengdar nabin navik

[116] Binêre: McCarthy, John J. & Alan Prince (1995) Faithfulness and reduplicative identity. In J. Beckman, L. W. Dickey, & S. Urbanczyk (Eds.) *University of Massachusetts occasional papers in linguistics* (Vol. 18, rûpel. 249–384). Amherst, MA: GLSA Publications

(Navik ji parçeyên din yên kîteyê zingbilindtirîn e, lewre, dengdêr dibin navik. Dengdar qet nabin navika kîteyê.)

HEAD-DEP: Divê parçeya ku di derhatiyê de dibe sereka neweyî berambera xwe di têketiyê de hebe.[117]

RHTYPE=I (IAMB): Di pêyekî de, kîteyeka bêhêz û kîteyeka bihêz li dû hev tên.

SSR (Sonority Sequencing Principle = Prensîpa Rêzbûna Zingdariyê): Di kîteyê de, zingdarî her ku ber bi navikê ve diçe zêdetir dibe û her ku ber bi kêlekan ve diçe kêmtir dibe.

Rêzbûna van mercan di kurmanciyê de biryarê dide ka çima [ˈbe.fir] formeka qebûlbar e.

| befr | SSR | *P/C | HEAD-DEP | IAMB |
|---|---|---|---|---|
| 1. (ˈbefr) | *! | | | * |
| 2. (be.ˈfr) | *! | * | | |
| 3. (ˈbe.fr) | *! | | | * |
| 4. (be.ˈfir) | | | *! | |
| ☞ 5. (ˈbe.fir) | | | | * |

SSR di vê rêza mercan de mercê herî pilebilind e. Ew nahêle rêza dengên di kîteyê de dijî prensîpa rêzbûna zingdariyê be. Lewre, [f] û [r] bi [i]-yê ji hev hatine veqetandin û bêje ji nû hatiye kîte kirin. Ji xwe *P/C nahêle ku dengdarek bibe navika kîteyê û lewre ew formên ku tê de navika kîteyê dengdar e red dike. IAMB û HEAD-DEP **hevrikiyê** li ser şidandina dengdêra têxistî, [i]-yê, dikin. IAMB

[117] Binêre: Alderete, John (1999) Head Dependence in Stress-Epenthesis Interaction. In Ben Hermans & Marc van Oostendorp (eds.) *The Derivational Residue in Phonological Optimality Theory*, Amsterdam: John Benjamins, rûpel. 29-50.



www.arsivakurd.org

dikoşe kîteya duyê ya [be.fir]-ê bişidîne, lê HEAD-DEP qebûl nake ku dengdêreka têxistî ya ku di esil de di bêjeyê de nebû hêzdar bike. Desthilata HEAD-DEP zêdetir e çunkî pileya wê ji IAMBê bilindtir e; lewre, [ˈbe.fir] di vê nakokiyê de bi ser dikeve. Bi hemberkirina formên “befr” û “berf”-an di çarçoveya OT-ê de, baş xuya dibe ka rêzimana me çawa û çima herdu awayan qebûl dike.

| befr | SSR | *P/C | HEAD-DEP | IAMB |
|---|---|---|---|---|
| ☞ 1. (ˈbe.fir) | | | | * |
| ☞ 2. (ˈberf) | | | | * |

Forma [bef.ˈre] hîç mercekî ji mercên li jorê nahingêve. Lê, mixabin! Ev form di kurmanciyê de nîne. Heta roja ku formeka weha ya mercneşkên peyda dibe, em bi ”berf” û ”befr”-ên xwe kêfxweş in.

**Lîsteya terman**

| **kurdî** | **îngilîzî** |
|---|---|
| alozîn | turbulence |
| beramber | equivalent, correspondant |
| bezek | trochaic |
| bêje | word |
| bêvil | nose |
| bêvilî | nasal |
| bi lêv kirin | pronounce |
| bihurka dengî | vocal tract |
| bilêvkirin | pronunciation |
| cihguhorîn | metathesis |
| dengdayî | voiced |
| dengdan | phonation, voicing |
| dengdar | consonant |
| dengdêr | vowel |
| dengjenîn | articulation |



www.arsivakurd.org

| | |
|---|---|
| dengrêzî | phonotactics |
| dengsazî | phonology |
| dengsaziya wezinî | metrical phonology |
| derhatî | output |
| didanî | labial |
| diyarde | phenomenon |
| dukîte | disyllabic |
| dukîtehî | disyllabicity |
| dumora | bimoraic |
| dûvik | coda |
| esilî | authentic, non-epenthetic |
| fişar | pressure |
| fonolojî | Binêre **dengsazî** |
| gelemper | unmarked, general |
| gelemperî | markedness (têgeha ka kîj form gelemper “unmarked” û kîjan negelemper “marked” e) |
| hewa | air |
| hevoksazî | syntax |
| hevrikî | conflict |
| hingaftin | violation, violate |
| hingavbar | violable |
| hiyerarşî | hierarchy |
| hiyerarşiya dengdanê | sonority hierarchy |
| hiyerarşiya newayê | prosody hierarchy |
| îzafet | ezafe |
| navik | nucleus |
| sengk | weight |
| kîte | syllable |
| kîteya giran | heavy syllable |
| kîteya sivik | light syllable |
| lêvdidanî | labiodental |
| lerizîn | vibration |

www.arsivakurdi.org

| | |
|---|---|
| lêvî | labial |
| manenasî | semantics |
| merc | constraint |
| metatez | Binêre **cihguhorîn** |
| meyil | tendency |
| mora | mora |
| namzed | candidate |
| nedengdayî | voiceless |
| neşidandî | unstressed |
| newa | prosody |
| newayî | prosodic |
| nêzîkbûyî | approximant |
| nîvpeqok | affricate |
| optîmal | optimal |
| optîmalîte | optimality |
| organ | organ |
| peqok | plosive |
| peyvsazî | morphology |
| pê | foot |
| pêçekên dengî | vocal folds |
| pidû | alveolar ridge |
| pidûyî | alveolar |
| pirkîte | polysyllabic |
| pişik | lung |
| piştziman | dorsum |
| qafiye | rime, rhyme |
| qirik | larynx |
| rîtm | rhythm |
| rîtma bezek | trochee, trochaic rhythm |
| rîtma tinazî | iamb, iambic rhythm |
| serek | head (eg. head of the noun phrase) |
| serik | onset |



www.arsivakurdi.org

| | |
|---|---|
| sêmora | trimoraic |
| sîma | feature |
| sîmaya cidaker | distinctive feature |
| şidandî | stressed |
| şidandin | stress |
| şilok | liquid |
| şkeftika devî | oral cavity |
| tehisok | glide |
| tepok | tap, flap |
| tê xistin | epenthise |
| têgeh | concept |
| têxistî | epenthetic |
| têxistin | epenthesis |
| veqetandî | abducted |
| watenasî | semantics |
| werar | development |
| xişok | fricative |
| yekkîte | monosyllabic |
| yekmora | monomoraic |
| zayinde | generator |
| zimanok | uvula |
| zingbilind | sonorant |
| zingdarî | sonority, resonance |
| zingnizim | obstruent |

## Qanûn, yasa yan zagon?

www.arsivakurd.org

Parlemana Kurdistanê navê biryarên xwe dike *yasa* ji ber ku *qanûn* ”ji erebî” ye. Medyaya Bakurê Kurdistanê vê peyvê qebûl nake ji ber ku *yasa* ”ji tirkî” ye. Birêveberiya kantonên Rojavayê Kurdistanê wan bi kar naîne ji ber ku *qanûn* ji erebî ye û *yasa* ji tirkî ye. Ew peyva *zagon* ya qaşo kurdî bi kar tînin.

Gelo rastî çi ye û em kîjan ji wan bi kar bînin?

Kurdan "qanûn" ji erebî قانوون (qanûn) wergirtiye lê ereban bi xwe jî ew ji yûnanî κανών (kanón) deyn kiriye. Yûnanan ew ji peyva κάννα (kanna: rûl, çîx, qamîş) çêkiriye. Lê wan jî peyva κάννα îcar ji akadî *qanû* wergirtiye. Jixwe akadî jî ew ji sûmerî *gi.na* deyn kiriye... û dîroka peyvê belkî hê jî dûrtir diçe. Bi latînî jî ew bi forma *canon* bû û wisa ketiye inglîzî.

Herçi *yasa* ye, ew bi rêya tirkî "yasa" ji mongolî "yasag" e. Heman peyv serekaniya "yasak" (qedexe, mennû') ya tirkî ye (> kurdî "yasax").

"Zagon" ji закон (zakon) ya rusî ye û ihtimal e ku bi rêya kurdên Sovyeta berê ketiye kurdî.

Herçi peyva "distûr" e, ew li Iraqê ne tenê di kurdî lê herwiha di erebî de jî bi maneya "qanûna bingehîn" (ing: constitution, tirkî: anayasa) tê bikaranîn. Lê ereban ew ji zimanekî îranî wergirtiye. Lê di kurdî de "destûr" bi giştî bi maneya "izin, ruxset, îcazet, rêdan" tê bikaranîn.

Peyva "qanûn" bo bikaranînê ji peyvên din baştir e ji ber ku hemû kurd li hemû parçeyên Kurdistanê wê fehm dikin.

www.arsivakurd.org

# Cînav û rengdêrên nîşander di kurmanciya Xorasanê de

***Muhemmed Teqevî***[118]



**Cînavk**

Cînavk ev peyv in ku cihê navdêran digirin ku ew dîsan nayên gotin. Cînavk li deh beşên sereke kom dibin:

Cînavkên kesane (ضماير شخصى)

Cînavkên şanîdane (ضماير اشاره)

Cînavkên pirsiyarî (ضماير پرسشى)

Cînavka qertafî (شناسه هاى شخصى)

Cînavka vegerok (انعكاسى)

Cînavkên berbihevîn (ضماير دو سويه)

Cînavkên lihevxistî (ضماير تركيبى)

Cînavkên xwedîtiyê (ضماير ملكى)

Cînavkên girêkî (ضماير موصولى)

Cînavkên nebinavkirî (ضماير مبهم)

✓Cînavkên kesane (ضماير شخصى

Li şûna navdêrên mirovan digirin an cihê kesan digirin. Cînavkên kesane du beş in: Yên xwerû netewandî û yên tewandî.

A. Yên xwerû an netewandî (غير صرفى) li henek deran wan re dibêjin cînavkên direct an ضماير مستقيم

B. Yên tewandî (an صرفى)

...............................

A. Cînavkên xwerû:

Ez (من), tu (تو), ew (او), em (ما), hûn (شما), ew (ewna) (آنها)

[118] Mamoste Muhemed Teqevî li ser http://linguakurd.blogfa.com/ dersên kurdî bi ravekirinên farisî dide.

www.arsivakurd.org

❊□Cînavkên xwerû li çend deran tên bikaranîn:

1. Kirdeya lêkerên peywendî an qertafên kesane (فاعل فعلهای ربطی)

Mînak:

Ez Kurd im

Tu Kurd î

Ew Kurd e

Em Kurd in

Hûn Kurd in

Ewna Kurd in

Li hevokên jor qertafên kesane an lêkerên peywendî vina ne: ✓im/me (هستم)

Ez Berdan im, Ez Gulê me

✓î/yî (هستی)

Tu Zozan î, Tu zînê yî

✓e/ye (است)

Ew xwendekar e, Ew mamost e ye

✓in/ne (هستیم)

Em xwendekar in, Em mamoste ne

✓in/ne (هستید)

Hûn xwendekar in, Hûn mamoste ne

✓in/ne (هستند)

Ew xwendekar in, ew mamoste ne

2. Kirdeya lêkerên negerguhêz (لازم)

Ez têm, ez çûm

Tu têyî, tu çûyî

Ew tê, ew çû

Em tên (ê), em çûn (ê)

Hûn tên, hûn çûn

Ew (na) tên, ew (na) çûn

3. Kirdeya lêkerên gerguhêz (متعدی) ên dema niha

Ez nên dixwem.

Tu nên dixwî.

Ew nên dixwe.

Em nên dixwen (ê).

Hûn nên dixwen.

Ew nên dixwen.

3. Kirdeya hevokên dema bê (آینده)



www.arsivakurd.org

Ez ê bi-k-im.

Tu ê bi-bêj-î.

Ew ê bi-ç-e.

Em ê bi-ajo-n.

Hûn ê bi-kirr-in.

Ew ê bi-stîn-in.

4. Biresera lêkerên gerguhêz ên dema borî

Mamosteyê ez dîm.

Mamosteyê tu dîtî.

Mamosteyê ew dît.

Mamosteyê em dîtin (ê).

Mamosteyê hûn dîtin.

Mamosteyê ew (na) dîtin.

**B. Cînvkên tewandî**

Min, te, wî (nêr)/wê (mê), me, we, wan

❊ Cînavkên tewandî li çend deran tên bikaranîn:

1. Kirdeya lêkerên gerguhêz ên dema borî

Min got...

Te got...

Wî/wê got...

Me got...

We got...

Wan got...

2. Biresera lêkerên gerguhêz ên dema niha

Kiyan min dibîne.

Kiyan te dibîne.

Kiyan wî/wê dibîne.

Kiyan me dibîne.

Kiyan we dibîne.

Kiyan wan dibîne.

3. Paşkoya navdêran (وابسته های اسمی)

Bavê min mamoste ye.

Xalê te ajokar e.

Apê wî/wê hunermend e.

Karê me baş e.

Hevalê we parêzer in.

Ev xwîşka wan e.

www.arsivakurd.org

**Cînavên nîşander** ev dema tên bikaranîn ku tiştek/kesek tê nîşandan. Mirov dikayni bi alîkariya wan Cînavan, tiştan li kesek nîşan bide. An jî ew cur Cînav tiştekê yan jî kesekî nîşane mirovan didin. **Cînavên nîşander** di Kurmancî de wekî Cînavên kesan du kom in: **Cînavên nîşander tewandî** (oblique) û **Cînavên nîşander netewandî** (casus rectuus, nominative).

A) Cînavên nîşander ku sa nîşan dan navên nêzik yekjimar her du zayendan nêr û mê tên bikaranîn:

1. Va(Yekjimar; **netewandî**; This)

***Va*** bi refş e.

***(This*** is beautiful.)

***Va*** bi refş bû.

***(This*** was beautiful.)

***Va*** dikevi.

***(This*** falls.)

***Va*** ket.

***(This*** fell.)

***Va*** serê min dişkêni.

***(This*** breaks my head.)

Min ***va*** xwar.

(I ate ***this.)***

***Va*** tê xwarin.

***(This*** is eaten.)

***Va*** hate xwarin.

***(This*** was eaten.)

2. Viya(Yekjimar; **tewandî**; This)

***Viya*/*Viya*** serê min işkand.

***(This*** broke my head.)

Ez ***viya*** dixwem.

(I eats ***this.)***

Ez ji ***viya*/*viya*** naxwem.

(I don’t eat from ***this***.)

B) Cînavên nîşander jî ku sa nîşan dan kesekê an tiştekê dûr tên bi karanîn:

1. Ew(Yekjimar; **netewandî**; That)

***Ew*** bi refş e.

***(That*** is beautiful.)

***Ew*** bi refş bû.

***(That*** was beautiful.)



www.arsivakurd.org

***Ew*** dikevi.

***(That*** falls.)

***Ew*** ket.

***(That*** fell.)

***Ew*** serê min dişkêni.

***(That*** breaks my head.)

Min ***ew*** xwar.

(I ate ***that.)***

***Ew*** tê xwarin.

***(That*** was eaten.)

***Ew*** hate xwarin.

***(That*** is eaten.)

2. Wê/wî(Yekjimar; **tewandî**; That)

***Wî***/***wê*** serê min işkand.

***(That*** broke my head.)

Ez ***wê***/***wî*** dixwem.

(I eats ***that.)***

Ez ji ***wê***/***wî*** naxwem.

(I don't eat from ***that***.)

Hindek ji cînavên nîşander jî hene ku sa nîşan dan navên pirjimar, her du zayendan nêr û mê tên bi karanîn.

A) Cînavên nîşander ku kes an tiştên nêzik nîşan diden:

1. Vina(Pirrjimar; **netewandî**; These)

***Vina*** bi refş in.

***(These*** are beautiful.)

***Vina*** bi refş bûn.

***(These*** were beautiful.)

***Vina*** dikevin.

***(These*** fall.)

***Vina*** ketin.

***(These*** fell.)

***Vina*** serê min dişkênin.

***(These*** break my head.)

***Vina*** serê min işkandin.

***(These*** broke my head.)

Ez ***vina*** dixwem.

(I eat ***These.)***

Min ***vina*** xwar.



www.arsivakurd.org

(I ate ***these.)***

***Vina*** tên xwarin.

***(These*** are eaten.)

***Vina*** hatin xwarin.

***(These*** were eaten.)

Ez ji ***vina*** naxwem.

(I don't eat from ***these***.)

B) Cînavên nîşander ku kes an tiştên dûr nîşan diden:

1. Ewna(Pirrjimar; **netewandî**; Those)

***Ewna*** bi refş in.

***(Those*** are beautiful.)

***Ewna*** bi refş bûn.

***(Those*** bi refş bûn.)

***Ewna*** dikevin.

***(Those*** fall.)

***Ewna*** ketin.

***(Those*** fell.)

***Ewna*** serê min dişkênin.

***(Those*** break my head.)

Min ***ewna*** xwarin.

(I ate ***those.)***

***Ewna*** hatin xwarin.

***(Those*** were eaten.)

***Ewna*** tên xwarin.

***(Those*** are eaten.)

2. Wan(Pirrjimar; **tewandî**; Those)

***Wan*** serê min işkandin.

***(Those*** broke my head.)

Ez ***wan*** dixwem.

(I eat ***those.)***

Ez ji ***wan*** naxwem.

(I don't eat from ***those.)***

## صفات اشاره در کرمانجی خراسان

1. Ew (That-yekjimar/pirjimar-nominative)

Wî/Wê (That-yekjimar- Oblique)

Wan (Those-Pirjimar-Oblique)

Ew lawik-a çû. (آن پسر رفت)



www.arsivakurd.org

"That boy went."

Ew Keçik-a çû. (آن دختر رفت)

"That girl went."

Wê Lawik-ê ez dîm.(آن پسر من را دید)

"That boy saw me."

Wî keçik-ê ez dîm.(آن دختر من را دید)

"That girl saw me."

Ew lawik-ana çûn.(آن پسرها رفتند)

"Those boys went."

Ew keçik-ana çûn.(آن دخترها رفتند)

"Those girls went."

Min ew lawik-ana dîn.(من آن پسرها را دیدم)

"I saw those boys."

Min ew kaçik-ana dîn.(من آن دخترها را دیدم)

"I saw those girls."

Wan lawik-an ez dîm.(آن پسرها من را دیدند)

"Those boys saw me."

Wan kaçik-an ez dîm.(آن دخترها من را دیدند)

"Those girls saw me."

2. Va(That-yekjimar/pirjimar-nominative)

Wî (This- yekjimar -Oblique)

Vina(These- pirjimar – Oblique)

Va lawik-a hat.(این پسر آمد)

"this boy came."

Va Keçik-a hat.(این دختر آمد)

"this girl came."

Wî lawik-a ez dîm.(این پسر من را دید)

"This boy saw me."

Wî kaçik-a ez dîm.(این دختر من را دید)

"This girl saw me."

Va lawik-ana hatin.(این پسرها آمدند)

"These boys came."

Va keçik-ana hatin.(این دخترها آمدند)

"These girls came."

Min va lawik-ana dîn.(من این دخترها را دیدم)

"I saw these boys."

Min va keçik-ana dîn.(من این دخترها را دیدم)

"I saw these girls."

Vina lawik-ana ez dîm.(این پسرها من را دیدند)

"These boys saw me."

Vina keçik-ana ez dîm.(این دخترها من را دیدند)


"These girls saw me.



www.arsivakurd.org

# Çend gotin li ser xebat û metodên mîsyoneran

***Fêrgîn Melîk Aykoç***



Mirov dikane kesên li ser zarava û zimanên kurdan dinivisînê têke sê beş:

A – Lêkolînên mîsyoneran û biyaniyan, evana ev in: Aleksander Jaba, F. Justi, H. Sindler, Oskar Mann – Karl Hadank (li ser xebatên Oskar Mann xebitiye.) Soane, Mînorskî, Ludwig Paul. Peter Lerch (bi xwe neçûye Kurdistanê, li Kirimê bi girtiyên kurmanc û kirmanc/kird re axiviye, ji devê wan hin tişt girtiye.) Jost Gippert e, bê van çend kesên din jî hene.

B – Kesên nijadkurd yan jî kurdistanî wek Mehrdad R. Îzady, Şerefxanê Bedlîsî, Ziya Gokalp, Cemal Nebez. Malmisanij, di van bist salên dawiyê de gelek xebatên li ser ziman û gelek gotarên hêja li ser zaravayan hatine nivisandin bi taybetî jî hin gotarên birêz Seyidxan Kurîj û Lerzan Jandil (di warê kirmanckî de).

C – Kesên ku bi niyeta her zaravayî wek zimanekî serbixwe nîşan dayînê, dinivîsin. Lê ji ber ku bi niyet nêzîkê ziman dibin, jiwê tenê di nava çarçoveyekê de difetisin.

**A – Xebatê misyoner û biyaniyan**

1. a) Ew ji lêkolînên zanistî bêtir, ji bo mîsyonekê hatine welatê me û agahiyên bingehîn ragihandinin serkarî û qiraliyetên xwe. Em wek mînak mîsyonerê ku di nava mêjiyê akademîkerên kurdistanî de roleke giran dilîze, bigirin.

Oskar Mann ne di demeke normal de, ew di pêvajoya ku qiraliyeta Almanyayê li koloniyan digeriya, bi taybetî jî ji ber çavkaniyên enerjiyê yên li Rojhilata Navîn xwerû Kurdistanê û têkiliyên xwe yên bi osmaniyan re ji şêwirmendên leşkerî (wek W. Von Moltke, General von Simens) gelek pisporên civakî û kesên ji ziman têdigihîjin fînanse kirine û şandine axa Kurdistanê de, hatiye Kurdistanê.

Divê mirov piçek jî di rastiya mîsyonerî û niyeta qiraliyetê de rewşa Oskar Mann binirxîne! Ku em vî aliyê wî yê bi guman li ber çavan ranexîne, emê niharibin berê xwe bidin rastiyê. Oskar Man ne tenê li ser ziman lêkolîn kiriye. Ew di pêşgotina  berhema xwe ya bi navê "Kurdische-Persîsche Forschungen" (lêkolînên kurdî û farsî) rewşa civaka kurd ya wê pêvajoyê û ya li Rojhilatê Kurdistanê gelek baş, hem jî wî bi awayekî sosyolojiya leşker-stratejîk li ber çavan radixîne. Ji xwe li pey xebata wî li wir li dij îngîlîzan artêşeke milisan ji şazdeh hezar kesî tê avakirin. Ew di beşa destpêkê de (Einleitung) li ser devera Mukriyan bi berfirehî radiweste, çend hevokên mînak:

*"Di nava Mukriyan de bi taybetî di warê têkiliya xwedanê cih ax û milk de gelek zelal xuya dike ku malbata Baba Amiriye serdest e. Baş tê zanîn ku wan bi zora şûrê xwe ev bi destxistiye. Gelê herêmê bi giştî girtiye bin fermanweriya xwe.... Eşîrên kurdan li dij vê desthilatdariyê nakevin nava tevgerekê ... Li vir tu tirk û bandoreke wan tune, heta mirov rastê peyvên wan jî nayê....*

Einleitung XVIII"

Ew di pêşgotin û destpêkê de jî, ka kî ew ji bo vê mîsyonê şandiye û fînansekiriye jî venaşêre. Di pêşgotinê de wiha dinivîse:

"Ez spasiya xwe ya şerefê ji bo akadmiya Qiraliyeta Prusyayê ya ji bo lêkolînên zanistî dikim.... Wan pêdiviyê min  ji bo lêkolînan wergirtin!.."

Li gel vê dîsa qiraliyeta Prusaya têkiliyên xwe yên bi şahê Îranê re ji bo destûr bidin wî bikartîne û vê mijarê wiha dinivîse:

"... Bi têkiliyên bi serkariya Sr. Maj. şahê Persîstanê (Îran) agahî gihîşt waliyên Herêmê û ew jî bûn alîkar. ... (pêşgotin)"

Ji bo destûra ji serkariya osmaniyan standiye jî wiha dinivîse:

“... Li pey ku serkariya tirk serlêdana min a yekem ya redkirî rakir û destûra li ser lêkolînên zanistî yê li ser zimanê kurdî da min, ... Bi fermana hezretê Qeyzer, sekreterê dewletê yê hundir wezareta çandê xiste nava tevgerê û wî jî di warê diravî de pêdiviyên min pêkanî!... Pêşgotin rû. I”

Ev tiştên ku bi zelalî hatine nivisandin in. Gelo çi misyan di paş vê rastiyê de veşartîne? Wî çi, çendî û çend raporên stratejîk ragihandiye serkariya almanan? Nebe ku ev dijminahiya deweleta alman ya ku îro jî li hemberê kurdan heye, berhemên wan raporan bin?

1. b) Metodên lêkolîn, nirxandin û şirovekirina van mîsyoneran jî bi giştî metodên gelek bi guman û seqet in. Ji ber ku ew ji zanyariya zimanekî zêdetir li pey îspatkirina angaşên (têz) xwe ne, ya duyem jî ziman bi giştî nizanin, bi tercumanan xebitîne. Gelo ew tercuman çiqas di wê têgihîştina wergerê de bûne? Lewre wê demê ev pîşe jî ewqas bi pêşneketibû.

Peter Lerch tercumanekî osmanî digire û diçe girtîgeha Kirimê. Ew tercuman bi osmanî, pirs û hevokên Peter Lerch dixwaze bizane, ji wan leşkerên dîlketî dipirse, ew leşker jî li gor fêmkirî, kirmanckî û kurmancî wan hevokan li gor devokên xwe dibêjin, wan werdigerînin osmanî, tercuman jî ji osmanî werdigerîne almanî. Peter Lerch jî almanî û kurdî dirûberîne û bi wî awayî di warê rêziman de dinirxîne.

Oskar Mann jî dema di nava mukriyan de dixebite tercumanekî bi navê Mîrza Jawat dibe. Ji kurdî wedigerînin farsî û ji farsî werdigerînin almanî. Li rojava jî tercumanekî osamanî bi xwe re dibe Siwêrekî û bi heman metodî ji kirmanckî werdigerîne almanî. Lê ew bi xwe neçûye gundê Kor ê, guya li wir keseke ji wî gundî diye û ji wî pirsiye. Lê bırêz Seyidxan Kurijê bi xwe ji gundê Kor /Kur ê girêdayî Çewlikê ye vê bi belgehan li ber çavan radixîne ku Oskar Mann neçûye gundê wan. Seyidxan Kurij di gotara xwe ya di malpera Rizgarî de di bin serenavê “Zazalar, Zazaca ve yazinin tarihçesi” bi tirkî hatiye nivisandin de vê mijarê wiha zelal dike:

*“... Bê vê gelek Îranolog li gor vê nirxandina Oskar Mann behsa devokên zazakî yA “Siwerek û Kor” ê dikin. Guman heye ku Oskar Mann Zaravayên kurdî yên din nezaniye! Bê vê Kor gundê min e.*



www.arsivakurdi.org

*Bavê min di sala 1900 dî de hatibû dinê, min ne ji bavê xwe û ne jî ji kalên gund bihîstiye ku almanekÎ hetibe gondê me. Ku di 1900 de almanekÎ hatiba gund, dê ev bûyêr ji nifşekê derbazê nivşê din ba. Ango ez ne di wê baweriyê de me ku ew hatibe gundê me. Lê li wan deman gundiyên me yên li Siwêrekê dijiyan hebûn. Dibe ku bi wan re ketibe têkiliyê. Mixabin ku bi riya Oskar Mann ev wek devokekê cîh girtiye. Jixwe tim wiha dibe, yek têzekî davêje meydanê, yên li pey wî jî vê fikrê wisa belav dike. Lê di rastiyê de bi navê zarava kor/kur zarava yan jî devokek zazakî tune..... (wergera ji tirkî Fêrgîn Melîk Aykoç) Sy.Ku*"*

Oskarman bi çi metodî xebitiye, bi xwe wiha tîne ziman:

"... Min xebatekê bi rûberîna almanî re, di warê avahiye hevokê û parên hevokê pêkanî. Rû VIII"

Ji bo ku em bikanin seqetiya vê metodê li ber çavan raxînin, ez ê berê çend minakan ji Oskar Mann bidim. Li pey jî eksperîmenteke xwe yê di warê wergerê de li vir wekî mînak nîşan bidim.

I) **Mînakên Oskar Mann**

1 -*"bä ghirät-tir- in" = Sie sind schlauer"*

Ev forma payeyê şaş hatiye wergerandin, lema nirxandin jî şaş e.

Kurdiya "Sie sind schlauer = 1 = hûn baqiltir in 2 = Hun konetir (jîrtir / qurnaztir) in.

Lê "bi qîrettir"bûn tiştek din e.

2 – *"äwê şewê = in dieser Nacht*

"äwê şewê" bi kurmancî "wê şevê"

Lê ji bo almanî şaş hatiye wergerandin.

"In dieser Nacht" bi kurmancî di wateya "îşev" de ye, rastiya wê di devoka Mukrî de jî wiha ye: "em şew"

3 – *“bä khulâm be zamin dâi”* wiha hatiye wergerandin: *“Ich übergab dich dem Gotte als dem Bürgen”* Bi tevahî şaş hatiye wergerandin.

Bersiva vê hevoka almanî di devoka Mukrî de wiha ye:

*“Be xulam sipardî we be zamîn dayî!”*

E mînakekê îbretê jî ji Karl Hadankê şagirtê Oskar Mann.

Dema ku em li destnivisarên O. Mann yên  ku Karl Hadank li ser xebitiye, dinêrin; tenê du mînak dane û ew mînakên xwe jî, ne li ser mantiqê Goranî (Kurdî - Êranî) nirxandine. Nola mantiq û mercên zimanê Almanî lê nêrîne û nirxandine.

| **Mînakên wan** | **Bi mentiqê** | **Bi mentiqa almanî** |
|---|---|---|
| dîma gîraway | Duv gîrînê (gîryayî) li pey gîrînê | Nach dem Weinen |
| emin nîmatau nokerî bikeru | min nikarîbû nokerî bikira | Ich kann keinen dienst verrichten. |

Belê di zimanê Almanî de dema ku lêker bi vê awayê, yan jî bi awayê substantîvî tê bikaranîn, di forma radêr (Infinitiv) de dimîne, lê di Kurdî de lêker paşgîn digire û dikeve formek din. Di van mînakan de lêkerê pêşgîna rawe „bi“ girtiye. Bi dîtina min haya van kesan ji vê mantiqa ziman ê me tune. Divêt em vê jî ji bîr nekin ku kesên biyanî yên li ser zimanê me xebitîne, zimanê me nizanin yek, ê dudyan O. Mann ji wergerandinê Farisî wergerandiye Almanî. Ango ziman mantiqê xwe wenda kiriye.

**II) Mînaka eksperîmenta min**

www.arsivakurdi.org

Min û mamosteyeke alman me çîroka min ya bi navê "Honaz û Hirç" ji bo zarokan wergerand almanî, da em bikanin girîngiya ji zimanê orjinal wergerandinê zelal bikin, min ji wergera bi almanî çarekek beşa helbestî girt û bi çend kesên bi azmûn dan wergerandin. Em li vê eksperîmetê yan jî ceribandinê binêrin:

Tekst yan jî helbesta orjînal kurdî ev e:

"Birçî me, zikê min qurequr e
Gelo li vî geliyî çi pirr e?
Kanê dara sêva sor û zer e?
Himmm niha çi tam li ser e!

Himmm çi sêveke gihîştî
Xweş e wek goştê biraştî
Tam li ser dev û lêvan hîştî!"

Min û wê mamosteya alman me naveroka wê helbestê bi awayekî helbestî û li gor têgihîştina zarokan wergerand almanî, me bi kesên pispor jî da kontrolkirin:

Wergera me ji bo almanî ev e:

Ich habe Hunger, mein Magen knurrt eben.
Was für Früchte mag es hier wohl geben?
Ach ja, den Baum mit roten und gelben Äpfeln wird man hier haben.
Wie werde ich mich an den Früchten laben.

Himm, was für ein reifes Äpfelchen,
bleibt wohl sein Geschmack auf Zunge und Mündchen?
Bestimmt schmeckt es besser als gegrilltes Würstchen.



www.arsivakurd.org

Me di vê wergerê de di cihê peyva "lêv" de peyva "ziman (Zunge)" di cihê goşt de jî, peyva "bimbar / sucuq (Wurst)" bikaranîn. Lew re bi almanî wisa baştir dihat têgihîştin.

Mamoste Mahmut Aydin di vî warî de xwediyê azmûn e. Wî ev ji almanî wiha wergerandiye:

"Madeya min ji birçîna dike qure qur.
Divê li vira kîjan mêwe hebûya?
Çiqas xweş dibû, ger li vira dareke sêvê bi sevên sor û zer hebûya.
Minê çawa xwe bi van mêweyan têr bikira.

Himm sêveke çawa gihîştî,
wê tama wê ya xweş li ser ziman û di dev de bimîne.
Bêguman, tama wê ji sicuqê biraştî çêtir e. „

Birêz Helîm Yusif jî ev ji almanî wiha wergerandiye.

„Ez birçî me, qurequra zikê min e.
Hemû mêweyên kêfa min ji wan re tê, wê li vir hebin?
Ofyan, mirov dikare li vir bibe xwedî dareke sêvên zer û sor.
Ez ê ji xwe re bi van mêweyan kêf bikim.

Himm, ev çi sêvên teze ne.
Ew tama wan a xweş wê di bin zimanê min de bimîne?
Teqez tama wan ji tama goştê biraştî xweştir e."

Min di hevoka yekem ya orjînal de lêkera « bûn » bikaraniye. Di wergera almanî de lêkera « hebûn » hatiye bikaranîn. Mehmût di cihê wê de lêkera « kirin » bi kar aniye, Helîm jî lêkera « bûn » bi kar aniye.

Di hevoka duduyan de min bi peyva pirsê "gelo" bi alîkariya lêkera bûnê pirsiye. Me di almanî de lêkara alman "möge = dibe" û "geben = dayîn /hebûn" bikaranî. Mehmûd di wergera xwe de lêkera



www.arsivakurd.org

“vîn û forma rawe ya lêkera “hebûnê” bikaraniye. Helîm Yusiv jî lêkera hevgîn “kêf vê re hatin” û lêkera “hebûn” ê bikaraniye.

Gelek zelal xuya dike ku bi metoda wergerê nirxandina zimanekî, nirxandineke gelek seqet û ne zanisti ye. Evana wek referenz, yan jî wek belgeyên zanistî girtin, di warê zanyariyê de kêm û seqet dimîne.

1. c) Mîsyoner û lêkolînerên biyanî; berê têzên xwe datînin, li pey jî dixebitin ku bi mînakên li gor wê têzê, têza xwe bidin pejirandin. Ango armanc tenê îspatkirina têz û angaşta wan e, ne rastiya ziman e, lema ew mînakên xwe jî li gor wê hildibijêrin. Angaştên akademîk ew e ku mirov bikane bide pejirandin, ne ku rastiyê bêje. Wek mînak, em bêjin kesekî doktora xwe li ser rengê mast çêdike, ku bikane îspat bike û belgeyên xwe bide pejirandin, têza wî jî tê pejirandin. Ji ber ku em ne dewletin herkes li ser her tiştê me dilîzin. Wekî mînak almanekî cesaret nake ku zaravayekî almanî wek zimanekî serbixwe ji angaşta xwe re têke babeta bingeh, ji ber ku dewleta alman rê nade, lê dikane zimanê bêxwedî hilbijêre.

Em di vir de jî mînaka Prof. Dr. Jost Gippert bidin.

Min ji hin dostên wek Prof Dr. Newzat Gedîk di mafê wî camêrî de û kesên li der û dora wî dihatin, diçûn û dixwestin navê wî ji bo armancên xwe bi kar bînin, bihîstibû. Hin ji wan kesan dinasim, tirkîhez lê dijminên kurmancî bûn. Min gelek xwest ku ez bi J. Gippert re têkevim têkiliyê, lê nebû.

Birêz Seyidxan Kurij di heman nivîsa xwe de li ser Jost Gippert wiha dinivîse:

“Yek jî Prof. Dr. Gippert e, ev zilam hê dijî. Heta salên dawiyê tu xebateke vî zilamî li ser zazakî tunebû. Birêz Gîppertê li zanîngeha Frankfurtê dixebite, bi bijandina hin peyayên zazacî, yanê bi teşvîka hin kesên zazaciyên ji wî re asîstanî dikirin, dest bi nivisandina hin gotaran kir û semîneran dide. Birêz Gîppert li gor xwe şemayekî jî derxistiye. Lê mirov di xebatên wî de jî têdigihîje ku ew zazakî û zaravayên kurdî yên din nizane. Gîpert di gotareke xwe yê dirêj de bi mînakan dixebite îspat bike ku zazakî nêzîkê Farisî ye.

*Çawa ku tê zanîn; Di xebatên akademîk de hîle û zexeliyekê ku pirr tê bikaranîn heye. Eger hûn bixebitin ku têzekî we di serî de destnîşan kiriye îspat bikin, hûn mînakên xwe jî li gor wê hildibijêrin.*



www.arsivakurd.org

*Lê kesê din jî dikanin heman mijarê bi mînakê din tam tersê wê têzê îspat bikin. Ji ber vê mijarê, divê mirov babetê bi awayeke giştî bigire û binirxîne.*

*Lê di rastiyê de Gîpert nihane bi wan mînakên xwe jî têza xwe îspat bike. Ew mînakana gelek baş nîşan dide ku zazakî ji farisî bêtir nêzîkê kurdî ye. (wergerandin ji tirkî: Fêrgîn Melîk Aykoç)"*

1. d) Mîsyonerên li ser zarava û zimanê kurdan xebitîne, yek jî zaravayên kurdî, devokên wan zaravayan, peyvên sînonîm yên di nava zarav û devokan, guhertin û ketina dengan di nava zaravayan de nizanin.

Wek mînak ev peyvên dijberiyekê nîşan didin, di warê wateyê de sînonîmin.

*"Çewt, ters, berovajî, belovacî, dij, şaş"* dibe di devokekê de gişt werin bikaranîn, lî di devokekê de tenê yek were bikaranîn. Mîsyoner dema di devokekê de ji vana yekî dibihîse û di devokeke din de yeka din dibîhîse, "dibêje aha ev cudahiye."

Wek mînak Oskar Man di warê paşgîna "ewe" ku di zaravayên başûrê rojhilat de gelek tê bikaranîn hempîşeyên xwe bi ne têgihiştinê tewanbar dike:

"Ew paşgîna (suffix) "ewe" ku bi aliyê F. Justî û H. Schindler ve wek tiştekî nayê têgihîştin tê dîtin, mirov dikane di hemû formên lêkeran de bibîne, ew dişibe "baza" farisî..."

Ango di her warî de metodên mîsyoner û biyaniyan seket in. Heryek tenê aliyekî rastiyê dibînin, ji ber ku zaravayên kurdî, peşketinên di pêvajoya dîrokê de di nava ziman û zaravayên kurdî de, bi taybetî di warê dengzanî, peyvzanî, û ristesaziyê û deman de pêkhatî, li gel wan bandorên dagirkeran bi giştî nagirin (jixwe armanca têz û angaşta wan jî ne ev e, tenê fikra xwe qebûlkirin dayîne.) tiştê ew dinivisînin jî ji rastiya ziman û zaravayên kurdî gelek dûr in.

Lê dîsa jî hin ji van zimanzan û mîsyonerên ewropî li ser zaravayên kurdî hin tişt gotine. Ji ber ku mirovên me wisa hînbûne, hetanê navê ewropiyek di nvisekê de nebîne, wê nivîsê wek nivîseke zanyarî nanirxîne, em dîsa jî dîtinên hin biyaniyan yên li ser zarava û zimanên kurdan li vir pêş bikin.

www.arsivakurd.org

# Erkên herfa E di kurdî de

***Zinarê Melleyî***



Dengê "e"yê gelek wezîfe di zimanê kurdî de hene. Dema em hêşta li qûnaxa amadeyî anku lîsê bûn, seydayên me neh wezîfeyên wê ji bo me digotin. Ew wezîfe ev bûn;

1. "e" wekî lêkera netimam ji bo dema niha rolê xwe digêrit. Ew jî bi du mercan dibit. Yek; heker çi lêkerên serekî di hevokê da nebin. Du; heker "e" bikevit dawiya hevokê. Nimûne; Azad seydayê min e.

2. "e" wekî cihnavê nîsek ji bo kesê duyê yê kit di rolê kirdeyî anku bikerî da rolê xwe digêrit. Ew jî heker bikevit dawî ya lêkera daxwaziyê. Nimûne; wê kitêbê bixwîne.

3. "e" wekî nîşana bangkirinê di zaravaya Soraniyê da rolê xwe digêrit. Ew jî bi du mercan dibit. Yek; heker li dû navekî biêt. Du; heker lêkera hevokê di rewşa daxwaziyê da bit û daxwazî ji wî navî hatibit kirin. Nimûne; Kurde bixwêne.

4. "e" wekî pêrebest anku daçek (=amrazî peywendî, herf cer, pirîpozîşin) rolê xwe digêrit. Ew jî heker li dû lêkereka "dema borî" an jî "dema neborî" biêt. Nimûne; ez çûme malê, ez diçime malê ...

5. "e" wekî amrazî xistineser (=danepal, xistinepal) di zarava ya Soraniyê da rolê xwe digêrit. Ew jî heker li navbera navdêrekê û rengdêrekê biêt. Nimûne; golle ciwaneke mebire, yariye besûdeke dekem...

6. "e" wekî paşpirtik (=paşqertaf, paşgir) jî di dema çêkirina peyveka darêştî anku darêjraw da di zarava ya Soraniyê da rolê xwe digêrit. Ev jî bi du awayan diêt çêkirin.

Yek; rengdêr + e : çake, xirape, pake, germe…

Du; riha çavîka dengî + e : koxe, nalle, pijme, teqe...

7. "e" wekî navbend ji bo çêkirina peyveka lêkdayî rolê xwe digêrit. Nimûne; reşeba, serereş...

8. "e" wekî cihnavê nîsek ji bo sêyem kesê kit di kurmanciya bakûrî da rolê xwe digêrit. Ew jî heker li dû lêkera dema neborî biêt. Nimûne; ew serdikeve, ew diçe...

9. "e" wekî nîşana berniyasiyê (=nasraw) di zarava ya soraniyê da rolê xwe digêrit. Ew jî heker kurtbirrî ya "eke"yê bit. Nimûne; qotabiye derçû. Eslê wê "qotabiyeke derçû" ye.

Wezîfeyên "e"yê bitir in, lê ez dê carê hindek ronahiyê berbidim ser xala yekê. Wekî diktor Fazilê Emerî di kitêba xwe ya bi navê "Wexerek li nav Pêrebestên Zimanê Kurdî" da gotî, ev bi dehan salane zimanzanên Kurd negehiştine biryareka vebir ka ev "e" û yên wekî wê çi ne. Hindek zimanzan wan bi lêker dadinin (wekî "verb to be"yan di zimanê Ingilîziyê da), hindek zimanzan wan tenê wekî paşbendên cihnavan dadinin, hindek zimanzan jî wan wekî lêkerên kêm (=fi'il naqis) dibînin, û htd. Diktor Fazl dibêjit, "dibit vê "e"yê bi kêmî du jêder hebin. Yek; dibit ew ji "es"ê yan "est"ê sivik bûbit.* du; dibit ew paşbendê cihnavê "ew"ê bit".

Ez bi xwe jî li wê bawerê me ku ew wekî "verb to be" yên Ingilîzanin. Min berî niha li ser hevokên bê lêker ên Kurdiyê nivîsîbû. Çi hevokên Kurdî yên bê lêker nînin. Hindek hevokên Kurdî hene (wekî "roj baş"ê) ku lêkerên wan naên gotin, lê mana ya wê ew nîne ku ew bê lêkern. Dema em dibêjin, "pêşmerge qaremane", ne wekî wê ye ku Ereb dibêjin, "Eccindiyo şucaon". Di Nimûne ya Erebiyê da, çi lêkerek nîne. Lê di Nimûne ya Kurdiyê da, "e" lêkera netimam a hevokê ye. Ingilîz jî dibêjin, "he is clever" anku "ew zîreke". "Is" a Ingilîzyê her "e" ya Kurdiyê ye.

- malpera elektronî ya Wîkîferheng dibêjit: ev "e" ji proto-hindûewropayî *hes, têkildarî heye, est/hest a Farisî, "ê" ya Ermenî, "estî" ya Sansikrîtî, "est" a Latînî, "îst" a Elmanî û "îz" a Ingilîzî hemî ji wê ne.

- hindek Kirmanc li şûna "e"yê "ê"yê dibêjin. Li şûna "pêşmerge qareman e", dibêjin, "pêşmerge qareman ê". Rast e ku Faris niha jî "est"ê dinivîsin, lê ew jî dibêjin, "ê". Em jî dibê "e"yê binivîsin, û her kesek azad e wê çawa bixwînit.

Ez dê vê carê tenê li ser xala çwarê rabiwestim. Xala çwarê ev bû; ""e" wekî pêrebest anku daçek (=amrazî peywendî, herif cer, pirîpozîşin) rolê xwe digêrit. Ew jî heker li dû lêkereka "dema borî" an jî "dema neborî" biêt. Nimûne; ez çûme malê, ez diçime malê, ..." helbet ew ji bo dema paşerojê jî wesa ye. Nimûne; ez dê çime malê. Lê dema mirov li nav Kirmancan digerit, mirov dibînit ku ev "e" di nav hemî Kirmancan da nîne. Hindek Kirmanc dibêjin, "ez çûm malê, ez diçim malê, ..." yanî ew

wê "e"yê nabêjin. Ez bi xwe li wê bawerê me ku niha pirranî ya Kirmancan wê "e"yê nabêjin. Gotin û negotina wê ne tenê di nav Kurmancî da wekî zarava, lê di nav devokên Kurmancî jî da heye. Ez dê behsa devera me ya Behdînanê bikim. Li vê qama Metînî ku Doskî ne; xelkê hindek gundan wê "e"yê dibêjit, xelkê hindek gundan jî nabêjit. Lê li qama dî ya Metînî ku Berwarî ne; xelkê çi gundan wê "e"yê nabêjit. Ez gelek li dû wê "e"yê geryam. Wekî min gotî; ew "e" li hindek deveran diêt gotin, li hindek deveran jî naêt gotin. Lê çima?! Bi rastî, min çi bersiveka wicê bi dest xwe neêxist. Ez li nav kitêban jî geryam, û min pirsyara wê ji gelek kesan jî kir. Lê heta niha çi kesek bi temamî bi ser wê "e"yê hilnebûye ka gelo serekanî ya wê ji kî derê ye û çawa gehiştiye vê derê. Seyda yê min, diktor Lezgînê Çalî, yek ji wan kesan bû ku min bitir ji carekê û duyan pirsyara wê "e"yê jê kirî. Wî got ku ev çend salin ew jî li bingehê wê digerit û hêşta bi ser wê hilnebûye. Ez li berahiyê bi hizrên xwe bi ser tiştekî hilbûm; ew "e" di nav Soranan jî da heye; min derûme malê (Hewlêrî) / min erûme malewe (Silêmanî). Lewma ez li pêşiyê weha fikirîm ku ew "e" ji Soraniyê bi nav Kurmancî kevtbit. Heker ne, pa çima hemî Kirmanc wê nabêjin? Lê dema min ev pirsyar ji seydayê xwe yê Çalî kirî, wî got min ku ew "e" ji Soraniyê nehatiye. Wî got, "ew "e" wekî pêrebestekê ye û ji tesîra Soraniyê li ser Kurmancî ya Dihokê kevintire û li hindek deverên dî jî li kare. Melayê Cizîrî jî ew bi kar înaye." Ez piştî gotina wî dîsa vegeryam dîwana Cizîrî. Min "e" li nav baxê helbestên wî mişe dît. Cizîrî dibêjit, "newa ya mutrib û cengê fexan avête xercengê". Cizîrî jî negotiye, "avêt". Wî gotiye, "avête". Cizîrî yên niha jî wê "e"yê dibêjin. Lê Kirmancên Amedê, Muşê, Rihayê, û gelek bajarên dî ji her çar aliyên Kurdistanê wê nabêjin. Zaxoyî jî, ku Botanî ne, wê nabêjin. Diktor Fazilê Emerî di kitêbeka xwe da dibêjit ku ew "e" hindek caran cihê "bo"yê (=îla ya Erebî, to ya Ingilîzî) digirit, hindek caran jî cihê "li"yê digirit. Ev rast e; "ez çûme malê" her "ez çûm bo malê" ye. "Ez rûniştime ser erdî" jî her "ez li ser erdî rûniştim" e. Ew dibêjit ku dibit ev "e" ji bo xweşxwaniyê hatbit. Lê hevîrê vê "e"yê pêdivî hêşta avê ye.

Encam;

1. Ev "e" kevn e, lê li hemî deverên Kirmancan naêt gotin.

2. Reng e ew "e" kurtbirî ya peyvekê, an jî hindek peyvên dî bit.

3. Ew "e" pêdivî gelek vekolînên dûr û kûre.

4. Nivîsîn û nenivîsîna wê ji bo zimanekê pîvankî niha arêşe nîne. Ew birryar dibê piştî vekolînên dûr û kûr biêt dan.

Min berî niha got ku seyda yên me yên xwandin a berheviyê (= lîsê) neh wezîfe yên "e"yê ji bo me digotin. Herwesa min got jî ku wezîfe yên "e"yê di ziman ê me da ji nehan bitir in. Helbet ew bitir in.

Hema mirov kêmekê bifikirit jî dê bibînit ku "e"yê gelek wezîfe yên dî jî hene. Ferhenga eliktironî ya Wîkîferhengê ku girêdayî malper a Wîkîpedyayê ye jî hindek wezîfe yên "e"yê bi rêz kirine. Ez jî dê wan xalan bi hindek destkarî û zêdehiyan ve li vê derê bi rêz bikim.

1. "e" yek ji pît ên elîfbêtk ên ziman ê Kurdiyê ye. Seyda yên me qet amaje bi vê xalê nedida. Xelk di kitêb ên xwe da, nemaze di ferhengan da, berî hemî tiştan amajeyê bi vê xalê didin. Wekî ferheng a Oksfordê ya ziman ê Ingilîzyê; her ji pît a "A"yê heta "Z"ê, wan berî hemî tiştan gotiye ku ew pêt ên elîfbêtk ên ziman ê Ingilîzyê ne. Yek bi yek jî diyarkirine ka di rêzbendî ya elîfbêtkên wan da dibin pît ên çendê. "e" di rêzbendî ya pît ên elîfbêtk ên Kurdî-Latînî da dibit pît a şeşê, û di rêzbendî ya pît ên elîfbêtk ên Kurdî-Aramî da dibit pît a 23ê. Dibit hûn bibêjn ku ev ne wezîfe ye, belkî nasandine. Lê hemî pît ên her elîfbêtkekê di nivîsînê da bi wezîfe yên xwe radibin.

2. "e" bi reng ê "e"yê sivikgotin a "erê"yê ye. Ew hevmana ya "erê", "belê", "a" û "ba"yê û dijmana ya "na", "no", "ne", "nexê" û "nexêr"ê ye. Rast e ku em wê weha nanivîsin. Lê em weha dibêjin û dibê amaje bi wê jî biêt kirin. Ev yek di zanistê zimanvaniyê da dikevit xan a bişavtinê (=helyanê, esîmîlasyonê).

3. "e" bi reng ê "e"yê sivikgotin a "ez"ê jî ye. Nimûne; e nizanim. (=Ez nizanim), e dibêm. (=Ez dibêjim), ... Ev jî herwesa dikevit xan a bişavtinê.

4. "e" bi reng ê "e" ya Latînî wekî kurtenav ji bo enerciyê û eliktironan diêt xebitandin. Herwesa ew ji bo kurte ya eliktironî jî diêt xebitandin. Wekî e-poste, e-mail, e-peyam, û htd.

5. "e" mîna Soraniyê di Kurmancî jî da wekî paşpirtikek bi ser peyv ên heyî ve ji bo çêkirin a hindek peyv ên nû diêt xebitandin. Wekî nexşe (=nexş+e), deste (=dest+e), sere (=ser+e) û htd.

6. "e" herwesa wekî paşpirtikekê bi mana ya "ê/a ku gelek dikit an dikarit" bi ser lêkeran ve jî diêt gotin. Wekî xwere (=xwer+e), beze (=bez+e), qebe (qeb+e), û htd.

7. "e" wekî pêşpirtikekê jî ji bo çêkirn a hindek peyv ên nû ji hindek peyv ên heyî diêt xebitandin. Wekî evîn (e+vîn), eware (e+war+e), û htd.

8. "e" di devok a Enadolya ya navînê da cihê "d" ya ku li pêşî ya riha lêkeran di dema neborî ya berdewam da diêt xebitandin digirit. Wekî ekim (=dikim), ekî (=dikî), ekin (=dikin).

9. "e" herwesa di zarava ya Soraniyê jî da li hindek dever ên wekî Silêmaniyê her bi mana ya "de" ya Soraniyê û "di" ya Kurmancî diêt. Wekî min eçim (= min deçim, ez diçim), ewan ne-ewut (= ewan nedewut, wan nedigot), û htd.

10. "e" paşpirtikek e ku peyv ên zayendmê yên kithejmar û nediyar bi diyarker ên wan ve girê didit. Wekî pirtûkeke kevin, jineke spehî, û htd.

Ez dê ji nû li ser vî navnîşanî biaxivim. Ez dê behsa wê bandorê bikim a ku ji "e" û "ewe"/"eve" yên Soraniyê kevtî ser Kurmancî ya Dihokê. Wekî xweya bûyî, "e"yê gelek wezîfe di ziman ê Kurdiyê da hene. Yek ji wan wezîfeyan ew bû ku "e" di zarava ya Soraniyê da ji bo berniyasiyê diêt. Nimûne; şare gewreke, htd. Lê ew "e" di Soraniyê da li ser wan navan jî zêde dibit ên ku li dû bernav ên "em"ê û "ew"ê diên. Wekî em/ew jine ciwan e, em/ew piyawe aza ye, em/ew korre be cerg e, em/ew kiçe nazik e, htd. Lê ev tişt di Kurmancî da nîne. Di Kurmancî da, ew "e" li dû wan navan naêt. Kirmanc dibêjin, "ev/ew jin, ev/ew mêr, ev/ew korr, ev/ew kiç, htd". Lê ew "e" ya Soraniyê bi nav Kurmancî ya Dihokê jî kevtiye. Sedem jî hevtixûbî ya Dihokê û Hevlêrê ye. Pirranî ya Kirmancan dibêjin, "îşev". "Îşev" ji "ev şev"ê kurt bûye. Lê ew li Dihokê kurt nebûye. Lewma Dihokî dibêjin, "ev şeve". "Ev roj" jî li nav Kirmancan bûye "îro". "Ev roj" li Dihokê jî bûye "evro". Heker ew kurt nebûba, ew jî dê li Dihokê bûba "ev roje". Tiştê ecêb ewe ku Dihokî her ji bo wan navan hindek caran wê "e"yê dibêjin, hindek caran jî nabêjin. Dema ew nav li dû bernav ê "ev"ê diên, Dihokî wê "e"yê li dû wan dibêjin. Lê dema her ew nav li dû bernavê "ew"ê biên, Dihokî wê "e"yê nabêjin. Dihokî dibêjin, "ev dare ya dirêj e". Lê dema bernav ê "ev"ê bi "ew"ê diêt guhertin, Dihokî wê "e"yê li dû navî nabêjin. Hîngê "ev dare ya dirêj e" dibit "ew dar ya dirêj e". "Ev" û "ew" herdu jî bernavên kesê sêyê yê kitin. Dihokî xwe "ev" a tirsî jî dikin "eve". Hemî Kirmanc dibêjin, "azad ev e". Tenê em Behdînî dibêjin, "azad eve ye". Hîngê alozî dikevit destûr a zimanî jî. Televizyon û rojname yên Dihokê jî vê "e"yê li dû wan navan dinivîsin. Ev jî devok a Behdîniyê ji devok ên dî yên Kurmancî dûr dikit. Lewma ez wê wekî zererekê dibînim. Televizyon a Warê jî ji bo rîklam ên bername yên xwe dinivîsit, "ev şeve". Lê ew "e" zêde ye. Ji bo xwenêzîkkirin a li Kirmanc ên dî, dibê em xwe ji bandor a Soraniyê û zarava yên dî biparêzin.

Herwesa Soran li dû lêkeran jî "ewe"yê dibêjin. Wekî min dêmewe, tu dêyewe, ew dêtewe, htd. Ev tişt jî di Kurmancî da nîne. Kirmanc dibêjin, "ez diêm, tu diêyî, ew diêt, ..." ev "ewe" ya Soraniyê ye. Lê vê dawiyê hindek rewşenbîr ên Dihokê "eve"yekê li ser qiyas ê "ewe" ya Soraniyê li ser lêker

ên Kurmancî zêde dikin. Ew dibêjin, "me kar ê xo yê kiriyeve, me çi tiştek li ser xo nehêlayeve, ..." ev jî aloziyê diêxit destûr a Kurmancî, û Behdînyê ji devokên dî yên Kurmancî dûr dikit. Ev "ewe" hindek caran di Kurmancî da diyar dibit, lê bi rengek ê cida. Ew wekî "ve" dikevit pêşî ya lêkeran. Nimûne; "dozînewe" ya Soranî di Kurmancî da "vedîtin"e, "geranewe" jî "vegeryan"e. Herwesa "ve" di Kurmancî da li dû lêkeran jî heye, lê bi mana ya "tîkrar" a Erebiyê û "rî" ya Igilîziyê. Dema Kirmancek bibêjit, "min karê xwe kiriye ve". Yanî wî bertir ji bo car a yekê kar ê xwe kirbû, û niha ji bo car a duyê kar ê xwe kir ve. Yanî wî kar ê xwe dubare anku "tîkrar" kir. Lewma jî zêdekirin a "ewe" ya Soraniyê bi reng ê "eve"yek a xolk Kurmancî zererek û têkdaneka destûr û rêziman û taybetmendiyên Kurmancî û dûrkirina devoka Dihokê ji devok ên dî yên Kurmancî ye.

www.arsivakurd.org

# FERHENGOKA GOYANÎ – TIRKÎ

Hin peyvên taybet yên devoka goyanî ya li ser sinorê navbera Bakur û Başûrê Kurdistanê

difin = burun

bozin = bilezik

bolov = çamaşır(yıkamak)

mûqirî = kör

hitimm = kör

osîl = köşe

pişqûmonîk = kiler

poşkolênîk = sokak

miqoliv = karşı, karşısında duran

baroz = domuz

tehn = boğaz

bi karr = ödünç almak

miçinok = cımbız

tehn bûyîn = susamak

mêlok = ciğer

cotir= kekik

(i)stü = boyun

hinor = nar

sitil = kova

ijnî = diz

ron = kasık(but)

bireh = kaş

maşköl = kirpik

armut = koçîk

torêk, torök = su kasesi

sa = köpek

dêlîk = dişi köpek

kedî = evcil

küçik = yavru köpek

micemida = buzdolabı

qörî = sürahi

süşa, piyola = çay bardağı

sahotî(k) = masal, hikaye

bilorik = beşiğe konulan çişlik

www.arsivakurd.org

zincîk = beşiğe konulan lazımlık

qeylîk = hikaye

tiryota = dansöz

medilma = gönül yarası (?)

ristîk = kolya, takı

distîk = tencere

şünik = tokmak (yün tokmağı)

kûliça = ceviz, şeker, hamurla fırında yapılan bir çörek çeşidi, özellikle bayramlarda yapılır.

şkêvlotîk = kaplumbağa

baq = kurbağa

sabinyot = köpeksoyu

kerbinyot = eşeksoyu

kûçç = küçük taş

bar = orta büyüklükte taş

feloxta = şekilli taş (özellikle kavgada kullanılan bir çeşit, ya da kavga edince o isim verilir)

doyîno xwa = bağırmak, kendine (birşeyler( vermek)

sabadoyî = şımarık

lapalör = kuru gürültü, çenebazlık, çenebaz

xûrî = cüzzam

qöpol = baston

sîfik = pembe

qîjik = gelincik

pêplonîk = merdiven

kûrêpêçîk = çimdik

binevş = mor

xemirî = mor

herê kirin = bakmak

qûlf(a) = kilit

mifta = anahtar

kûlak, kûlav = pencere

xorifî(k) = bardak

ley ketin = kavga etmek, birbirine düşmek

vey ketin = toplanmak, toplantı, (nişan,düğün,dernek, özel gün) toplantısı.

tast = leğen

şixota = kibrit

mişor = testere

bolik = yastık

lihöv = yorgan

şaşö = banyo

dûka, dika = ne haber?



www.arsivakurdi.org

kû kirin = yapmak ( hal bildirimi)

mêxal = süzgeç

pimborötik = silindir

cirnî = su birikintisi

kirö = atölye

kêrî = tepe

pol = yamaç

nol = kurumuş dere yatağı

xancar,xancö = hançer

tanbol = araba

mengena = direksiyon

firox = bulaşık

omon = bulaşık

fêkî = meyve

binsifra = sofrabezi

misîn = ibrik

gumguma = güğüm

hiliştin = bırakmak, bahşetmek

till = göbek

zincor = pas

karbov = babasıeşek

sabov = babasıköpek

enirîn = küsmek

anpivî = fena derecede küsmek

paçivî = zıbarmak

meşk = yayık

isqinç = kramp

biçenk = koltukaltı, kanataltı

çenk = kanat

nifîn = beddua

piraspon = yama

beheşt, biheşt = cennet

şon = petek

zirkitî(k) = yaban arısı

bîro = kayınbirader

diş = görümce

pî lê kirin = basmak

lawitî = kirlenmek

helikîî = kirlenmek

şikevo = lavaş (ekmeği)

jijö = kirpi

köqlonîk = omuz

coge = bir defa

www.arsivakurd.org

carik = testi

dehfa = bir çeşit hayvan ne olduğun tam bulamadık :)

mêşo deworon = at sineği

kêvjol = yengeç

korîk = mantar

şil = ıslak

zo = kuru

nîv seviqî = özürlü, spastik

gûlîsêvîk = yer elması

hulü = erik

mêş = arı

nivîştî = muska

çapal = fiske

şir =aptal, inatçı

hîl = aptal, inatçı

bêmejî = beyinsiz

dengî saryon = kafa sesleri ( küçük çocukları korkutmak için söylenir)

şipînik = kapı önü

enişîk = dirsek

potik = ense

gamlök = mısır

dapî = pijama

göra = çorap

tapî = top

tapyonê = futbol

fol = faul

vidköd = korkak

qesa = söz, laf

hadoşa = şapşal

dotavnî = örmek = ayrıca bir salıncak türü = ?

tevn = örmek

hêlindök = salıncak

gişir = kütük

hazora = küçük ve ince kütük ( eskiden kapı kilit sistemi olarak kilitleme aracı olarak kullanılırdı)

mivrat = törpü

kundlis = çökmüş pozisyonda durmak

qût = kısa

stûr = kalın

pehn = geniş

pehnî = topuk

www.arsivakurd.org

spil = çökelek

tebal = bilye

çil = açgözlü

cist = seri olan

cirt = büyük fare

birmîz = altına kaçıran

püt = tüy

şuştin = yıkamak

jinbov = üveyanne

sahewü = kuma

hewü = kuma

pöt = mayışma, hissetmeme.

zirbov = üveybaba

şaqla = spastik, şapşal

bo doyîn = döndürmek

gaz = ısırmak, ısırık

tamirondin = söndürmek

gûş = aptal

mirorr = ölmek

ti mirorr bivî = geberesin inşallah

mirodîn ta hosil bivit = istediklerin gerçekleşsin

çemçemîni(k) = yarasa

olak = yanak

lom = yanak

tevn = tezgah(örgü için)

tevnepîrik = örümcek(duvar köşelerine özellikle ören)

hor = yaramaz, deli

www.arsivakurdi.org

# Kurterêbera rastnivîsînê

Li vê derê em ê rêbazên bingehîn yên kovara Kanîzar bo rastnivîsînê diyar bikin. Li şûna ku em dûr û dirêj meseleyê rave bikin, em ê bi çend nimûneyan merema xwe pêşkêş bikin.[119]

Kovara Kanîzar wiha dinivîse:

1) ”ku”, ne ”ko”: ew dibêje ku…
2) ”çiya, jiyan, kiriye, xaniyê me…”, ne ”çîya, jîyan, kirîye, xanîyê me…”
3) ”ji bo, li gel, li ser…”, ne ”jibo, ligel, liser…”
4) “kurd im, kurd î, kurd e, kurd in”, ne “kurdim, kurdî, kurde, kurdin”
5) “zimanê kurdî, gelê kurd, adar, newroz”, ne “zimanê Kurdî, gelê Kurd, Adar, Newroz”
6) “ez ê bikim, min ê bikira”, ne “ezê bikim, minê bikira”
7) ”hevalê min ê baş”, ne ”hevalê minê baş”
8) ”zimannasî, serokkomar, xurttir, bilindtir…”, ne ”zimanasî, serokomar, xurtir, bilintir…”
9) “bigirim, binivîse, nekişînin…”, ne “bigrim, binvîse, bikşîne…”
10) ”Chomsky, Einstein, Shakespeare…”, ne ”Çomskî, Aynştayn, Şêkirspîr…”

***Kovara Kanîzar***

www.arsivakurd.org

[119] Bo agahiyên berfirehtir, binêrin: Rêber – Rêbernameya rastnivîsîna kurdî: https://zimannas.wordpress.com/2015/07/06/reber-rebernameya-rastnivisina-kurdi/